INSTITUT FRANÇAIS DE DAMAS
COLLECTION DE TEXTES ORIENTAUX
TOME I

ROGER LESCOT

TEXTES KURDES

DEUXIÈME PARTIE

MAMÉ ALAN

BEYROUTH
1942

pêşgotin

Rojê Lîsko

Destana Memê Alan ji bo kurdan xwedî nirxekî neteweyî ye. Ji çiyayê kurd (Kurd Daxî) ta bigihêje Deryaçeya Urmiye, kesek tune ku, baş an xerab, qet nebe çend rêzan ji vê destanê nizanibe bisitire. Navûdeng û tesîra destana Memê Alan di ser tixûbên Kurdistanê re jî pêl daye. Guhertoyeke vê destanê bi ermenî jî heye ku analîza wê ji hêla F. Maclerve hatiye kirin. Tenê li herêmên ku zaravayên din ên kurdî (Zaza, Baba kurdî) tên axaftin, ev efsane belav ne bûye. Bi taybetî û ji ber egerên prestîjê, mîrekên Botan vegotin û belavkirina destana Memê Alan li tebaya xwe qedexekiribûn: Divê neyê ji bîr kirin ku Mîr Ezînê Cizîrî di çîroka Mem de mirovekî zêde ne şîrîn e. ji ber vê yekê, di roja me de Botanî hindik şaş namînin dema ku yek ji çêlîkên Bedirxanan, Mîr Celadet li ber wan digere da ku vê destanê jê re .bisitirin

Di sedsala 17'an de, dema ku Ehmedê Xanî hewl da ku bi nivîsandina berhemeke xwerû bi kurdî, kurmanciya xwe ya zikmakî derîne sewiya zimanekî wêjeyî, hingê wek babet, çîroka Memê Alan hilbijart. Di gel vê yekê, dema mesneviya Xanî hate weşandin, her çendî dengekî mezin jî veda, wê tu caran cihê çîroka Memê Alan ya .gelêrî negirt ku bi saya dengbêjên nexwende li her der belav bûbû

Di vê rewşê de du destanên serbixwe derdikevin pêşiya me; hem ji aliyê awir, şêwe û hem jî carinan ji aliyê naverokê ve du destanên .gelek ji hev cihê; Memê Alan a çîrokbêjan û Mem û Zîn a Xanî

Efsaneya Memê Alan ji mêj ve ji hêla Ewrûpiyan ve tê zanîn. Hê di 1890'an de A. Socin guhertoya pêşî amade kiribû. Di pey wî re jî A. Von Le Coq (1930), Oscar Mann (1906, 9) û Hugo Makas (1926) gelek guhertoyên (versiyonên) din ên Memê Alan derxistin holê. Dawî, li Êrîvanê pirtûkek hate weşandin ku tê de sê guhertoyên din hatibûn komkirin. Di rûpelên din de, emê agahiyên bîbliografîk ên li ser van xebatan bibînin. Wekî wisa ye, pêwist nîne sernavine din bi vê listeyê ve, ku jixwe têra xwe dirêj e, bên danîn. Tevî vê yekê, dema em weşanên ku li jor navên wan diborin, dikin bin berçavka lêkolînê, dibînin ku yek ji wan bi tenê jî ne li gorî dil e. Helbesta Socin zêde kurd e û gelek kêmasiyên wê hene. Heçî H. Makas ji devê yekî Merdînî berhema xwe amade kiriye û ev guherto jî kurtiyeke xerab

e. Her sê guhertoyên di Antolojiya Êrîvanê de cih digirin, ji aliyê ermeniyan ve hatine berhevkirin û zimanê wan ne xweş e. Ya herî hevgirtî berhevoka O. Mann e, ku di Mundart Der Mukrî Kurden de ye. Lê belê, di vê de jî, kêmasî pir in. Bidestxistina tekstekî baş ê efsaneyeke kurdî, karekî gelek hesas e. Hunerê dengbêj li ber .hilweşînê ye

Ew ên ku îro vî navî li xwe dikin, amatorên dengbêjiyê ne. Yanê çi eleqeya van tune bi wan kesan re ku dengbêjî ji bo wan meslekek bû û bi xwe di bin xizmeta mîr an jî serokeşîrekî de bûn. Ev dengbêjên ku heta berî demeke nêzîk jî hebûn, piraniya destan û stranên kurdî ji ber dizanibûn, di ser re jî eger car caran hin gotin nehatana bîra wan, xwedî wê qabiliyetê bûn ku tavilê gotinên nû biafirînin. Min Memê Alan ji nêzîkî bîst denbêjan guhdarî kiriye. Piraniya wan destana Memê Alan bi tevahî nedizanîn. Çend kesan ji wan, cara duyem, tiştê ku berê ji bîr dikirin, wek pexşan (nesîr) vedigotin. Lê kesî ji wan nedikarî bi tevayî û bêkêmasî guhertoyeke destanê bîne ziman. Yekane çareya bidestxistina guhertoyeke biserûber û neşikestî, ew bû ku, ji gelek guhertoyan, yeke nû ya têkel bihata pêkanîn. Tiştê min kir jî, ew bû. Tabloya danberhevê (mûqayesê) .nîşan dide ku encama vê yekê ne xerab e

Min destana Memê Alan a ku ji hêla Mişo ve dihate strandin, kir bingeh ji berhevoka xwe re. Jixwe Celadet Bedirxan jî alîgirê vê yekê bû. Min wek guhertoya alîkar ji ya Sebrî Sûd girt (istîfade kir) ku di cilda yekem a vê berhevokê de jî çîrokên vî ciwamêrî hatibûn weşandin. Min paragrafa li ser îstika setrincê ku tu kes baş nizane, ji dostekî bi navê Stranvan girt. Ev epîzot li ser daxwaza min di .hejmara 36 a kovara Hawar de hate weşandin

Mişo Memê Alan ji bavê xwe girtibû, bavî wî jî ji kurdekî Behdînanî fêr bûbû. Ev dengbêj hê jî li Meqtelê (Suriye) dijî. Ew ji eşîra Berazî ya li Başûr e. Kêmaniyeke Mişo jî sistbûn û xwarbûna zimanê wî ye. Kurmanciya wî ew çend di bin tesîra erebî û tirkî de maye ku hem ji aliyê şêwe, hem jî ji aliyê zelaliya xwe ve, ji kurdî bêhtir dişibe zimanekî din. Lê belê, ev guherto her çiqas ji aliyê wêjeyî ve zêde ne xurt be jî, ji guhertoyên ku li Suriyê tên zanîn, ya herî xemilandî û têkûz e. Ji ber vê yekê ye ku me ji nav gişan ew hilbijart. Di pêkanîna vê berhevokê de gelek tişt jî ji guhertoya Sebrî hatine girtin, ji ber ku zimanê Sebrî yê herî bedew e. Heçî, çavkaniya epîzota beşa îstika setrincê, herêma Serhedan e ku hem aqarê tixûbê Îran û Tirkiyê, hem jî yê Rûsya û Tirkiyê wisa tê binavkirin. Wê bê dîtin ku, di guhertoya dengbêjên Serhedan de, ev beş ji yên deverên din zindîtir

e û xwedî xeml û bedewiyeke berbiçav e. Kêmasiyên guhertoya Memê Alan a Serhedan jî hene, lê tevî vê yekê, ciyê daxê ye ku me nikarî tevahiya çîroka ku ji aliyê dengbêjên vê herêmê ve tê vegotin, .bi dest bixin

Piştî Siyamendê Silîvî, Memê Alan destana kurdî ya yekane ye ku muhteşemî tê de xwedî rolekî mezin e û mijara wê jî ne dîrokî, lê bi temamî efsaneyî ye. Dema li naveroka çîrokê baş tê mêzekirin, gelek pirs di serê mirov de çêdibin û piraniya wan jî bêbersiv dimînin, qet .nebe bi van belgeyên ku ta niha hatine bidestxistin

Eger li ser tesbîtkirina dîroka pêkanîna vê berhemê lêkolîn têne kirin jî, tiştê balkêş ew e ku kes bi giştî dîroka rabirduya wê nabe serdemeke zêde dûr. Hemû guhertoyên di destê me de, ya Xanî jî her wiha, di nav hevgirtinekê de ne ku, Mîr ê ku qesasê Mem e, Mîr Zeyneddîn (Bi şêweyê gelêrî: Zydîn an jî Zengîn) ê kurê Mîr Ebdal an jî Evdal e. Tenê di guhertoya Mîşo de navê wî Mîr Ezîn (Şêweyê gelêrî: Ezzeddîn) ê kurê Mîr Tacîn (Tajdîn) e. Beşa Şerefname a li ser Mîrên Botan behsa du heb Mîr Ebdalan dike. Yek ji wan, neviyê Xalîd bin Elwelîd e û vî kesî mîrekiya Finikê ji birayê xwe dewrstandiye. Xuyaye ku Mîr Ezdîn ne kurê vî ye, wekî ku wî tu caran li ser Cizîrê hikim nekiriye. Der heqê Mîr Evdalê din de jî tu agahiyên kifşker nehatine bidest xistin, lê belê, em ji Şerefnameyê fêr dibin ku kurekî wî yê bi navê Mîr Ezzedîn an jî Mîr Ezdîn hebûye ku ev mîr di 706/1393 de çûye Mêrdînê ji bo ku xwe bispêre Tîrnûr û dîsa vegeriyaye emareta xwe Cizîra Botan. Hingê kurmancekî ku serî li ber Tîmûrleng rakiriye û Tîmûrleng dixwaze wî ceza bike, xwe dispêre Mîr ji bo ku wî biparêze. Tîmûrleng vî zilamî ji Mîr Ezdîn dixwaze, lê Mîr daxwaza wî nayine cih. Li ser vê yekê, Tîmûr digire ser Cizîrê. Mîr direve, xwe digihîne Dihê, li wê derê bi sofîtiyê emrê xwe temam dike. (Zefername, weş. Tauer, Rûpel. 149...150) Piş du salê din, Mîr Ezdînekî din, kurê Xan Evdal, bi alîkariya pêxwasên bajêr birayê xwe dide kuş n û heta 1596 salan, nivîsandina Şerefnameyê, yanê sed sal beriya pêkanîna berhema Mem û Zîn, ew li ser Cizîrê hikim dike. Lê belê, di tu qeydiyên dîroka kurd de, em .rastî mîrekî Botan ê bi navê Zeydîn nayên

Mîrê ku Mîşo di çîroka Memê Alan de wek Ezdîn bi nav dike, xuyaye ku yek ji wan herdu Mîr Ezdînan e ku navê wan di kronolojiya dîrokê de dibore. Di vê rewşê de jî, berî gişan, Mîr Ezdînê ku dijberê Tîmûr bû, tê bîra me. Talankirina Cizîrê ji aliyê Rojavahiya ve ku di beşa dawî a destanê de tê vegotin, diyar e ku serpêhatiya êrîşa tolhildana serdarê Moxola bi xwe ye. Bêguman, em nikarin vê hîpotezê bispêrin tu delîlên saxlem. Tenê di guhertoyekê de mîrekê me, wek Mîr Ezîn

tê bi navkirin û ev jî ne kurê Mîr Evdal, lê, yê Mîr Tacîn e. Wekî din, bi îhtîmaleke mezin, ew navê lehengekî pir kevintir e, lê belê, postê şexsiyetekî dîrokî lê kirine. Veguherîna qralê eciniyan ser dirûvê Xizir, ku di vê destanê de jî cih digire, nimûneyek e ji bo vê veguherîna analojîk. Gava em baş bala xwe didin çîrokê, her tim întîbayek bi me re çêdibe ku ew rastî gelek mudaxeleyan hatiye û di encamê de bûye .çîrokeke modern û îslamî

Ji xeynî Mîr, dirûvê Memê Alan jî zêde ne zelal e û gelek pirsan di serê me de çêdike. Her çendî Mem pirê caran kurtkirina navê Muhemmed be jî, Alan li Kurdistanê ne navekî xisûsiyê wisa navdar e. Ev nav tenê li nav eşîreta Swêsniyan heye. (Herêma Wezne Zerdeşt, Ansiklopediya Îslamê, Cild IV, rûpel 196.. 197) Wek navê deveran jî, ev peyv ji bo aqarê nabera Silêmaniyê û Bane tê bikaranîn. Li aliyê din, çemê ku ji Kalîfan ber bi Rewandizê diherike wek Alûna tê bi nav kirin. Plîne (dîroknivîsekî romanî) jî behsa êleke bi navê Alûnî dike ku li der dora eynî çemî rûdinişt. Memê Alan bi giştî hem wek xwarziyê Qureyşiyan tê pêşkêşkirin, hem jî qralê welatekî nehênî yê ku li Mexrîbê ye û paytextê wî jî bajarê Mexrîb e. Di guhertoya O. Mann de, Mem mîrê Yemenê ye, li gorî Xanî jî ew ji malbateke esîl a Botan e. Dema ev rewşa bajarê Mexrîbê ji dengbêjan tê pirsîn, bi giştî nikarin bersivekê bidin. Tenê çend kes ji wan, bajarê Mexrîb li keviya Kendava Îskenderiyeyê bicih dikin ku bi xwe nizanin Îskenderiye jî tam li ku dikeve. (Hawar, hejmar 6 rûpel 10) Li vir tiştekî din ê ku divê bê diyarkirin ew e ku Mem ne tenê Mîrê Mexrîbê, lê her wiha ew qralê kurdan, serdarê Mîrekiya Botan e. (0. Mann. rûpel 105) Ev jî bi xur nîşan dide ku, tu agahiyên ta niha hatine bi dest xistin, têrê nakin da ku hîpotezek li ser binyata vî lehengî bê formulekirin. Eger bi riya danberhevkirinê em bixwazin li pêwendiyekê bigerin di nabvera vê efsaneyê û çîrokên din ên rojhilatî de, hingê divê nevê emê bala xwe bidin çîroka nivîseke Chares Mytilene û nivîsên Tha'alîbî û Fîrdewsî, ku van kesan çîroka nivîskarekî grekî, bi riya terîmên analojîk guhertoyeke pir berevajîkirî ji nû ve afirandine. Di nav wan guhertoyan de ya herî girîng çîroka :Chares e, em dixwazin li vê derê wê pêşkêş bikin

Rojek ji rojan du bira hebûne, navê birayê mezin Hystaspes, yê " piçûk jî Zariadres bûye. Tê gotin ku ew ji Aphrodite û Adonis çêbûne. Hystaspes serdarê Medya û welatên din ên li jêr bû. Zariades jî ji bakurê Deryaçeya Hazar bigire ta bigihîje Çemê Tûna hikim dikir. Ji vî çemî û ber bi jor ve wek Welatê Maratathes dihat zanîn û serdarê vî welatî jî Homartes bû. Bi navê Odatis, keçeke vî qralî hebû. Dibêjin, şevekê Odatîs Zariadres di xewna xwe de dibîne û dil berdidê (dil dikevê). Li aliyê din eynî tişt tê serê Zariadres jî. Aşiqê hev û din dibin

û her du jî ji xewna xwe re sadiq dimînin. Adotis, li parzemîna Asyayê jina herî bedew bû. Zariadres jî têra xwe çeleng bû. Zariadres ji bavê keçikê re qasidekî dişîne ji bo keça wî jê bixwaze. Lê belê, qral, vê daxwazê qebûl nake. Ji ber ku qral bê kur bû dixwest keça xwe bide yekî ji malbata xwe. Rojekê ji rojan, bavê Odatîse ji bo daweta keçikê, hemû mirovên xwe, mîr û giregirên welêt li hev kom dike. Feqet heta hingê ji kesî re behs nekiriye ka wê keça xwe bide kê. Piştî ku mêvan dixwin û vedixwin, Homartes deng li keça xwe dike û jê re dibêje:. Odatîs keça min em îşev daweta te dikin. Li dora xwe baş binêr û li mêvanan hûr be. Du re piyaneke ji zêr hilgire, tije şerab .bike û bide destê xortê ku dixwazî wî bikî û bibî jina wî

Beriya vê şahiyê, wê ji evîndarê xwe re dabû zanîn û gotibû ku rojên daweta wê nêzîk in. Zariadres zûka di gel paytûngerê xwe yê şer, ji wargeha xwe vediqete û berê xwe dide qesra Odasîsê. Bi paytûna xwe ya herbê, di pir welatan re derbas dibe û nêzîkî 800 qonax rê dibire. Gava digihe bajarê ku lê daweta Odatîsê tê kirin, paytûna xwe tevî paytûnger li cihekî dihêle û bi lezgînî xwe digihîne cihê dawetê. Kêliya dikeve hundir, Odatîsê li ser piyan li pêşiya mêvanan dibîne. Keçikê hêdî hêdî piyan dadigirt û digiriya. Xwe digihîne balê û bi dengekî nerm jê re dibêje: Odatîs delala min, weke ku te dixwest eva ez hatim. Ez Zariadres im. Bi dîtina vî biyaniyê çeleng, ku eynî mîna xeyalê xewna wê bû, ji kêfa çi maye bifire, bi dilgeşiyeke mezin piyanê dide destê wî. Zariadres piyanê ji destê wê digire û dibe ber devê xwe. Du re, bi milê. keçikê digire, ji qesrê derdixe, wê dibe li paytûna xwe siwar dike û direvîne. Xulam û xizmetkar ku haya wan ji her tiştî hebû, tu astengî li ber wan dernexistin. Gava Homartes pirsa keça xwe li wan kir, xwe li nezanînê girêdan û gotin ku haya wan ji tu ".tiştî tune

Barbarên Asyayê pir ji vê çîrokê hez dikirin û dîwarên peresgeh, qesir û xaniyên xwe yên taybet, bi wêne û suretên serpêhatiyên vê çîrokê dixemilandin. Piraniya mîr û padişahan jî, navên keçên xwe datanîn .Odatîs

Tê dîtin ku bi giştî romana Chares û çîroka me ji aliyê naverokê ve, pir dişibin hev. Mem û Zariadres ji hev ne dûr in, ger Zariadres kurê Afrodît û Adonîs e, Mem jî bi mûcîze hatiye dinê û hespê wî Bozê Rewan sewalekî efsaneyî yê deryayê ye. Nêzîkahiya navbera Odatîs (Hudata) û Zîn, Homartes û Mîr Ezîn, Paytûnegerê Zariadres û Beglî jî balkêş e. Kesayetiyên talî yên mîna qralê eciniyan, Beko û Celalî di .çîroka me de ji ya yewnanî bêhtir in

Di tekstê Chares de çend tişt bala mirov dikişînin: Wisa xuyaye ku Histaspes Vistshpa ye. Zariadres û Zarivari (Zarer), li gorî dîroka îraniyan, her du kurên Lohrasp in. (Christensen, rûpel 137). Ev jî nîşan dide ku çîrok bi eslê xwe îranî ye. Yanê Lohrasp û her du kurên xwe ne li Medya lê li rojhilatê Îranê hikim kirine. Ev çîrok jî ber bi .rojava ve belav bûye

Çîrok bi gelemperî di nav hemû gelên Asyayê yên berê de belav bûbû û bê şik ji nav îraniyan derketibû. Li cem kurdan di nav demê de, vê destanê bi temamî rengekî din standiye, Zariadres bûye padîşahê Mexrebiyan. Derbarê bingeha navê Memê Alan de jî çend şîrove hene. Navê Alan piştî Mem û Zîn a Ehmedê Xanî ketiye devê dengbêjan. Her wekî bavê Memê berdevkê Mîrê Botan bû û di şeran de ala wî hildigirt ev leqeb li Mem tê kirin. Di wextekî de ji bakurê Qefqesya ta Çemê Tûna di destê miletê Alen de bûye. Dîroknivîsên Rojhilat, Alen kirine Alan. Di serdema Sasaniyan de, Alenan nîvroyê (başûrê) Qefqesyayê vegirtine, gihane çiyayên Zagros, heya bi Silêmaniye. Ermeniyan bîranîna vê bûyerê di çîroka evîna Ardaşês û .dotmîra Alenan de heta îro parastine

Eger çîroka Memê alan bingeha xwe ji ya Zariadres standibe, diyar e ku ji eslên xwe pir dûr ketiye. Li derdoreke nû, ji naçarî gelek guherîn tê de çêbûne, bûye kurd û dû re jî misilman. Çîrok li bajarê Mexrîbê ku bajarekî wisa tune, dest pê dike, dû re jî bi giranî Cizîrê, bajarê ku Mîr Ezdîn li ser hikim dike, ji xwe re dike mekan. Wekî din, xisûsiyetên şexsiyetên çîrokê, jînevîna ku di nav de dijîn, reaksiyon, adet û gelek taybetiyên wan ên pêwendiyên civakî, ne mumkin e ku di derdoreke wiha nû û cihêreng de wek xwe mabin. Di gelek cihên çîrokê de rûniştivanên bajarê Cizîrê, wek mirovên cirnexweş hatine vegotin. Di çîrokê de Cizîrî wek kesên çavbirçî, fesad û tirsonek hatine danasîn. Ji ber vê yekê, B. Nikitin dibêje ku ev çîrok ji hêla derdoreke ku ji Cizîriya nexweş bûye, hatiye afirandin. Divê neyê ji bîrkirin ku, li gorî kevneşopiyekê, ku di Şerefnameyê de tê vegotin, avakarên Xanedana Azîziyan êzîdî bûn û ji mezhebeke bi temamî cihê bûn. Feqet mirov dikare şîroveyeke din jî bike: Eşîretên kurdan, bi giştî wek du êlên mezin ji hev tê veqetandin: Milî û Zilî (an jî Silîvî). Yanê êlên Botan û Silîvî. Dibe ku Memê Alan di destpêkê'de Silîvî bû? Hêja ye ku ev pirs bê kirin, lê belê mixabin ne mumkin e bersiva wê bê dayîn, ji ber ku îro êdî em maneya van her du peyvan (Mil û Zil) nizanin. Ew ji aliyê etnîk, siyasî û civakî ve, ji maneyên xwe yên berê pir dûr ketine. Wisa xuyaye ku bi taybetî di bin tesîra Xanî de Memê Alan hatiye misilmankirin. Memê Xanî jiyana xwe wek kesekî pîroz

diqedîne. Ew ji hemû tiştên dinyawî dûr e û dibe pakrewanê evîneke îlahî. Di guhertoya gelêrî de lehengê me bi bêbextî tê kuştin, yanê di mirina wî de tiştekî alelade tune, ne di jiyan, ne jî serpêhatiyên wî de tu taybetiyên pîroz û payebilind xuya nakin. Tevî vê yekê hin guhertoyên mîna ya Mîşo, di bin tesîra Ehmedê Xanî de mane: Ramana Mem di zîndanê de, serîdanîna wî li hember mirinê di van guhertoyan de pir dişibe tevdana Mem a di Mem û Zîna Xanî de. Helbet, li vir pêlîstineke dengbêjan a ji bo şîrîn nîşandana lehengekî ne pir şîrîn, tê dîtin. Di encamê de, li her derê çîrokê qralê eciniyan ku putperest e, tê veguhertin û wek Xizir, pêxemberekî misilman dirûv distîne. Tenê, her sê keçên vî şexsê serdest, ê xeyalî, wek xwe .dimînin

Temaya Memê Alan pariyek hatiye nûjenkirin. Qralê kurdan Mem her wiha xwarziyê Qureyşiyan e jî. Ma dibû ku, Memê Alan, mîrekî ew çend bi navûdeng negihe nijade Qureyşiyan. Jixwe weke ku di Şerefname de jî tê vegotin, mideteke dirêj, li Kurdistanê hemû malmezinan, axa, şêx û began xwe digihandin malbata cenabê pêxember. Veguherîneke dina a balkêş jî a dirûvê Beglî ye. Di guhertoyên nûjen de ev fîgur hêdî hêdî ji holê radibe. Di çîroka Chares de, paytûngerê ku Zariadres pê re derdikeve rêwîngiyê, hevalbendekî najêger ê lehengê her çîroka dema antîk e. Di guhertoya O. Mann de, Beglî heta Cizîrê jî Mem dişopîne, lê belê tevlî nav serpêhatiyên efendiyê xwe nabe. Li cem Mîşo, ev xulamê sadiq li bajarê Mexrîbê dimîne, tenê di dawiya çîrokê de ji bo tolhildana mîrê xwe, derdikeve holê. Eger ev şexis di şûna paytûngerê çîrokên antîkîteyê de hatibe bikaranîn, hebûna yekî wisa belesebeb dimîne jî ji ber ku Mem li ser hespê xwe rêwîtiyê dike. Du armancên Ehmedê Xanî hebûn wextê dest bi nivîsandina Mem û Zîn kir. Weke ku ew jî di rêzên destanê de tîne ziman, nivîsandina berhemeke kurdî ku bibuya destpêka wêjeyeke nû û şiyarkirina zanîna hişzanîna neteweyî li cem nijada xwe. Ya din jî pêkanîna :evîneke îlahî. Di destpêka destanê de Xanî wiha dibêje

Ev mîve eger ne abdar e"

"Kurmancî ye ew qeder li kar e

:Li. dawiyê jî Xanî van rêzan tîne ziman

Liken, wê xerez li guft û gûy"

Meqsûd ji hindê cust û cûy

Zahir kirina cemalî eşq e

"Sabit kirina kemalî eşq e

Mem û zîn a Ehmedê Xanî li gorî sewiya zanayan e û hewayeke dîndarî tê de heye li ser hîmê çeşna destanromanên camiyê hatiye avakirin ji ber vê yekê, ji Memê Alan a gelêrî pir dûr ketiye. Di şemayan de hatiye diyarkirin ka Elmedê Xanî di nav kîjan şertên azad de mijarê dinirxîne: Vegotina Xanî gav bi gav ji temaya rasteqîn a efsaneyê dûr dikeve. Di vê rewşê de bêguman karakterên gelek .şexsiyetan jî di Mem û Zîn a Xanî de, bi temamî guherîne

Mem lehengekî zêde ne şîrîn e, wekî ku berê jî me anîbû ziman, Mîşo di nav hewldanê de ye da ku wî şîrîn bike: Ew wî ji nav agirê ku Sitî pêxistiye, dide xelaskirin, qesra Hesen ji nû ve ava dike. Di encamê de jî mirineke pîroz diyariyê wî dike. Di rastiyê de, Mem peyayekî xwedbîn, qure, qeba bi kurtî tam tîpekî feodal e. Erê, evîna wî tesîreke mezin lê dike û hiş di serê wî de nahêle, lê belê, tevî ku ew dizane Zîn dergistiya Çeko ye, hîç rûwe wî naêşe û bê dudilî alîkariya Celaliyan qebûl dike. Gava diçin şerê eceman, bi fen û fûtan, xwe ji hevalên xwe vedişêre û vedigere cem bajarê Cizîrê, cem Zînê Mem bi tena serê xwe nikare tu tiştî bike, her tim ji dostaniya Hesen îstîfade dike. Ew cesareta wî tune ji bo ku bi tena serê xwe singê xwe bide ber dijwariyên jiyanê. Li hemberî kesên kêmî xwe, pir cirnexweş û dijwar e û bê dudilî dikare dilê hezkiriyên xwe jî bişikêne (lihevrastahatina li serê Kaniyê). Dil dixwest ku ew xwedî dilekî .teniktir bûya

Heçî Memê Xanî, berevajiyê Memê çîroka Memê Alan a gelêrî, xwedî giyaneke pir bilind û di jiyana xwe de jî pir comerd û cirxweş e. Evîna ku di dilê wî de ye û wî dilivîne, bi temamî xeyalî ye: Evîna wî evîneke saf û ji xisûmetê dûr e. Mem bi ser Zînê ve naçe, evîna wî ya ji bo Zînê bi ya Xwedê re dibe yek. Di zîndanê de Mem digihe sewiya herî bilind a tesawufê. Dema di zîndanê de evîna wî pêşniyaza azadiyê lê dike, xwe nade ber û bi telafûzkirina gotinên tesawufî dimire. Di her du guhertoyan de jî, yanê hem di Memê Alan a gelêrî hem di Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de karakterê Zîne eynî ne. Ev prensesa muhefezekar di herduyan de jî wek evîndareke şermoke, oldar û şîrîn tê pêşkêşkirin. Di berhema Xanî de Zîn, Beko efû dike wekî ku bêyî wî ne ew bi xwe ne jî Zîn wê nikaribin herin bihûştê. Di çîroka Mîşo de Zîn nahêle ku Hesen ji bo tolhildana Qralê Kurdan Mîr Ezîn bikuje. Ji xeynî Mîr Ezîn ku di hemû guhertoyan de hem zalim, bixwenebawer û xirab e, hem jî di destê Beko de wek pêlîstokek e, kesayetiyên din ên çîrokê di guhertoya gelêrî de ji yên di berhema Xanî de zehftir xemilandî ne û tarîfa wan baştir hatiye kirin. Tacdînê

Mem û Zîn hem cihê Hesen û Begliyê Memê Alan digire, wekî ku ew mîna destbirakê Mem tê pêşkêşkirin. Feqet Tacdîn zilamekî di halê xwe de û pir bêdeng e. Dema destbirayê wî, Mem tê girtin û davêjin zîndanê, newêre xwe tev bide. Saeta ku biryar distîne Mem xelas bike, beriya ku serî li darê zorê bide, daxwaza efuya wî dike. Berevajiyê wî, Hesen û birayên xwe bi comerdî, mêranî û .mêvanperweriya xwe xwedî rûçikên gelek hêja û cihêreng in

Hesen mîna nîşana rûmetê ye, li hemberî mêvanên xwe nerm û milayim, li hemberî kê dibe bila bibe, mêrê sozên xwe ye. Gava ku dibîne Çeko ji sozên xwe vedigere, bê dudilî wî bi kuştinê tehdît dike û ji bo rizgarkirina Mem, diyar dike ku bi malê xwe û canê xwe û kurê xwe amade ye. Çeko jî mêr û mêrxas e, biqasî Hesen ji ber kêmzanebûnê, bi wezîfeyên xwe ve ne girêdayî ye, lê belê, mirovekî pir xwezahî ye. Dema dibihîs ku Mem dil berdaye dergistiya wî, xwe nagire û li hemberî vê rewşê, serî radike. Bi hêvî û daxwazên dûr û dirêj, xwe ji navbera wan vedikişîne, lê dema sozê xwevekişînê jî dide, ta dawiyê li ser sozê xwe disekine. Heçî Qeretacdîn, birayê piçûk bi dilûcan, girêdayê kekê xwe ye. Bi yek îşareteke çavê birayê .xwe yê mezin, şûrê xe ji Çeko re dikişîne

Sitî bi xwe, ku di efsaneyê de jineke mêrane ye, li cem Ehmedê Xanî wek keseke jirêzê ye. Ew kebaniya maleke mezin e, di nebûna malxweyê malê de, hemû biryarên girîng ji aliyê wê ve tên standin. Dema dor tê piştgiriya ji bo Mem, ew xwe dike, bi îdîaya ku wezîfeya xwe li hemberî Mem baş naynin cih. Bekoyê Xanî jî ji yê çîroka dengbêjan cudareng e. Bi pênivîsa Ehmedê Xanî, Beko bi tevgerên xwe, bi dîndarî û bawerî, armancên Xwedê tîne cih. Xwedê ew hilbijartiye ji bo ku bibe sebêbê windakirina her du dildaran li vê dinyayê û rizgarbûna wan li axiretê. Li dinyaya din, ew jî nayê cezakirin, berevajî ew bi çûna bihuştê tê xelatkirin. Bekoyê Şeytan dibe Bekoyê bihuştî. Ehmedê Xanî felsefeya xwe ya tesawufî di dîwana xwe de bi laş û gewde dike. Ew tesawufa ku Şeytan ne wek pariyekî saqit, lê wek tevkarekî Xwedê û yekîtîperestê wî yê yekane .nîşan dide

Bi destê Şeytên, Xwedê mirovan ji rê derdixîne, wan diêşîne, pîs û nizm dike, da ku paşî, wan bigihîne xweşî, delalî, azadî û bilindahiyê. Di dawiya Mem û Zînê de em Beko li bihuştê dibînin. Aliyê wî yê xerab ê ku li hemberî Mem û Zîn ku ta ew şandin goristanê jî bi kar .dianî, êdî nemaye

Mem û Zîn a Xanî û Memê Alan ne tenê ji aliyê navarokê, lê her wiha .wek uslûb û dirûv jî ji hev û din têra xwe dûr ketine

Berhema Xanî klasîk e, yanê di bin tesîra farisî de ye. Nivîskar forma helbesta ereb û ecem bikaraniye û piraniya muqayeseyên di destanê de ji helbestvanên mîna Nezamî û Cemî deyn kirine. Ew berhema xwe car caran bi îmajên rewan ên dengbêjan, carinan jî bi metaforên :eceman dixemilîne

،Sîmîn beden û semen hezaran

Sêv in deqen û memik hezaran

Hem peyv hem jî şêweya helbesta Xanî gelek dişibin îranîzmê. Xanî peyvên farisî û peyvên erebî yên ku îranîze bûne, li nav destana xwe reşandine. Bi awayekî wisa zêde peyvên farisî bikar anîne ku carna gotinên kurdî xerakirine û kirine dirûvên gotinên farisî: Xwîn kiriye .xûn, şev kiriye şeb, zîvîn bûye sîmîn û hwd

.Tiştekî wisa di tu guhertoyên Memê Alan de ne mumkun e bê dîtin

Teoriya ku ji hêla Socin ve hatiye derpêşkirin çewt e, qet nebe der barê helbesta kur a gelêrî de. Di stranên dîlanê de rêzên helbestê bikafiye ne. Ew ne li gorî kurtbûn an jî dirêjbûnê, lê belê li gorî hejmara kîteyan tên sazkirin. Di stranên şer û destanên çîrokî de rêz êdî nayên dîtin, bi piranî rêzên bikafiye ku dirêjbûna wan guhêrbar e, tên dîtin. Dirêjbûna wan li gorî bêhna dengbêj diguhere. Jixwe, evê dawî dema hin gotinên helbestê ji bîr dikirin, an jî ji strandinê diwestiyan, xwedî wê serbestiyê bûn ku hin «epîsotên helbestê wek pexşan vebêjin. Wekî din, rîtm û nuansên awazên (hewayên) refrainên govendê û stranên şer li gorî her rêzê mumkin e biguherin. Heçî efsaneyên epîk ji strandinê bêhtir bi şêweyekî zû û yeknesak tê vegotin. Şêweyê (stîla) ku di Memê Alan de hatiye bi kar anîn ji yê destanên kurdî yên gelêrî zêde cuda ye. Awaza di Memê Alan de bi .giştî li ser van notayan ava bûye: Sol, sol, sol...la, sol

Kafiye, bi gştî wek '...ane' diqedin, esas bi serve, zêdekirina 'e' yekê 'an'a dawiya hin peyvên pirhejmar, lêker û gotinên din, bi piranî 'ane' tê pêkanîn. Eger pêwist be, ji bo zimanekî poetîk peyvên yekhejmar weke ku pirhejmar bin, tên bikaranîn û hwd. Li hin cihên destanê, ji bo xemlandina tîradan, em rastî kafiyeyên ku zêde nayên bikaranîn tên. Lîsta kafiyeyan li jêr hatiye dayîn. Li gorî berhevoka ku ji guhertoyên Sebrî û Mîşo hatiye amadekirin, ev tabloya kafiyeyan derdikeve holê. Heçî epîzota qismê setrincê, xwedî formeke zêde .nelihevhatî ye û gelek xerab hatiye nivîsandin

Wergera ji Fransî

Mazhar Günbat

MAMÉ ALAN

MEMÊ ALAN

Bajarê Mixribê bajarekî ezîm î pir giran e,
Li ser heft çiyan e.
Li ser sê sed û şêst û şês qapiyan e.
Her qapîkê li ser sê sed û şêst û şeş walîlixan e.
Her walîlikê li ser sê sed û şest û şeş midirlixan e.
Timam di destê Elî begê, Emer begê, Elmaz begê de ye, sê biran e.
Xwediyê tewlê nijda, boşê dewa, xarê miyan e,
Miftê devê sindoqê zêra barê çel û pêne begîlan e,
Xwediyê xezînê û defînê giran e,
Xwediyê sûk û çarçiyan e,

*
* *

Rojekê ji rojê Xwedê, bi ser wan de hatiye Eydê Qurbanê, xwarzî diherin malê xalane,
Û brazî diherin malê apane.
Elî begê, Emer begê û Elmaz begê, derketine ser yazlixane.
Ji xwe re li hev nerîn û giriyane,
Digotin : « Gelî birano, em sê biran e.
Emrê me şêst in, dikevin şêst û pêncane.
Rebê Alemê daye me malê girane.
Emê warocax ê kordûndan e.
Rojekê ji rojê Xwedê, emê serê xwe deynin diyarê rehmetê, axê gorane.

Rebê Alemê mirin daye me ebdê gunehka rane.

Malê me pir e, wê bimîne wa li mîretçiyane.»

*
* *

Elî begê, Emer begê û Elmaz begê, sibehê Eydê Qurbanê, rahiştin darê erebana û xelîlane,

Û li xwe kirin cilê derwîşane.

Ji Bajarê Mixribê derketin, berê xwe dan çola û kerbelane.

Ji xwe re li hev rûniştin û giriyane.

Çava radikin, pê dibe xulîna hêstarane.

Gawirê Rimêlê li miqabilê wan dibine misilmanane.

Elî begê ban dikirî Emer begê û Elmaz begê, digo : «Keko, a ko bi serê me de hatiye, bila neyê serê kesekî misilmane.

Me dev ji dayîrê rengînî, ji qonaxê mezin berdane, Em ketine çolan û kerbelane.»

Her sê bira rûniştin û dilê wan bi wan şewitî û ji xwe re giriyane.

Rebê Alemê Xocaê Xidir li wan kir beyane.

Carekê, neri ko Eli begê û Emer begê û Elmaz begê ji xwe re rûniştine û giriyane.

Dilê wî li wan şewitî, sêvekê ji paşila xwe derdixe, dide destê Elî begê, mezinê birane.

Digo: «Gelî bira, megirin! Rebê Alemê delîlê heyiriyan e.

Iro roja Eydê Qurbanê ye, we dev ji qonaxê xwe berdane.

Gerek zilamê mîna we vekirana devê xezîna û defînê girane,

Û pere birijandana, gelî bira, li zikaka û li ewcane.

Ji bona xatirê feqîr û foqrane.

Nefsa ko birçî be, gerek we têr bîkira, û zilamê ko tazî be, gerek we bilibs bikira. Hûn hatine, ketine çol û kerbelane,

We li xwe kiriye cilê derwêşane.

De, rabin, berê xwe bidin Bajarê Miẍribê û qonaẍê xwe nê girane.

Herin Bajarê Miẍribê, vekin devê xezîna û defînane.

Pere birijînin li zikaka û li ewcane,

Şerjêbikin qurbana û dehiyane,

Ji bona xatirê feqîr û foqrane.

Berê xwe bidin Mihela Qureyşiyane,

Ji Elî begê re bixwazin qîza Mîrê Qureyşiya, bi qewlê eshabane

Qelenê wê bidin diwazde qirûş û nîvane.

Îşellah, neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqa wextê qediyane,

Xwedê teala wê şîn bike warê windane.

Tenbiya min li we be, tu nava lê mekin, heyanî go ez li we bibim beyane. »

*
* *

Her sê bira rabûne û ji xwe re meşiyane.

Berê xwe dane qesr û qonaẍê xwe nê girane,

Û vekirin devê xezîna û defînane.

Perė rijandin li serê zikaka û binê ewcane,

Ji bona xatirê feqîr û foqrane.

Şerjêkirin qurbana û dehiyane,

Ji bona xatirê feqîr û foqrane û yetimane.

Berê xwe dan mihela Qureyşiyane.

Qîza mîrê Qureyşiyane ji Elî begê re xwestine bi qewlê eshabane.

Qelenê wê didin diwazde qirûş û nivane.

Neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqê wê hurmetê qediyane.

Rebê Alemê ewladek daê û sê çerkê nûrê bi rû de berdane.

Bajarê Mixribê buye mina roja haşer û maşerê, go mixliq rabine ser lingane.

Mele banî diketine serê minarane,
Di hundirê camiya dibûne pirinê mûmiya û meşelane.
Mele dixwînin tekbûra û didine selewatane,
Dengê mela mîna ye dengê şalûlan û bilbilane.

*
* *

Rojekê ji rojê Xwedê, miclisa Elî begê geriya, go : « Emê navekî li kurê te bikin ». Go : « Bavo, ez ne bi destê xwe me. Ixtiyarekî kalikê wî heye, heyanî go ez wî nebînim, ez nikarim tu nava li kurê xwe bikim. » Miclisa wî geriya. Hinek dibêjin : « Emê navê wî bikin Arif. » Hinek dibêjîn : « Na, welah, emê bikin Emer. » Hinek dibêjîn : « Na, welah, emê bikin Felemez. » Hinek dibêjîn : « Na welah, emê bikin Wîsif. » Hinek dibêjîn : « Na welah, emê bikin Brahîm. » Carekê, nerîn îxtiyarek hat, go: « Eselamû eleykûm, ya cimaeta mezin. » Gotin : « Eleykûm eselam, ya îxtiyarê delal. » Go : « Hun çi ji vî kurikî dixwazin. Navê wî deynin Memê Alan, xwerziyê Şêxê Qureyşan, braziyê Emer begê û Elmaz begê, siltanê Kurda ! » Carkê nerîn go îxtiyar winda bû. Navê wî ma Memê Alan.

Bavê Memo çi kir ? Bi nav Bajarê Mixribê ket, hezar û pênc sed xortê delenbegiya timam anîn, her yekî meaşê wan beşqe, go : « Hûnê ji sibehê heyanî êvarê, ji êvarê heyanî sibekê singiwa di devê tifingê xin û li dora qesre Memo no-

betê bikişînin. » Û melekî diwazde ilmî hebû di Bajarê Mïxribê de, Elî begê mele anî, go : « Mele, tuê Memo bielimini ilm. »

*
* *

Rojekê, di nava xortan da bû şorê cenawerê behrê û ecebane.

Hinekan dianî behsa hûtane,

Hinekan vedikir şora marane,

Hinekan digot : « Di behrê da heye hemberê hemî heywanê li rû erdane. »

Hinekan digot : « Heywanek heye di binê behrê de, di şiklê hespan e. »

Kalekî digot : « Eger ko yê lê be bextê mêrane,

Rojekê têkeve dest ev cenawerê wekî hespane,

Merî lê siwar be, pê qonaxê rojan dibire bi saetane,

Ne vedixwe avê, û ne dixwe êmegê cotane,

Tim lê siwar bi û li ser piştê peya nebi bi roj û şevane.

Dare, hikmê wî heye heya şeş mehane. »

Hinekan digot : « Heye hikmê wî heya salekê û didiyane ! »

Zarokê biçûk guh didan kalane,

Di bin çavan va dikenin û bi destan dikin îşaretane,

Digotin : « Hele, binihêrin ji vê derewa kalane !

Ma îşê hespan çi ye di binê behrane ?

Ma ew çi quwet e ko ne bixwe û ne vexwe, tim here salekê û didiyane ?

Vaya dereweke werge mezin e, ku tucaran nakeve serê mêrane ! »

Li ser vê bela bû meclisa xortane.

Ez serê te neêşînim û pir nekim şorane,

Salê Memê gihêştine panzdane,

Mem kirin padişahê Bajarê Mixribiyane.

Rojekê, Mem rûnişti bû li ser textê çarling, minê rojê ko nuh hiltê li çiyane.

Bi emrê bavê kal û her du kokimê apane,

Li dorhêlê rûnişti bûn hezar û penc sed xortên Kurdan, û hemî kurên beg û axa ne.

Di nav wan xortan da yekî din hebû, ew jî kurê xaltika Memî, braziyê Emer begî bû, Memî ew kirî bû serekê xortane.

Navê wî Beglî bû, lê gurekî mêran e.

Memî ew ji xwe ra kirî bû destbirayê axiretê, hevalê xwe ji dil û cane.

Wê rojê, Beglî dibîne ko di nav bajarê Mixribiyan, galegûrteke giran e.

Her kes direvine ber ve behrê, dengê qireqîr û gotinên wan e.

Beglî yek şande ber behrê, got : « Law, hele here binhêre çi dehwa van xelkan e. »

Ew xort li Beglî vegerî piştî çend deqîpan, jê ra dike şorane.

Beglî bi ser Memî da direve û dibêje : « Bira, dibêne bêtarek hate serê torvanane. »

Memî got : « Çi ye ? Çi bêtar e ? » Beglî got : « Îro, torvanan tora xwe avêtine behrê bi çend ciyan e,

Ketiye nava torê tiştekî girane.

Xelkê bajêr gişkî xwe didine werîşane.

Ne derdikeve û ne jî dilive bi kişandina xortan û peyane. »

Hema Mem rabû, lingê xwe avête cotê solane.

Daket hewşê û çû ber kendalê behrê, tevi gelek xortane.

Dît ko tevî torvanan pir meriyan destên xwe avêtine benê torane,

Xwe didinê wiha ko destê wan gişkan xwîn bûne ji zorane.

Ko çavê torvanan ket li Memê Alane,

Gotin : « Padişahim, em çito bikin, van peyana hemî westiyane,

Bi der nakeve merata torane,

Ne jî ben diqetin ko hêviya me were birîn ji torane.

Qene, tu yariya me bike, belkî em bi nifûsa te biderxin van torane. »

Memî bi Beglî ra xeber şande ji xalê xwe Emer begî ra, hat tevî kalane.

Beglî hat tevî hezar û pênc sed xortê Kûrdan, xwe dane benane.

Ben kişandin, bû hufehufê pêlan û çirkeçirkê ben û şiritane.

Bi der ket binaniyê torane.

Dîtin ko di şebekê toran da, cenawerek dixewîne, di şiklê hespan e,

Tevda mîna gotina rîspî û kalan e.

Hinga, Memî digot : « Şorê kalan tev cewher e, divê navêjî bin lingane.

Gava kalan ji me re digotin di behrê da cenawerek heye mîna hespan e,

Me digot : « Derew e ! », me bawer ne dikir şorê wan kalane ! »

*
* *

Di kendalê behrê da ava kiri bûn diwazde ode ji kevirê mermer yê Kaşane.

Mem emir da Beglî serdarê xortane,

Got : « Vî heywanî birin, têxin paş wan diwazde odane,

Di ser ra kilît kin hemî deriyane. »

Di wir da ma heyanî şeş mehane.

Paşê, Mem xeber bela kir li nav bajarê Mixribiyan li peyane.

Ko: « Kî vî heywanî ji min ra terbiye bike, ezê çavê wî têr kim li perane. »

Di bajarî da feqîr û fiqare pir bûn, ko nika bûn xwedî kin jin û zarokane.

Dixwestin yan bimirin û yan jî ji xwe ra çar kin debara zarokane.

Gelek hatin, sekinîn li pêş qonaxa Memî li ser lingane,

Mem da wan kilîta diwazde deriyane,

Ko herin pê vekin wan odane,

Herine cem kuriyê behrê, Bozê Rewane.

Xelk û alem gişa hatin temaşa wane.

Di nav wan da, esîrek hat, vekir derê şeş odan bi hev rane.

Gava bû şerqîna derê heftane,

Kuriyê behrê devê xwe avête wi zilami, veweşande dîwarane.

Ewesîra hate kuştin, êdî venegeriya ji mala xwe û xwediyane.

Li şopa wî pir merî çun, xwe ceribandin, ew jî mirin, venegerin ji malane,

Dawî Mem çû mala Emer begî, got: « Xalo, tu were, şalê ji vî heywanî ra bînî çare û dermane. »

Emer beg hate wî cihî, vekir derê her heft odane,

Rabû, kete hundir, destê xwe avête bijiyane.

Di dest Emer begî da bû mîna mihiyane.

Emer begî gazî Memî kir, got: « Xwarzî, were, siwar be bi izna xudane! »

Mem çû, siwar bû li pişta Bozê Rewane,

Dakete meydanê, pê list lîzkekê didiyane,

Êdî, heywan rihet bû wekî hespane.

Memî emir da bîst û pênc seracane,
Gişkî hatin, sekinîn ser lingane.
Memî got : « Ez jî we dixwazim hon tev çêkin taximekî ji bona Bozê Rewane.
Eger ez tê da bibînim qisûr û kêmiyane,
Ezê we gişkan bi dar da kim, bi sêpiyane ! »
Seracan gotin : « Padişahim, emrê te li ser serê me û çavane ! »
Ji bona taximê Boz, rakirin herçî gewher û zêr û zivê giranbeha di xezînan e.
Heya şeş mehan tê xebitiyane.
Li şeş mehan bi şûn da, Beglî gote Memî : « De rabe, hazir bû taximê Bozê Rewane. »
Mem dakete jêr, taxim dane ser Boz û bîst û pênc seracan dest girêdane,
Bengz û reng ne ma bû di ruyê wane,
Ji tirsan mîna merî ber sermayê dilerizîyane.
Memî taxim eciband, gelek xelatên baş dane seracane,
Taxim gişkî şixulandi bûn bi çînane.
Li ser bi kevirê gewher şixuliyane,
Zengû ji zêr in, zexme gulabdîn in, mîna şewlê rojê diçirisiyane.
Di nava rikêban da, kevirên elmas qor danîne mîna hebên tizbiyane.
Hesinê liwanê gişk polad e, ji hesinê birûskê çêkirine ji bo dev û diranane.

*
* *

Hebûn sê qizên Padişahê Periyane,
Navê xwîşka mezin Tavbano ye, navê xwîşka navîn, Heyvbano ye ; Stêrbano navê biçûka xweyîngan e.

Rojekè derketin, çûn ser kaniya Gulane,
Ji xwe danîn postên kewane,
Ketine nava hewza gulane,
Stêrbano nihêrî ko cemala ko Xwedê daye her du xwişkane, ne daye tu kesane.
Postè xwe li xwe kir, û rakir yèn her du xweyingane.
Di ser wan ra firî, da perwazane.
Her du xwişkan kirine bang û emane,
Gotin : « Te çira rakir postè me her du xweyingane ? »
Wê got : « Min hîn ne diye mina cemala we her diyane.
Ez dikim çikî binihêrim li cemala we her du xwîşkane. »
Gotin : « Xweliya dinyaè bibare li serè me her siyane !
Dido hene, yek qîz e, yek xort e, bi çelengiyè kesek nagihê wane,
Yek kurè mîrê Mixribiyan e,
Ew mîr padişahè Kurdan e,
Ya din, bavê wê waliyê bajarè Cizîra Botan e,
Keça mîr Zengîn, Zîna Zèdan e. »
Stêrbano got : « Bi kitèba bavè me, heta hon raber min nekin Memê Alan û Zîna Zêdane,
Ez nebînim cemala van her du lewend û eşqiyane.
Ez daneynim postè we her diyane. »
Her du xwişkan jè ra qerar danîn, bi qewlekî tam, û bi dilekî sadiqane,
Gotin : « Tu deyne, em li xwe kin postane,
Emê îşev herin bajarê Cizîra Botane,
Zînê çek kin tabûta şahê Periyane,
Bidine ser piyèn çend periyane,
Rakin ji bajarê Cizîra Botane,
Li xwe xînin per û bazikane,

Şeva li yasiyan be, qerara tev bi şorê jinane,
Em ji te ra Zînê deynin di qonaxa Memê Alan, payitexta Mixribiyane,
Emê di şiklê kewan in, wê çaxê, emê xwe bavêjin devê kulekane,
Emê binihêrin li cemala wan her du lewend û eşqiyane.»
Li ser wê, Stêrbano danî postên her du xweyîngane,
Her siyan pev ra post li xwe kirin, ketin şiklê kewane,
Firiyan ji kaniya Gulane,
Hatine bajarê Cizîra Botane.

*
* *

Her sê qîzan xwe avêtine bajarê Cizîra Botane,
Di daîra Zînê da ketine devê pencere û kulekane,
Nihêrîn ko Zîn raketiye di nava nivînane,
Li bin lingan û ber serî pirepira meşele û çiran e.
Her sê xwîşkan xwendin ismê periyane,
Pif kirine ser Zînê, xatûna pişt perdane,
Kirine wexmê miriyane.
Textê Zînê rakirin, dane ser piyê cin û periyane,
Tevî wan çiran û meşelane,
Anîne bajarê Mixribiyane,
Danîne di daîra Memê Alane.
Memo ketiye xewa şevane.
Her sê xwîşkan xwe avêtin devê kulekan û pencerane,
Nihêrîn ko her diyan jî çavên xwe venekirine ji xewane.
Xwendin sivik ayeteke periyane,
Pif kirin ser Zîna Zêdan û Memê Alane.
Mem hişiyar bû ji xewa şevane.
Nihêrî ko di odê da, her şev, textê wî yek bû, îşev bûne didiyane.

Mem rabû, rûnişt di nava ciyane,
Kete fikar û texmînane.
Digot : « Ya Rebî, ev çi ecêba giran e ?
Eva îşê cin û periyan e,
Yan derew e, xewneke şevan e. »
Bi van fikran, rabû bi nava nivînane,
Reviya devê derî û pencerane,
Dît ko weke berê, girtî ne bi kilîtane.
Vegeriya, ser textê xwe rûnişt, di nav cî û nivînane ;
Xwend ismê ezem, pif kire ser textê Zînê, sereka çelengane,
Û raket, lihêf di ser serê xwe ra kişand bihustek û çar tiliyane.
Di nav ciyan da ma îşê saetek û didiyane,
Gelekî veliqitî ser kêlekane,
Çawan kir, xew ne dikete çavane.
Dawî, dîsa serê xwe hilda li bin lihêfê û nav nivînane.
Nihêrî li wî textî, ko di nav da yek raketiye, di şiklê jinan e,
Ko rast e, ne îşê xewnan û xulyan e.
Mem peya bû li ser textê padişane,
Hate ber textê Zîna Zêdane,
Rihet lihêf rakir li ser çavane,
Nihêrî ko ne cin e, ne perî ye, esil beşer e û insan e.
Çavê reş û belek, birî û bijangan xwe berdane ser kêlekê ruyane,
Eniya gewr e, madenê zîvane,
Biskên birewa xwe berdane ser hinarikên rûyane,
Bisk û qeter berdane ser guliyane,
Xwe berdane ser textê piştê û qolincane.
Taximekî hûr jê re wûnane, berdane ser pêsir û sepetê derziyane.

Serên bisk û guliyên sor mîna serê marê teyar badane,

Ew çende hişk in, weke polane,

Ko li zengûyên hespan kevin, wè qul kin, tèkevin parxanê heywane.

Dîsa Mem lihêf avête ser çavane,

Vegeriya, hate ser textê xwe, kete nav nivînê, dikiye fikarane.

Got : « Ya rebi, salê min sèzde ne, û pê kirine çardane,

Hîn mêşê mè û nêr veneniştiye li ser dawê Memê Alane.

Ko te va textè xwe çitol aniye, dîsan welê vegerînî ji xwediyane ! »

Car din raket, û lihêf di ser serê xwe ra kişand bihustek û çar tiliyane.

*
* *

Her sê xwîşkan nihêrîn ko ne Zîn dilive, û ne jî çavên xwe vedike ji xewa şevane.

Wan xwendin ismekî periyane,

Pif kirin nav textê Zîna Zèdane,

Vê derbê, Zînê çavên xwe vekirin ji xewa şevane.

Nihêrî ko îşev, ne wekî her caran e.

Berê, di odê da, text yek bû, îşev, bûne didiyane.

Çirayên wè berè dido bûn, û niha bûne çarane.

Zîn ji vî îşî kete texmineke girane.

Ji xwe ra digot : « Va ecèba ne dî kesane.

Gelo, ne be ko avête ser min bayê cin û periyane ? »

Serekî berê, xwe da derî û pencerane.

Dît ko hemî bi kilîtan girêda ne,

Tê ra derbas bûn ne mimkûn e ji bona tu kesane.

Car din, dîsa kete fikir û xulyane.

Hate bîra wê ko berî du rojan çûye ser kaniya Qestelê, ava Gulane.

Got : « Belkî hinekan dî be cemala min ya girane.

Vêcar, li pê min hati be van derane. »

Paşê, hate bîrê koma bekçiyane.

Digot : « Ji bo wê jî heye dermane,

Zihar ko hemî têr kirine ji perane,

Ko pê textê xwe bîne qonaxa min a mîna keliheke çiyane.

Tirsa min e ji xewê ye, xew dijminê mirovan e, û şev keliha mêran e.

Ez keti bûm xewa şevane,

Ne be ko vî xortê han destê xwe avêti be nav ciyane ! »

*
* *

Zînê qenc bala xwe da nav ciyane,

Nihêrî ko va ne îşê cin û periyan e,

Yê ko di nav textî da, insan e,

Hinga, bi dengekî bilind da ber qîrane,

Got : « Dilê min li yan e, sê cara li yan e !

Emrê min, yemsîkê, sêzde ye, dikeve çardane.

Ji roja ko ez ji diya xwe re bûme, û heyanî roja îro, min ne diye ruyê zilama û xortane.

Şeva îşevê, tistê di serê min de hatiye, bila naye serê kesekî misilmane !

Derdê min derdekî çetin î xaîb î giran e.

Ez nizanim ev îş ne îşê sêrê ye, û ne îşê Mîrê Cinan e.

Cêrî û xulamê di min ji mixrib heyanî sibehê li ber derî dikişînin nobetane,

Ezê nizanim, şeva işevê cèrî û xulamê min li kû mane.
Ez nizanim bê tuê di kû re ketiye dairê min ê rengînî, qonaxê min ê girane.
Bajarê Cizîrê li ser sê mihelan e,
Mihelekê li ser milê şêxê ticarane,
Mihelekê, li ser bozebeliyane,
Mihelekê li ser milê Hesen, Çeko û Qeretacîn, pismamên min in, mina ne cewrê şêrane.
Tu mêreki xerîb î, ez nizanim ne tu cizerî yî, û adeta we xortane,
Şeva nivê şevê, hon digerin li kerxana û meyxanane.
Ez nizanim şeva işev te ereq vexwariye, û tu î sikran e.
Û hevalê te sikran bûne, ji tenişta te rabûne, di hundirê meyxanane.
Tu jî rabûye, tu ketiye hundirê zikak û ewcane,
Te winda kiriye riya malane.
Te xwe girtiye li dairê min ê giran, mekanê hûtane.
Ji bona xatirê şeref û namûsa te be, ezê ban kim cèrî û xulamane,
Ew bila bi destê te bigirin, te teslîm bikin mala bavane,
Tu xorteki nestêlê ye, felek û dewran digere li serê mêrane;
Serê mêrê çê daim mij û dûman e. »

*
* *

Memo dengekî ban dikirê, digo : «Dilê min li yan e.
Tu xiyala xwe bide dairê min ê rengînî û qonaxê min ê girane,
Ji gava di vir de, ez di işê Rebê Alemê defekirim, nizanim ne bi ilmê sêrê ye, ne bi ilmê Mîrê Cinan e.

Bajarê ko tu dibêjî, Bajarê Cizîra Botan e.
Min di emrê xwe da ne ew diye bi çavane,
Ne jî bihîstiye bi guhane.
Qey koranî bi çavê te de hatiye. Tu serê xwe derxe, ji xwe re binêre li behra û dengizane,
Binêre li orinê qeptana û li tikîna gemiyane.
Ji min re dibêjin Çeleng Memê Alane,
Xwerziyê Şêxê Qureyşiyane,
Braziyê Emer begî û Elmas begî, siltanê Kurdane.
Vira bajarê Mixribiyan e,
Bajarê Mixribê bajarekî ezim i mezin û pir i giran e.
Li ser heft çiyan e,
Li ser sê sid û şêst û şeş qapiyan e.
Her qapîkê li ser sê sid û şêst û şeş walilixan e,
Her mihelekê li ser sê sid û şêst û şes camiyan e.
Her camîkê, sê minarê zirav tê de ne, tu dibêji qeytan e.
Li serê minara dibe pirînê mûmiyan û meşelane.
Wexta dinya dibe berê sibehê, mele banî dikevin serê minarane,
Dibe şîqînê wane,
Dengê wan mîna ye dengê şalûlan û bilbilane.
Dairê min î belek e, li ser heft tebeqan e,
Min hîmê vê qonaxê daniye li ser çil û çar lingane,
Bîst û dû lingên wê di nava behrê da dayine kutane.
Di zikê vî bajarî da, min ne hiştin tu yapicî û hostane.
Mi hemî li ser vê qonaxê kom kirin bi salane.
Min di bin behrê da lêkir hîmê diwanzde odane.
Tevda ji mermerê sor ê simsimî û reş ferşane.
Ev ji bo hebis kirina qatil û mêrkuj û mehkûmane.
Way ko yek ji gotina min bi der keve ! Wê emrê xwe biqedîne di nav wane.

Ez wana digirim, ù dest ù piyên wan dikim hesin ù kelepçane.

Ez hikimê sed ù yek salan didime wane.

Emran didime qereqol ù bekçiyane

Singiwan dixine serê tifingane,

Quntaxên tifingan berdidin erdê, pêşiya lingane.

Ew her diwanzde ode mexsûsî van celeb meriyan e.

Di qatê ortê da rûdinin derebegî ù mezinên Kurdane.

Di qatê sisiyan da rûdinin xortên weki min, salê wan sêzde ne, hîn nih pêkirine çardane.

Hemî dixwînin li ser mielimane,

Êdî navkêlên wan diêşin li ser text ù kursiyane ;

Enişkên wan gî kul bûne, hingî ko didine ser textane.

Di nav tiliyên wan da dibe çirkeçirka serê qelemane.

Ji tirsa min ne wêrin serên xwe rakin ji kitêbane.

Herçî xortên mezin mijûl dibin bi doz ù dehwane.

Dirêjiya royê, karê wan rakirin ù danîna ewraqan e.

Min di qatê qonaxê jorîn da daniye textekî zêrîn, bi çar lingane ;

Di her çar gûçên wî da danîne kevirên elmas ên giranbihane.

Hezar ù pênc sed xortên delenbegiya, timam bi min re sidqane can bi cane,

Saet ji mixrib heyanî sibehê singwa davên devên tifingane,

Li dora dairê min è belek, dibe tiqîna harisa ù bekçiyane.

Şeva îşevê, ez nizanim hezar ù pênc sed xortên delenbegiya, xewê avêtiye ser çavên wan, ù razane.

Adeta we qizane, hon didin dû xortane,
Berê xwe didin çolane,
Xort û naşiyan tu biriye nav bistanane,
Şev li we çûye, û tu vegerandî qiraxa bajêr û berdane.
Te winda kiriye riya mala dê û bavane,
Tu hatiye ber daîrê min è belek, qonaxa min a girane.
Te diye ko hezar û pênc sed xortên delenbegiya ji mixrib da dihênijin û razane,
Tu di ber wan re derbas bûye cihê min, mekanê dêwan û hûtane.
Tu qîzeke nestêlê xwiya ye, ezê rabim, ban kim hezar û pênc sed xortên delenbegiyane,
Bila bi destê te bigirin, te teslim bikin mala bavane. »

*
* *

Zînê got : « Samê te pir e, mîna romiyane !
Ev gotinên te dernakevin ji devê zariyane.
Tu dixwazî gotina xwe berî serî bi gur û derewane. »
Memî dît ko Zîn bê tirs û perwa dikiye van şorane.
Ew jî tê da şaş bû, niza bû ko ji wan her diyan yê rast kijan e.
Got : « Rabe, vê êvarê, ez û te va bi destê hev bigirin, weke xweyîng û birane.
Emê bi hev bigerin li nav van qesr û qonaxane,
Bi dest xwe bigirin çiran û meşelane.
Qey elbet emê li dîwaran nas bikin ko yê derewîn kijan e.
Wê bi rûyê reş, bi der keve li nava qesr û qonaxane,
Zînê got : « Tu dixwazî ko ez rabim, destê xwe bi te dim, mîna xweyîngane,

Ez nikarim rabim, destê xwe bidim destê peyane,
Bigerim li koşk û bewşane,
Tema her kireke jinan radibe ser zarane. »
Memî got : « Bê çûyîn û nihêrîn, ji me ra tune dermane.
Ez dibêjim : « Qonaxa min e, tu bawer nakî gotinane. »
Zînê got : « Ez dinhêrim te çav daye şor û gotinane !
Min çiqas bi te ra got, tu felnı nakî gotinê meriyane.
Min bi te ra ne got : « Rabe, here, hîn ko her sê pismam bi te ne hesiyane ! »
Memî got : « Ez dinhêrim tu nabihîsî şorên meriyane.
Mafir ko tu bi min ra danakevî hewş û heyat û baxçane,
Te got : « Çil û yek cariyê min hene, dikin xizmetane. »
Min jî goti bû : « Hezar û pênc sed xort ji min dixwazin emrane. »
Were, tu dengekî didiyan gazî bike çil û yek cariyane,
Ez jî wê bang kim hezar û pênc sed xortên Kurdane.
Ko eger qonaxa te be, wê cariyên te werin bê şekane ;
Na ko qonaxa min be, wê xortên Kurdan werin cem me her diyane.
Hema Zîn di nav ciyan da rabû, got : « Va gotina li ser serî û her du çavane ! »
Li ser têxt peya bû, çû ber pencerane,
Pencere vekir, kire qîrîn li çel û yek qerbaş û cariyane.
Tu kes lê venegerî, Zîn ji kira xwe bû poşmane.
Vê derbê, dob hat ser Memê Alane,
Bi dengekî bilind bang kire hezar û pênc sed xortên Kurdane,
Got : « Begliyo, te da min soz û qerar ko nehêlî çûçikên ezmane
Werin têkevin oda mın, tevî textane.

Qey ko eqil di serê we da ne mane,
Hon bi ser min da dişînin kêmaqilane.
Yeke rêwindayî hatiye, qet nabihîse şorane. »

*
* *

Bi guhê Beglî ket dengê Memê Alane,
Emir da hezar û pênc sed xortên Kurdane,
Got : « Rabin, bi der kevin ji odane,
Têye dengê padişahê me Memê Alan, bi xeydeke girane.
Nizam çi ecêbe işev lê qewimiye di nava dairane.
Xwedê zane, ko biqare, wê ji îdama we giştikan ra derkeve fermane ! »
Xortên Kurdan rabûn, bi der ketin ji ode û qawişane.
Li piştê xwe şidandin cotê yaqûbiyane,
Bi ser da berdan qameyên lêzgîn, milê xwe êxistin zilxane,
Bejna xwe xemilandin bi silehane.
Beglî kete pêşiya wan xortane,
Tofî pêşîn gî xortên sivik in, di çax û wextê Memî da ne,
Di guhê wan da giharên zêrîn in, falqê temeriyê bi ser da berdane ;
Li pişt wan tên xortên qert, bi zilxên dawidî, û zoyê yaqûbiyane bi ser da girêdane.
Qeytanê nêriziyan girêdane ;
Tê leqelaqa binaniya şûran, dikevine li qoncê cizmane.
Bi rev diketin dîwana her du textane.
Beglî, birayê Memî, yê canecane,
Yê ko serdarê hezar û pênc sed xortên Kurdan e,
Hate ber deriyê Memî, got : « Bibê, şahê min, ez ji te ra xirab kim kîjan mihela bajarê Mixribiyane ? »

Zînê nihêrî ko xewa wê şaş e giran e.

Hema rabû, reviya, xwe avête dest û lingê Memê Alane,

Gotê : « Min ji nezanî kire qisûr, qisûr efa mêran e,

Tu kira min bidî binê lingane. »

Hinga, Memî emir da Beglî, serdarê hezar û pênc sed xortên Kurdane,

Gotê : « Tiştek tune, ne hewce ye ko bigerin li koşk û odane ! »

*
* *

Memî bi Zînê ra digot : « Di vê yekê da heye hikmeta Xudane.

Em nizanim ko di heqê me her diyan da, ya bi xêr û xweşî kijan e.

Were, emê textên xwe bikişinin ber hev, heya serê sibê, kerem ji Xudan e. »

Textên xwe kişandine ber hev, û bi hev ra ketine şorane.

Di nava hev da danîn sonda girane,

Sond xwarin bi pêxember û ewliyane,

Mem ji stoyê xwe da danî humeyliya meqbûl, û anî şûrê nêrgiz, ev her du danîn nav bera û textane.

Got : « Emê îşev pev ra rakevin, mîna xwişk û birane ;

Gava sibê bû, emê bang kin şêx û alimên bajarê Mixribiyane.

Bi emrê Xwedê û qewlê pêxember, bila bibirin mara me her diyane. »

Bi hev ra guhartin qaşê gustîrane,

Li ser ya Memî, nivisiye « Memê Alane. »

Li ser ya Zînê, nivisiye « Qîza Waliyê Cizîra Botan, Zîna Zêdane. »

Hêdî hêdî, bi ṣor û xeber danê, ketine xewa ṣevane.

*
* *

Ṣor hate ser her sê qizên Padiṣahê Periyane,
Tema hîne sekinîne li devê pencerane.
Tavbano got : « Gunehê wan her diyan li stoyê me her siyan e !
Tenê me anî cih ṣora ko me da bû Stêrbano li ser Kaniya Gulane.
Êdî tu heqê te ne ma li me her du xwîṣkane ! »
Xwendin ismeki periyane, pif kirin nav her du text û nivînane,
Mem û Zîn ketine wehm û dereceyê cendek û miriyane.
Her sê xwîṣkan gazî kirin cin û periyane,
Textê Zînê rakirin tevî her du çirane,
Bilind kirin heya gihane taqê ezmanê heftane ;
Xwe berdane ser bajarê Cizîra Botane.
Textê Zînê danîne cihê berê, meqamê dê û bavane.
Sibe bû, ro helat, xwe da serê çiyane.
Zînê çavê xwe rakir ji xewa ṣevane,
Nihêrî ko tune ew mêvanê xwe yê ṣeva çûnî, xwediyê mihebeta sadiqane.
Kire qîrîn, bi deverûyan xwe avête ser nivînane.
Got : « Va çi ecêb û elameta giran e ?
Min digot qey rast e, tu nabê ko xewneke ṣevan e. »
Paṣê, da eqlê xwe kêfa ṣevane.
Got : « Bi min ko me bi hev ra guhartine gustîrên pêçiyane. »
Destê xwe avête gustîrê, û lê nihêrî ko li ser qaṣê wê hatiye nivîsîn : « Memê Alan, Padiṣahê Kurdane. »

Hinga, zanî ko çîroka ṣeva din ne derew e, rast e û eṣqeke sadiqan e.

Car din kire qirîn, ji xwe çû, kete nav nivînane.

*
* *

Koma çil û yek cariyan li ser Zînê bi hev ra civiyane.

Hinekan radihihiṣte destane,

Hinekan pêsîr qelaṣt, û hinekan av rejand ser çavane.

Pêda pêda hiş hatine serî. Nihêrî li cariyane.

Got : « We xêr e ? Kê gazî we kir, ko hon li min civîne mîna qertelane ? »

Gotinê : « Xatûn, dengê qîrîna te hat, em tev da reviyane,

Me got : « Belkî tiṣtek qewimiye ! » Em hatin, ko tu ketiye ser ciyane. »

Zînê cariya vegerandin ciyê wane.

Gava bi tenê ma, ji xwe danîn cil û çekên xatûnane.

Li xwe kir kiraseki reṣ, yê erebane,

Ko ne hêja ye du qirûṣ û nîvane.

Bi carê xwe kir belgihê cariyane.

Ne ma bi kesî ra dike ṣor û xeberane,

Cariyan xeber dane Mîr Ezîn, mîrê bajarê Cizîra Botane,

Ko Zîn ketiye bi nexweṣiyeke girane.

Mîr Ezîn hat, nihêrî ko rast e gotina cariyane.

Heyfa çavên reṣ û belek, xerab bûne mîna çavên dînane.

Mîr Ezîn emir da, ne hiṣtin navê hekîm û ṣêx û melane,

Hemî li ser Zînê civiyan, bi derewane.

Hinek dibên : « Bayê Cinan e. »

Hinek dibên : « Ev işê derman e. »

Hinek dixwînin û pif dikine ser textê Zînê û ciyane.

Zînê giştik qewitandin li wan derane.

Got : « De herin, ez ne nexweş im, ko hon bi min din dermanane ;

Ne jî bi min ra ketiye bayê periyane,

Ko ji min ra dikin berbejnan û nivişt û nisxane.

Zînê ji xwe heram kir ger û temaşa bajarê Cizîra Botane.

Sibê heya êvarê, û êvarê heya sibane,

Karê wê fikirîna wê şeva ko Mem dîtî û girîn û kişandina keseran e.

Rûyê wê nakene tevî tu kesane.

Heya şeş mehan ketc hizneke pir e mezin û girane.

Kesî nizanî bû ko li serê wê qewimiye çi ecêba girane.

*
* *

Emê herin dora Memê Alane.

Sibê, çavên xwe vekirin je xewa şevane.

Nihêrî ko tune mêvana xwe ya şeva çûnî, xwediya şor û henekane.

Bi xwe re digot : « Ecêb, va ne işê cin û periyan e ? »

Paşê, hate bîrê, got : « Law, ne me şeva çûnî guhartin gustîrên tiliyane ? »

Li destê xwe nihêrî ko rast e, ne bi derewan e.

Beglî, birayê Memî yê sadiqane,

Serdarê hezar û pênc sed xortên Kurdane

Nihêrî ko ro hate dema taştiyane

Piştê rohelat, saet hate didiyane.

Dîsa Mem derneket ji nivînane,

Ne jî ji bona nimêjê dakete mizgeftane,
Ne jî jê hatin tu emr û fermane.
Rabû, hilkişî oda Memî, guhê xwe da ber deriyane.
Bihîst ko ji hundirê odê têye dengê nalîna nexweşane.
Di cî da vegerî, hate nav hevalane,
Di nav wan da bijartin çendek ên eqilmend û xwendane.
Bi wan va, tev hatin ber oda Memê Alan, padişahê Kurdane.
Pêşirê ebayên xwe bi hev xistin û devên delingê şapikan berdane.
Gelikî bi edeb derî li Memî kutane.
Li hundir dihat dengekî zirav, wekî dengê nexweşane,
Digot : « Kî ye ? Bi derbas be, jê re destûr û eman e.»
Derbasî hundir bû Beglî, tevî wan hevalan giştikane.
Nihêrîn ko bengzê Memî qulibtiye bengzê miriyane.
Ji çavan bûye gurîna hêstirane,
Bi ser devûrûyê Memî da mîna çilkên baranê Nîsanê rijiyane.
Hema li ber vê, dilê Beglî rabû, xwe da ber parxanane.
Got : « Bira, eman, hatiye serê te çi ecêba girane ?
Em duhî çû bûn nêçîra pezkoviyane,
Eger çavê te ketiye li qîzeke beg û axayên Kurdane,
Hema tu li birayê xwe bike fermane,
Ne bi ya min, bi ya Xudayê keremê, Padişahê padişane,
Di nava bist û car saetan da, ji te ra bînim ji nav bajarê Mixribiyane.

Eger meraqeke din ji te re bûye xweyane,
Bêje, ezê niha biqedînim û wextê ji xwe naborînim, saetê nekim didiyane. »

*
* *

Dora pirsê hate Memê Alane. Got : « Begli, brayo, tu î dîn î !
Ez çi bêjim, tu ecêba şeva din nabînî.
Hema, emrê ko li te bikim, tu bibînî.
Tu haya diya pîr û bavê kal tê negihînî,
Her dû kokimên apan pê nehesînî.
Eger tu î jêbatî yî, û karê ko ez dibêjim pêk bikarî bibînî,
Tu zûka herî xwe bi tewlê nijdiyan bigibînî,
Hespê boz ji qeyd û merbendan bifitilînî,
Zîn û zenguyan bi ser dî, tengan bişidînî.
Welatê xerîbiyê çetin e, xwe bi derê oda xeznê gihînî.
Heqiba min ji zêr û cewahîran tiji bikî, li terkiya Boz bişidînî.
Ro li taştiyan, tu li ber kevirê siwarbûnê rawestînî,
Bi destê birayê xwe bigirî, bi ser pişta Boz bigerînî.
Bi min ra bi rê kevî, birayê xwe di nava bajêr da bi der xînî,
Di ser riya bajarê Cizîrê kî, û biterikînî. »

*
* *

Vê gotinê eqil ji serê Begli revand, bû mîna dînê çolane.
Bi hêla heremê da revî, xwe gihande diya pîr, kalê bavane.

Xeberek dişand ji bona her dû kokim û bextreşên apane.

Gote wan : « Hon çi rûniştine li van derane ?

Mala me şewitî, hêviya me ne ma li erdane.

Nizam ko çi li Memî qewimiye, bûye mîna bodelane.

Dixwaze berê xwe bide bajarê Cizîra Botane.

Kesî me ev rê ne diye bi çavane,

Ne jî bihîstiye bi guhane.

Mem dike bi vê rê da here, bê haya we giştikane.

Çûyîn bi dev gengaz e, lê veger ne bi destê meriyan e. »

Her çar bi hev ra revîn oda Memî, şêrînê dê û bavane,

Hêviya her du apane.

*
* *

Piştî ko Beglî çû, Memî çavên xwe girtin, kete xûliyane.

Memî hew çavên xwe vekirin, û nihêrî li dorhêlane

Ko li ber balgihê serî rûniştiye pîra diyane,

Li bin lingan sekiniye kalê bavane,

Li her kêlekê rawestiye kokimekî apane.

Hêstiran dibarîne bi pehniya rûyane.

Gotin : « Eman, Memo, tu çi dikî ? Bê te nîne tu hêviya me her çarane.

Were, guh bide me, mekeve ber bayê xewneke şevane,

Ewa ko şeva çûnî li te bûye mêvane,

Ew şeytan e, dikeve şiklê qîzane,

Dikene bi kal û xortane.

Ji bona xewneke şevan, me giştikan mexîne şîn û yesane

Meêşîne dilê dost û xêrxazane,

Mekenîne devê neyar û dijminane. »

Memî got : « Bavo, ji xwe ra mekin gunehane,

Hon li rûyê min disekinîn, bi xatûnan ra dibêjîn : «Va şeytan e ! »

Di hundirê min da çêbûye derdekî mezin û kuleke girane.

Rehên canê mîn sist bûne di qotê serî da, heya binê lingane.

Di hinavê min da vêketiye arê darane,

Rivên û pêtî davêjê taqê ezmanê heftane.

Dermanê min tune li bajarê Mixribiyane,

Dermanê min pir î dûr e, li bajarê Cizîra Botan e.

Tasek ava Kaniya Qestelê, li ser destê Zîna Zêdan, wê ji min ra bibe hekîm û dermane.

Honê li min helal bikin şîrê bera, û êmegê gane.

Ezê lingê xwe têxim rikêba kuriyê behrê, çeleng Bozê Rewane,

Li nabêna bajarê Mixribê û bajarê Cizîrê dûr e, qonaxa salekê û şeş mehan e.

Rebê Alemê mirin daye me, ebdê gunehkarane,

Tirsa min e, ez serê xwe deynim diyarê rehmetê, axê gorane.

Hesreta xewna şevê xerab e, wê bi min ra here diyarê rehmetê, axa gorane. »

*
* *

Bavê kal nihêrî ko ji derdê Memî ra nikare bibîne tu çarane.

Got : « Belkî em bikari bin jê ra peyda bikin rêber û delîlane. »

Emir da xulaman, got : « Bang kin delalane,

Bila bigerin li nav bajarê Mixribiyane,
Ko kî bizani be riya Cizîra Botane,
Ezê çavên wî têr kim ji zêrane. »
Heya sê ro, sê şevan bû qîrîna delalane.
Digeriyan di nava Bajarê Mixribiyane.
Roja sisiyan, bi destê vala li bavê Memî vegeriyane.
Gotin : « Şahim, dengê me ket û devên me qerimiyane.
Me ne hişt di nava bajêr da tu cih û mihele yên bi gumane.
Dîsa me ne dî yekî ko bihîstiye navê bajarê Cizîrê bi guhane,
An riya wê dîti be bi çavane.
Bi destê vala û rûyê reş, em bi te vegeriyane. »
Gava bavê kal hêviya xwe birî ji rêberane,
Emir da wezîr û beg û axayên bajarê Mixribiyan giştikane,
Got : « Bila hemî qîzên delal û çeleng werin ; bigrin dîlanan û govendane,
Belkî Mem yekê biecibîne û ji bîr bike hesreta Zîna Zêdane. »
Li ser emra bavê Memî, sê rojan bû şadimanî di bajarê Mixribiyane.
Ne man qîzên wezîr û beg û axane,
Her yekê xwe bi awakî xemiland û dane ber kokiyane.
Dema refê wan qîzan diborîn di nava zikak û kolane,
Pê ra agir berdida dilê xortane.
Giştikan hatin li pêş qonaxa Memî, girtin govend û dîlane.
Dengê def û zirnan û tilîliyan xwe didane taqê ezmanane.

Dîsa dilê Memî ne xwest ko serî biderxe bi şibakane.

*
* *

Gava bavê Memî dît ko bi vê jî ji derdê Memî ra nebû dermane.

Vêca, xeber da şêx û meşayîx û Melan û hekîmane.

Melan zûka dest avêtin qelem û diwêt û tûrê kitêbane.

Her yekî bi awakî dest pê kirin bi nivîsandina berbejn û niviştane.

Hinekan dixwendin esmayên cin û periyane,

Hinekan destê xwe vedikirin li dîwana Xudan, bo diane.

Şêxan bêrakên kesk radikirin ber penceran û şibakane,

Dibûne gurmîna defên wane.

Dengê xelîliyan ker dikir guhê meriyane.

Qîreqîra mirîdan diçûn ezmanane.

Xwalê Memî, Emer begî jî xwe da bû berger û şîretane.

Lê vana tiştekî hinekî sar ne dikir arê dilê Memî bi tu awane,

Hîn zêdetir dibûn sebebê bîntengiyane.

*
* *

Memî got : « Xwalo, dilê min î liyan e ;

Îro dilê min bûye yataxa derd û kulane.

Hon nikan ji min ra bibînin çare û dermane,

Qene meêşînin serê min bi van tiştane.

Min ne dî ko kes birînê riman bi ava gula da kewane.

Ez di dil da birîn bûme, hon tînin ser min şêx û melane.

Ez çavên xwe digirim, ko bibînim xiyala Zîna Zêdane.

We ji min ra aniye qeflê soytariyane.

Qey tu bê li min kêm maye qîreqîra mirîd û dewrêşane.

Min got : « Belkî ez ne bim sebeba serê van serseriyane.

Bi navê Xwedê, ko ez rabim, tu ya xêrê ji min nagihê wane !

Wê serê van bifire li ber şûrê celatane !

Bila herin mala xwe, kesî dîn tune li van derane ! »

Xwalê Memî, Emer Begî dît ko tune tesîra van tiştane.

Her kes belav bû, vegeriyan cem xwediyane.

*
* *

Bavê Memî dît ko mayîna Memî di bajarê Mîxribiyane,

Derdê wî mezin dike û jê ra pir dike kul û kovane.

Roj bi roj, bi şûn da dare, tê da ne maye rengê xweşane ;

Ko wa dom bike, Memê here diyarê gornane.

Bê çûyîna bajarê Cizîrê, jê ra nînin çare û dermane.

Piştî ko va fikra hate kalê bavane,

Wî jî rabû, gote pîra diya û her du kokimên apane,

Got : « Eger em nehêlin ko Mem here bajarê Cizîra Botane,

Dîsa xêra wî nîne ji bona me her çar kokimane,

Wê roj bi roj bihele, mîna benîştê li ser kokê darane.

Emê paşê bêjin ko em bûne sebeb. Qedera Xwedê kes nizane.

Emê berdin, bila here ji derdê xwe ra bibîne hekîm û dermane.

Na, gava em nehèlin, teqez gunehê wî di stoyê me her çaran e.

Emê hinga bêjin : « Em bûne sebeb, ù me da kuştin tevî derd ù kulane. »

Her çar pev ra çûne cem Memî, xwediyê derd û kulane,

Gotin : « Eve, em razî bûn ko tu herî bajarê Cizîra Botane. »

Hinga, reng ù rûyê Memî vebû weke berê, mîna belkên gulane.

Di cî da rabû ser xwe, bi der ket di nava nivînane.

Zûka kire gazî li Begli, serdarê xortane,

Gotê : « Ji min ra dagire beqîbek ji perane,

Têxê kevirên cewher bi kulmane,

Bişidîne li terkiya kuriyê bebrê, Bozê di Rewane.

Bîne, bisekine li ber kevirê siwarbûnê, lingê min têxe rikêbane,

Beglî heqîba Memî girt, çû xezna perane,

Çendek ji xortan şandine tewla hespane,

Ji bo ko bi der xînin Bozê Rewane.

*
* *

Xebera çûyîna Memî belav bû di nav bajarê Mixribiyane.

Destên xelkê diketin paşila wane,

Mîna berxên dangiyê bi ser Memê Alan da reviyane.

Hinek dihatin destan, ù hinek diçûne rikêb ù lingane,

Mîna ko meyîtek bi der keve, dibû bavobavoya van xortane.

Memî dît ko îş î dirêj e, şîn ù girî xwe da ezmanane.

Zenguyek dido avètine kêlekèn Bozè Rewan, hevalè roja tengiyane.

Berda ser sto dizgina Bozè Rewane.

Heywan diçû mina birûska ko datè ji ezmanane.

Bi şûn wi da nedixewini bè talaz û toz û dûmane.

Kesî nizani hikmê vi heywanî çiqas pir e di riyane.

Li wi bayi diçûn, heya şev gihèşte wexta nimèja yasiyane.

Memî dit ko qelibi li bajarekî pir i mezin û girane.

Çirayèn wi bajari mina stêrkèn ezmanan e.

Memî dît ko li qonaxeke mezin şineke erebi girêdane.

Di nav da tè dengè bavè kal û Begli, birayê wi è canecane.

Hinga bir bir ko riya xwe şaş kiriye û vegeriye bajarè Mixribiyane.

Hêdika bi dûr ket li qonaxa bav û kalansera padişahê Kurdane.

Wê rojê geleki westi bû Mem tevi Bozè Rewan di wan riyane.

Çû li kêleka bajèr, li yekî bû mêvane.

Gotê : « Min rê şaş kir û vegeriyam li van derane.

Eger ji devê te bi der keve, an xeberê bidî kalê bavane,

Bila tu zani bi ko czè te bişinim ber sèpi û kendirane.

Divê tu sibê zû min hişyar biki, demê limèja şafiiyane. »

Xwediyè malê got : « Li ser seran û her du çavane,

Madam işev li min bû mêvan Memê Alan, padişahê Kurdane. »

Heya sibê, xwediyê malê rûnişt, xew ne kete çavane.
Sibê, berî berbangê, Mem rakir ji xewane,
Jê ra derxist Bozê Rewâne.

*
* *

Mem siwar bû, car din bi der ket ji bajarê Mixribiyane,
Berê xwe da Cizîra Botane, riya şeş mehane.
Hespê xwe avête nav zenguyane.
Di bin Memî da, Bozê Rewan çêdikir mîna xezala çolane.
Dîsa şeva Xudê hate yasiyane.
Memî dît ko di kêlekê da tê dengê gûşegûşa avê û destê meriyane.
Berê hesp guharte ser, ko kalek e, emrê wi gihaye heftê û pencane.
Ser û çavê nûranî ne, mîna gulane.
Hespekî boz, weki yê Memî girêdaye bi qeyd û merbendane.
Bi xwe jî dike destmêja yasiyane.
Memî lê silav kir, kalo silav vegerand û rabû ser lingane.
Got : « Were, peya be li ser serê min û her du çavane.
Were, ez û te va bikin limêja yasiyane,
Belkî jî bi te ra siwar bim qonaxekê, dibe didiyane. »
Ev kalo Xizir, mêrê kerbelan e.
Mem peya bû ; bi kalî va, li ser kaniyê kirin sêzde rikat nimêja yasiyane.
Her du jî bi hev ra siwar bûn li pişta hespane.
Tema dilê Memî şewitîye, kêlekên hespê xwe dane ber zenguyane,
Parxanê heywên çênî kirin, mîna goştê qîmane.

Memî dinhêrî ko kal zenguyan li hespê xwe nade, dîsa li pêş wî diçe sedek didiyê cotane.

Memî di dilê xwe da digot : « Hespê min kuriyê behrê, Bozê Rewan e,

Bi wî ra çûyîn, li dinê, ne karê tu hespan e.

Nizam ko eva çi ecêba giran e.

Hespê kalo weke îşê cin û periyan e. »

Bi vê çûnê birîn riya şeş mehan bi panzde roj û panzde şevane.

Gava nêzîk bûn ji şetê Cizîra Botane,

Kalo got : « Memo, kurê min, tu diçi Cizîrê ji bona Zina Zêdane,

Di nava we de heye eşqeke dilane.

Min divê li te bikim çend şîretane. »

Memî got : « Bibê, li ser serê min û her du çavane. »

Kalo got : « Gava darî ber şetê Cizîra Botane,

Şet î pehn û mezin e, li ser nînin kelek û darê gemiyane,

Ji alî din radibe dûmane,

Kelîşo daniye qîza Bekoyê Şeytane,

Dixwaze ko te bixapîne bi navê Zîna Zêdane,

Lê tu bawer meke ; ew qîza Beko Awan e.

Bavê wê zaniye ko tuê herî bajarê Cizîrê, bi kitêba remlane.

Qîza xwe şande pêş te, dike te biqelibîne li gola xwîniyane.

Bibe sebeba serê te û Bozê Rewane. »

Destê xwe li pişta Memî xist, jê ra kir gelek diane.

Paşê, winda bû li pêş çavane.

Memî nihêrî li dora ewr û ezmanane.

Ko sê kewên belekpor difirîn li pey hevane

Şahînekî pîr î kal, bask û pêr peritî daye pêşiyane.

Memî kire lez, heywan da ber zenguyane, da pey wane.

*
* *

Dema ko ketine keviya ava şet simê Bozê Rewane,
Nihêrî ko şora kalo rast e, ne kelek û ne jî darê gemiyan e.
Bi tenê, li wî alî şet, radibe dûmane,
Yek rûniştiye li ber kelişoyane.
Dinya bihar e, micalê paliya cihan e û kulîlkê hinaran e.
Felat sor bûye mîna xwîna mêrane,
Pêl davêne serê pêlane.
Delxe davêne serê delxane,
Lêdixînin li kûna çiyane.
Gava çavê Memo li bajarê Cizîrê ket, dengekî ban kir, go : « Dilê min li yan e, sê cara li yan e !
Aqil û olan di serê min de ne mane,
Ezê Kuriyê Behrê biqelibînim li felatê bajarê Cizîra xopane,
Li gumînê pêla û delxane.
Bi Xwedê, ez ditirsim ji gola xwîniyane,
Tê da tê fişînê mara, çelpînê masiyane.
Felatê Cizîrê li pêşiya min bûye siltane.
Siltanekî bê dexalet û eman e.
Tirsa min e, min bavêje gola xwîniyane
Gola xwîniyan kûr e, tê da tê fişînê mara û çelpînê masiyane.
Wê goştê me bibe rizqê mar û masiyane.
Malê me pir e, wê bimîne li mîretçiyane.
Bayê xerbî ji hêla jêr va tê, li felat dixîne, pêla vedigerîne li serê pêlane.
Bayê xerbî jî siltan e,
Siltanekî bê dexalet û emane.

Kuriyê Behrê siltanê behran e.
Memê Alan jî siltanê Kurdan e.
Em çar siltan li vê derê li hevûdû civiyane.
Ezê ji siltanê bê û sultanê avê bixwazim emane.
Ezê kuriyê behrê biqelibînim li felatê Cizîra Xopane. »

*
* *

Memo dengekî banê Zînê, qîza Beko Awan kir, go : « Lê, lê, xûşkê, dilê min liyan e, sê cara liyan e !
Ez î xerîb im, nizanim riyan û derbane.
Xwedê hebîna, bihurê felatê Cizîrê kijan e ?
Ro hilatiye ji mala Xwedê ji aliyê jêre,
Şewqê xwe daye dinyayê û hawêrdore.
Ez nizanim, ne sibe ye û ne êvar e.
Çaxê te bi xêr e. »
Zînê, qîza Beko Awan dengekî ban dikirê, digo : « Xerîbo, ez bi qurbano, ro helatiye ; ji mala Xwedê ji dûr e.
Şewqê xwe daye dinyaê û hawêrdore.
Xiyala xwe bidiyê, kuriyê Behrê, Bozê Rewan di bin te de dikûrekûre.
Stoyê te xwar kiriye kostekê saetê û qeytanê lahûre.
Tu eşqî bûye li bajarê Cizîrê, qedehê çavê min reş î belek û guliyê min ê hûre.
Tu li wê derê bisekine, mîna kevirê dêrê ermeliyane,
Ezê derbas bim felatê Cizîra xopane,
Bila Cizîrê ji xweyê bihere, bixwe serê xwediyane ! »
Memo digo : « Erê xûşkê, dilê min liyan e,
Hayê min tune ji van pirsane,
Ji min re dibêjin ticarê hespane.
Ez hatime li pêşiyê û hespê min bi şûn da mane.

Ji bo Xwedê, bihurê Cizîrê ji min re bike beyane.
Ezê derbas bim xana bêkarane. »
Zînê dengekî ban dikirê, digo : « Tu bawer nakiye ko ez im mêvana te ya şevane !
Di daîrê te nê giran de, me pev re guhart gustîlane.
Gustîla te vaye di tiliya min da ye, ne bi derewan e !
Wexta ko te gazî Beglî kir, serdarê hezar û pênc sed xortên Kurdane,
Hate me, tevî hevalane.
Hema te emir da, dibûn şeqînê şûrane.
Ma êdî ji te re çi bidim îşaretane ?
Ez bi qurbano, Memo,
Bejin ziravo mîna şiva bê kelemo,
Tuê ji dilê min rebena Xwedê re hekîm û şefa û merhemo !
Tu li wê derê bisekine mîna keyirê dêrê Ermeliyane,
Ezê biqetînim felatê bajarê Cizîra xopane,
Tuê bi destê min bigirî û min bavêjî terkiya Kuriyê Behrê, çeleng Bozê Rewane.
Bi rê da wê pêrgî min û te bibe kerwana bazirgane,
Wê bêjin : « Xwezil bi dilê Memo ! A ko aniye, çawa can e ! »

*
* *

Mem lê nihêrî ko lê nabe tu çare û tu dermane.
Gote : « Qîzê, ez dizanim tu qîza Beko yî, bavê te mîfsid û şeytan e. »
Gava qîza Beko dît Memî ew nas kiriye, nayê xapandin bi şorane,
Got : « Ezê bihurekî neçê raberî kim, belkî bi rû da here tevî Bozê Rewane. »

Bang kir, got : « Memo, bihur di tala te re ye, av e tenik e, nagihê nava meriyane. »

Memî, ji neçareyî, hesp da nav zenguyane,

Nihêrî ko av e kur e, bilindiya riman e.

Berê hêsp bi şûn da vegerand, xwe gihande saxê bi heftê û dû belane.

Got : « Ezê ber bi çêm da dakevim, belkî ez bibînim şivan û rèwiyane. »

Berê Bozê Rewan ber jèr kir, çû îşê çend deqiqane.

Dît ko şivanekî rùnîştiye li ber dewarane.

Memî lê silav da, şivên lê vegerand, rabû ser lingane.

Gote « Mêvano, tu bi xêr û selamet hatî, li ser çavane.

Bêje hele ka te çi emir û çi ferman e. »

Memî got : « Ji kerema xwe, raberî min bike bihurê Cizîra Botane. »

Şivan pê ra meşî, bihur raberî kir bi tiliyane.

Got : « Metirse, bira, ez heya niha di vî cihî ra derbas bûme deh carane. »

Memî destê xwe kire bèrika xwe, tiji kir ji zèr û perane,

Xist destê şivên got : « Menihêre li kêmî û qisûrane,

Xwedê hez ke ko me careke din hevûdû dît bi çavane,

Ez dikarim bipirsim li halê camêr û qencane. »

Heywan ajote nava şet, nihêrî ko pir î tenik e, xwe nade ser çokane.

Derbas bû ji avê, berê xwe da bajêr, bi lez; hesp da ber zenguyane.

*
* *

Qîza Beko dît ko Mem derbas bû ji avê, wê here bajêr. xwe şilf kir ji cilane,

Hate ser riya Memî sekinî, ına li benda maniyane.

Hîn Mem nêzikî ne bû bû, bang kir, got : « Lawo, heşaşo, şerabxwiro, tu î dîn î !

Ez li ciyê xwe rûniştime, tu werî namûsa min xerab bikî, bihetikînî,

Vê pîsiyê bi serê min da bînî !

Ma tu nizanî ko ez bêjime xelkê Cizîrê, tu bi xweşî li dinê namînî ?

Ko tewr tiştekî nekim jî, nahêlim ko tu xwe bi Zînê gihînî. »

Memî dît ko fêla wê xerab e, piştî ko nika bû wî bixapîne,

Dixwaze wî li reziliyeke meziu daxîne ;

Mem ji devê wê kêm pirtir ditirsî ko gotinan bi nav xelkê xîne,

Pê navê Zînê xerab bike, êdî nika be xwe pê gihîne.

Ji bo van yekan, Memî berê xwe da hîlane.

Gotê : « Xwişka min, tu iş naçin serî bi derewane.

Mavêje ser min bêbextiyane.

Bi min ra dibêjin siltanê Bajarê Mixribiyan, padişahê Kurdane.

Hîn min bi xerabî çavê xwe ranekiriye li tu qîz û jinane.

Tu çira davêjî ser min derewane ? »

*
* *

Qîza Beko got : « Divê tu bi min dî soz û bextê mêrane.

Eger Xwedê kir mirazê te bi Zîna Zêdane,

Tuê bi destê min jî bigirî, bibî Bajarê Mixribiyane.

Eger Zîn serdilka te ye, wê bi min va bibin didiyane.

Bozê Rewan i xurt e, dikare bibe me her siya heya Bajarê Mixribiyane.

Ez jî wê raber te bikim der û berane,

Ko li derdê te ra bibînim çare û dermane. »

Memî dît ko bi rihetî nafilite ji qîza Bekoyê Şeytane,

Ji bo dilxweşiya wê got : « Gur namirin bi du pariyane !

Yanî ji peyakî ra zewaca du jinan hêsan e.

Gava Xwedê kir mirazê min û Zînê, me her diyane,

Ezê destê te jî bigrim, bavêjim ser terkiya Bozê Rewane.

Boz î xurt e, dikare me her siyan jî bigihîne bajarê Mixribiyane. »

*
* *

Qîza Beko got : « Madam ko te bi mirî ra da şora mêrane,

Çîkî peya be, ezê je te ra bêjim rê û adetê Cizîra Botane. »

Memî lingê xwe bi der xist ji rikêba Bozê Rewane,

Peya bû li cem qîza Bekoyê Şeytane.

Gotê : « De bêje, ka binhêrim şora te çi ye. Ro li min çû bi derewane. »

Wê got : « Merê xerib î kor e, tiştekî nizane.

Bajarê me îro bûye sê bendane.

Bendek, ya kurên Mîr Tacîn in, ev bend tê pê ji ticarane.

Bendek, ya kurên Mîr Celal in, Hesen, Çeko û Qeretacîn, serekê diz û eşqiyane.

Benda sisiyan, ya kurê mîr Zengîn, mîrê Cizîra Botan e.

Ev benda hana hemî mezin û beg û axa û zana ne.

Serekê van her sê bendan ji baveki ne, hîn tu bav ne ketine nava wane.

Kurên Mîr Tacîn dido ne, ê biçûk, dibênê Mîr Şem ; Mîr Sêvdîn mezinê wan her diyan e.

Kurê Mîr Zengîn yek e, navê wî Mîr Ezîn e, niha li şûna bavê xwe mîrê bajarê Cizîra Botan e.

Mîr Şem û Mîr Sêvdîn li dinê û memleketan digerînin malê ticarane.

Hesen, Çeko û Qeretacîn, sibê heya êvarê girêdidin silehane,

Karê wan pê da nijde û talan e,

Dirijînin xwînê, dikujin mêrane.

*
* *

Niha, ya ko tu ji bo wê darî, Zîn e :

Dotmama Hesen, destgirtî û qelendayiya Çeko, ezîza Qeretacîn e.

Xwedê zane, Çeko van rojan dike bizewice, Zînê bi der xîne.

Mîr Şem û Mîr Sêvdîn di riya wê da sekinîne.

Xeber dane Hesen ko em giştik pismamên hev in, û ne biyanî ne.

Te Sitiya çavbelek bir, Zîn jî ya me ye ; yê ko qala Zînê bike, bila xwe ji bo mirinê hazir ke, bişidîne.

*
* *

Hesen got : « Ev sê sal in, me ne hişt malê karwan û ticarane,

Me gişkê civand, kire zikê Zînê û Mîr Ezîn, mîrê Botane.

Gava em dikin berîn, hon niha hatine, bûne pismamê qîzane.

Tu dizanî, ez î dîn û girgîn im.

Ezê şûrê nêriz ji kalên bikişînim.

Min digot : « Ezê Zînê pişti çend rojan bi der xînim.

Madam ko hat bi vê yekê sekinî, helalê Xwedê li min heram be, ko ezê niha, ro li tastiyan, ji mal bi der nexînim.

Ezê hinga zora we bînim. »

Em herine ser Mîr Ezîn, pismamê wane.

Gelikî xeyidî li wan gotinên di navbera her du hêlên pismamane.

Got : « Madam îş hat sekinî bi nerindiyane,

Bila nikaha wê li eniya min be, ko nadime we her du seriyane.

Ko niha ticarek ji welatekî xerîb were, ezê xwîşka xwe pê dim, û vegerînim qalanê her sê birane. »

Hesen, Çeko û Qeretacîn gotin : « Me malê xwe ne da te li ser kavirane.

Emê destgirtiya brayê xwe hema îro bi der xin ro li nîvroyane.

Bi vî halî, her sê bendên pismamên ketine hev, û li hev digerin li manane.

Gişţikan sileh û zilx li xwe pêçane.

Neçê neçê li hev dinihêrin, mîna xwînî û neyarên bav û kalane.

*
* *

Ko tu ji cem min çûyî, kalekî rîspî, di dest da kitêbeke remlane,

Bi hikmê remlan dizane ko tuê werî bajarê Cizîra Botane,

Li riya te dipêye, li kêleka bajêr, li serê kûç û zikakane

Gava wê çav bi te keve, wê were pêşiya te bêje : « Çîkî kerem ke malane. »

Tu guh mede wî, ew bavê min, Bekoyê Şeytan e.

Dema hate ber te, guh medê, û hespê xwe bide ber zenguyane.

Bi lez û bez hespê xwe rake çargavane,

Hingê kes nikare were pêşiya Bozê Rewane.

Gava tu darî nava bajêr, xelkê pir gazî te kin, wê bêjin « Li cem me bibe mêvan çend rojane ! »

Tu guh mede kesî : giş derewa dikin, ew ne ji bo te ye, bi tenê ji bo gewheran e.

Li kesî mesekine, tim bipirse û bêje : « Mala Hesen, Çeko û Qeretacîn kîjan e ? »

Ko tu li wan bûyî mêvane, ew keleha li polat in, wê ji derdê te ra bibin dermane.

Bila tu zani bî ko, heta nexapî bi bavê min, Bekoyê Şeytane,

Mala wî koxeke biçûk e, mîna pîna mirîşkan e ;

Ko tu têkevî, wê bifetisî, nema vedigerî ji diya pîr û kalê bavane. »

Memî got : « Kelîşo, pîroz bin hezar carî li te û xwediyane.

Ko ez Zînê bînim, tew metirse, ezê te jî bavêjime terkiya Bozê Rewane.

Heywan hespê behrê ye, wê rake me her siyane. »

Di wir da xatir xwest ji qîza Bekoyê Şeytane.

Hespê xwe bezand, rakire çargaviyane.

Li hember xwe tim dûredûr dinihêre li qonaxane,

Di dilê xwe da digot : « Ecêb, qonaxa ko *Zîn* tê da rûdine kîjan e ? »

*
* *

Mem kete derê bajarê Cizîra Botane.

Ji bîr kirin şîretê qîza Bekoyê Şeytane.

Di devê derî da, Memî nihêrî ko kalekî rîspî, emrê wî gihaye heftê û pêncane,

Ji erdê rabû, destê xwe avête lîwana Bozê Rewane,

Lîwan qewî li destê xwe gerand, derbekê û didiyane,

Gotê : « Mêvano, tu î xerîb î, were kerem ke, li mala apê xwe peya be, bibe mêvane. »

Memî got : « Apo, mal ava be li ser serê xwediyan û kurane.

Îkramê te li ser serê min û çavane.

Qonaxa min mala Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê Celaliyan e. »

Kalî dît ko Mem peya nabe bi şorane,

Destê xwe avête bêrika xwe, bi der xist reşbelekek ji bavê kal û her du apane.

Di kaxetê da nivîsîne ko gava digihî Cizîrê, here li vî kalî bibe mêvane.

Ew jî birayê me ye, ji bo te li şûna apan e.

Ji kalî ra jî nivîsîne van çend pirsane :

« Mem xerîb e, kesî nas nake, û nizane tu der û cihane.

Bala xwe bidê, bila li cem te neçe tu derane.

Nabe mêvanê tu kesane. »

Mem li kaxetê nihêrî, li bin danîne mora bavê kal û her du apane.

Memî da bala xwe ko va îşa nekeve serê meriyane ;

Got : « Gava ez ketim vî îşê dilane,

Bavê min delal berda nav bajarê me yê Mixribiyane,

Ne dîtin kesê ku riya Cizîrê bizane.

Bê wê, ez li ser pişta Bozê Rewan hatim panzde rojane,

Min pê birî riya şeş mehane.

Ma kê ev kaxet anî ji kalê bavane ?
Nebe ko ev fêna an hîle û tevdîra Bekoyê Şeytan e ?
Ezê pê ra herim, ji bo xatirê reşbeleka bavê kal û her du apane,
Gava min dît xaniyê wî mîna pîna mirîşkan e,
Hinga ji min ra şik namîne ko va bavê wê qîzê, Bekoyê Awan e.
Ezê kê hêsp rakime çargaviyane,
Berê xwe bidim mala Hesen, Çeko, Qeretacîn, her sê birane
Beko da pêşiya Memê Alane.
Ko hatine nêzîka mala Beko, Mem dît ko jê radibe dûmane,
Koxeke pîs, mîna pîna mirîşkan e.
Beko serê hêsp berda, çû hundir, ko ji Memî ra raxîne cil û kulavane.
Memo Bozê Rewan da nav zenguyane,
Hesp rabû çargav, Mem filitî ji destê Bekoyê mifsid û şeytane.

*
* *

Hinekî çû, Mem nihêrî ko yekî êsîr pişta xwe daye derê sûkane.
Mem di dilê xwe da digot : « Ez derbas dibime ji pir qesrane,
He ez ji vî êsîrî bipirsim qonaxa her sê birane. »
Qulabte ser êsîr berê Bozê Rewane.
Silav da li wî êsîrî, êsîr lê vegerand silava wî bi dest û çavane.
Li ber Memî rabû, sekinî li ser piyane.
Destê xwe avête hefsarê Bozê Rewane.
Ji çavan bû gurîna hêstiran wek barane.

Digot : « Heywax, ez çi bikim ! Nika tiştekî bike mêrî xizane.

Ko ne î xizan bama, min îşev tu bibiriya mala xwe, bikiriya mêvane.

Bes min binhêriya li bejna te ya mîna horî û lewendane. »

*
* *

Memî got : « Ez dinhêrim tu merîkî dîn î.

Tu merîkî feqîr î, ji bo çi ax û keseran bi ser dilê xwe da diheşînî ?

Cihê te tune, û nikarî mêvanan bihewînî,

Eger dixwazî çeyikê li ser min xînî,

Bide pêşiya min, û mala Hesen, Çeko, û Qeretacîn raberî min ke û pê gihînî. »

*
* *

Êsîr lê vegerand, got : « Dilê min î liyan e

Xweziya te niha kêr bavêta stoyê min, ez şerjê bikirama, li ber nigê Bozê Rewane,

Tek te va şora ne kirana. Li bajarê me, raberî hev kirin eyba giran e.

Qene îşev tenê li mala min bibe mêvane,

Em jî hev ra vekin qûtiya dilane. »

Memî got : « Bira, bila dilê te nemîne, ev bajarê we bajarê bodelan e.

Merî ko hate derekê, elbet heye qonaxa ko lê bibe mêvane. »

Gava ev êsîr dît ko Mem qet nabihîse û peya nabe bi şorane.

Got : « Bira, madam tu peya nabî li malê feqîr û xizanane,

Digerî li malê mezin û qonax û gedûkane,

Di roya teng da namûs bi der tê ji feqîran pirtirî began û axane.

Eger cihê min î fireh tune be ji, qene ez dikarim nîşanî te bidim pir cihane.

Were derdê xwe ji min ra bêje, belkî ez jî bi kêrî te têm bi du pere û nîvane. »

Mem dît ko li feqîr nabe çare û dermane.

Dil bi Memî şewitiye, mina birayê mêran ji dê û bavane.

Berê bi gotina wî nekir, peya ne bû, vê car ne xwest dilê wî bişkêne bo du pirsane,

Gotê : « Bira, ez meriki xerîb im, lazim e tu gotinê min nebê ji bo tu kesane :

Ez li welatê xwe padişah bûm, ez hatime ji bona Zîna Zêdane,

Qîza Mîr Zengîn xwişka Mir Ezîn, mîrê Cizîra Botane.»

*
* *

Êsîr got : « Bira, dilê min î liyan e.

Qîza mîrê me, Zîn, nexweş bûye va bû nêzîka şeş mehane.

Hinek dibêne nesax e, û hinek dibêne pê ketiye bayê periyane.

Hinek dibêne dîn bûye, jê nabe çare û dermane.

Her çil û yek cariyê xwe qewitandine, cil avêtine, li xwe kiriye kiraseki erebane.

Pismamên wê li ser ketine hev, di nav bera wan da çêbûye neyareke girane.

Birayê Zînê li ser vê yekê xeyidiye li wane.

Dibêje : « Eger ticareki xerîb hebe, bide qalanê pisinamane,

Ezê Zînê pê dim û vegerînim qalanê pismamên û bigrim devê wane. »

Memî got : « Bira, eger ev işa biqede bi zengîniyê û bi dayîna perane,

Brayê Zînê ji min dewlementir nabîne tu kesane. »

Êsîr got : « Ka çi te heye ? Rewşa te ne ya xwediyên peran e.

Tu siwarekî bi tenê yî, li pê te tune karwanekî mezin û girane.

Ne jî tu dikarî bi xwe ra bigerînî xezine û genc û difînane.

Eger tu bi çar qirûşê di bêrîka xwe dixapî, te hay hebe, bi perê bêrîkê, kes nikare here derê camêrane. »

Memî got : « Bira, dewletê xelkê me ne mîna we, xelkê Cizîrê, bi peran e.

Eve, terkiya min gişkî cewherdaş in, ez dikarim pê bikirim bajarê Cizîra Botan, tevî ticarane ! »

Êsîr got: «Cewherdaş li welatê me nake bihayê girane.

Eger tu vî hespê xwe bifiroşî, wê jî te ra bike genc û defînane. »

Mem got : « Dilê min i şewitî ye, her bi jan e.

Ez merikî xerîb im, dikime çi bikim bi hespane ?

Hema tu niha destê xwe bavê hefsarê Bozê Rewane,

Bide pêşiya min û berê xwe bide mezada hespane. »

*
* *

Ew êsîra kete pêşiya Memê Alane,

Bire mezada hespane.

Li ber qehwekê, Mem nigê xwe bi der xist ji zenguyên Bozê Rewane,

Peya bû li cem gelê qehweciyane.

Ji Memî ra kirsî danîn, bû şîngîna fîncanane.

Zehranan banê delalekî kirin û dane dest Bozê Rewane.

Kuriyê behrê avêtine mezada hespane.

Heywan serî hilda û terî da qolincane,

Di bin delêl da radibû ser lingê paşîn, kurîn diketê, mîna şêrane.

Ticar ne man, li dorhêlè gî civiyane,

Her yekî dixwest ji xwe ra bistîne û di dilè xwe de digo : « Belkî pè xweş bikim kèfa mîrekane. »

Çima ko heya wè rojè, hespekî mîna wî ne dî bûn di tu tewlane.

Zîn, rext û taximè kurîyê behrè, Bozè Rewane

Li sirme û gulavdîn hatine çêkirin û di qulp û helqeyèn zerînî da rûnandine kevirèn cewher èn girane.

Her kevirek ji wan nakeve dest heta bi xezinane.

Ticaran giştika malè xwe kirine hèkekè, li erdè dan di riya Bozè Rewane.

Dîsa, kesî ji wan nika bû bidana bedelê rext û zînane.

Di bajarê Cizîrê kes nema meraqliyè hespane,

Tevda hatin, li dora heywên civiyane.

Hinek ketine derdè kirîna hesp, û hinek jî dikine temeşane.

Hinek kom bûne li dora Memê Alane,

Dinhêrine li çelengiya bejnê û çavane.

Li ser hesp û siwêr bi hev ra ketine şertane,

Her kes ji xwe ra dikine gotinane,

Yê ko dibê : « Va xorta yi mîna melekan e. »

Yê ko dibê : « Her hal, çêlikè padişan e ! »

Yê ko dibên : « Dayîna Xwedè pir e, ew jî peyakî mîna me ye û însan e,

Werqasî çeleng e ko lè didelin çavê mèrane. »

*
* *

Ticar jî li dora hesp bi çûyîn û hatinê di ser nigan da ketine, westiyane.

Kesek ji bo kirîna wî heywanî li cem xwe têr nabîne perane.

Ticarekî din î mezin li Cizîrê heye, ko pir caran dana-keve sûkane,

Emrê wî gihaye dora heftê û pêncane.

Carcaran, ko diqare li ticarê Cizîrê, li wan dide lehfan û gurane,

Dibê : « Ezê we giştikan bikirim, tev mêl û xanî û milkane ! »

Hemî ticar li serê wî civiyane,

Gotin : « Îro hate serê me ecêbeke girane,

Hespek îro ketiye nav destê delalane,

Me giştika nika bû zîn û rextê wî bikirin bi perane.

Di zîn û rextan da, kevirê cewahîr hene, ko yek bi yek hêja ye xezînane.

Va yeka ji navê me ticaran ra eybeke pir e mezin û giran e.

Milk û malê dinê lazim dibe ji bo tengî û rû-metane.

De, rabe, ko tu diqarî, tu li serê me dikî fortan û gur û lehfane,

Tu dibê : « Ezê we giştikan bikirim, tevî mal û xanî û milkane. »

Divê tu me pak bikî ji vê şerma girane.

Hele, carê were mezada hespane.

Werqas xelk li serî civiyaye, mezad bûye mîna mey-dana eydiyane. »

Ticarê mezin got : « Law, tim ko ez î korocaẍ bim û ewladê min tune bin, dikim pê çi bikim bi perane ?

Çi gava ez bimirim, ev mal wê bimîne ji bo mî-rasxwirane.

Ezê vî hespî bikirim û xwedî kim li şûna ewledane,

Lê binhêrim heya serî didim diyarê rehmetê, axa gorane. »

*
* *

Bi der ket, berê xwe da mezada hespane.
Gihêşte mezadê, çav ket li Bozê Rewane,
Nihêrî ko hespekî wa ne diye di emrane.
Ticarê mezin xwe gihande delalê hespane,
Destê xwe avête hefsarê Bozê Rewane,
Got : « Law, delal, ma tu qet natirsî ji Xwedê û nezera çavane ?
Tu vî heywanî davê mezada hespane !
Ez nahêlim tu hêsp mezad kî, bes tu raber min ke xwediyê wî kîjan e. »
Delal hema destê xwe avête destê ticarê mezin, berê xwe dane cem siwarê hêsp, Memê Alane.
Ko nêzîk bûn, delêl raberî ticêr kir siwarê Boz di nav koma peyane.
Kalê ticar dît ko xortekî çeleng e, mîna hîva biharê li çardane.
Textê eniyê gewr e, çav reşbelek in, birî û bijangan xwe berdane ser hinarê rûyane.
Rabûn û rûniştina wî weke rabûn û rûniştina padişan e.
Hat, li kêleka Memî rûnişt, bi guh da got : « Şehê min, çîkî serê xwe vir da bade, ez dikim ji te ra bêjim du şorane.»
Mem berê xwe da kal, got : « Bêje gotina xwe, li ser serî û her du çavane. »
Kalo got : « Kurê min, tu natirsî ji Xwedê û nezera çavane ?
Ma va hespê te yê ko merî bavê mezadan e ?
Ko tu zanî dawake te heye, tu karî biqedînî bi perane,
Hema her du zenguyan jêke, tevî zexmane,

Ew çêbûne ji zêr, û kevirê cewher tê da hatiye danane.
Wê ji te re gelek peran bikin, bihayê genc û defînane.
Hespê te heyf e, mavêje van mezadane. »

Memî got : « Bavê, kalo, ya ko Xwedê da min nîne serê kesê misilmane.

Meraqa min, ya firotina hesp ne ji bona tunebûna peran e. »

Devê xwe xiste ber guhê kalo, got : « Kambax, pir î bê oxir e bila hewṣekê berê here, winda bibe li pêş çavane ! »

Ticar li Memî vegerand û got : « Law, mala me hatiye nasîn bi serafiya mêrane.

Tu weke merîkî bibirîn î, qedra mêl di çav te da ne xweyan e.

Birînê xortan ê pir li kezebê ne, bi maniya hezkirina dilan e.

Ne dûr e ko yê te jî li van doran e.

Eger îṣekî wanî li te qewimiye, îṣev li apê xwe bibe mêvane.

Ez ji te ra vekim derê dikanan û mixazane,
Ko bi wan ne bû, vekim genc û defînane,
Rake heya dilê te dixwaze perane.

Tuê bi tenê raberî apê xwe bike wî cihî bi tiliyane.

Ezê vê mihelê xerq kim bi mêl û zêrane,
Ji te ra biqedînim vê meraqa dilane ;
Heya niha, karê vê malê me ev e, emê mêl berev bikin, paṣê bidin di riya dilê camêrane. »

Mem got : « Apê min, ji bona mêl û peran mede xwe guran, fortan û lehfane !

Eger ez niha destê xwe bavêjim heqîba Boz, bi der xînim du cewherane,
Tuê hinga bizanî bî serwetê mêrane. »

Kalo got: «Brazî, were, îşev li cem apê xwe bibe mêvane.
Gava dilê te heye bi firotina Bozê Rewane,
Ezê sibe bi te dim bi giraniya vî heywanî zêr û mecîdiyane.
Emrê çûyî venagere li xwediyane,
Ma ezê çi bikim bi hespê padişane ?
Hezar carî mibarek be li xwediyane ! »
Memî got : « Apo, gotina te li ser serane.
De rabe, emê herin, ezê li mala te bibim mêvane ! »

*
* *

Mem rabû, siwar bû li pişta Bozê Rewane,
Da pey ticarê mezin, derbas bûn zikakekê didiyane.
Mem nîhêrî ko ticarê mezin sekiniye li ber qonaxekê, go : « Kalo, va meha şeşan e,
Ez pir geriyam li der û bajarane.
Min tu qonax ne dîn li tertîba vê qonaxê, bes yek e wanî heye, li bajarê Mixribiyan e,
Ew jî qonaxa padişahê Kurdan e. »
Ko çavê Memî ket li wan qonax û daîrane,
Mîna meqamê dê û bavane,
Ketin bîra wî diya pîr, kalê bavan, û her du kokimên apane,
Ko bê hêvî li benda wî dimane,
Hema xwe xwar kir, kete ser zînê Bozê Rewane,
Ji çavan bû gurîna hêstirane,
Ketine ser nihêtane.
Ticarê kal li Memî da halanane,
Jê re got : « Lawecan, te xêr e ? Girî îşê pîrekan e,
Ez nizanim, tu bi xurbetê ketî û qetiyayî ji mihebeta bav û diyane ;

Ez nizanim, salê te hindik in, ne wexta te û serencan e.

Lawê min, serê mêran çiyayekî bilind î bi mij û dûman e,

Peya be li mala apê xwe, meke kederane.

Ko derdê te çiqas mezin be, ezê jê ra bibînim çare û dermane ;

Ko barê te çiqas giran be jî, mexwe xemane,

Apê te her gav radike ciftê qentar, barê lo kane. »

*
* *

Mem got : « Bavo, dilê min ji kulan î bi keser e, û bi êş û jan e.

Derdê min derman nabe bi perane,

Taliya xwe, wê bisekine bi kuştina mêrane. »

Bi vê gotina Memî, ji çavê ticarê kal hêstir rijiyane li ser rûyan de, wek tavên rojê li ser ewrên meha gulane.

Got : « Ax, lawo, berê kula min yek bû, bi vê gotinê te kirin didiyane !

Min digot : « Belkî dehwa te biqede bi perane,

Qet ne dihate bîra min ko wê îş were bisekine li ser kuştina mêrane.

Ez êdî nikam bikim derewane :

Kesî min tune, ez bi xwe pirek im, emrê min digihê heftê û pêncane.

Mala me danine çar rûtane !

De were, peya be, emê îşev mijûl bin û bi hev ra bikin şorane,

Gava sibe bû, mecala nimêya me şafeiyane,

Ezê hinga di pêşiya te xînim kole û xûlam û xizmetçiyane :

Madam ko dawiya îşê te bi kuştina mêran e,

Bila te bibin qonaxa Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane.

Gava yek peya dibe li mala wane,

Canê xwe telef dikin di riya wane.

Bi her awayî derman dikin kula dilê mêvanane. »

Mem nihêrî ko her kes dibê : « Ji derdê te ra bê mala her sê biran, tune dermane »,

Hema di çeng da qulabt serê Bozê Rewane.

*
* *

Li mala ticar bi dûr ket, çû û kete devê çarşî û mezada Cizira Botane.

Nihêrî li ber qehwekê gelê bozebeliyan sekiniyane,

Berê hêsp bada û dageriya ser wane.

Go : « Belkî ez derbas bim ji qesra Hesen, Çeko, Qeretacîn û nizanim kîjan e,

Ezê ji van bozebeliyan pirs kim, belkî raber min bikin qesra wane. »

Gava wan dît bi ser wan da hat siwarekî mîna padişane,

Gişkî rabûne ser lingane, bi hev ra dikin gotin û şorane.

Digotîn : « Emê ji vî ra bigrin qedreke girane,

Belkî merhemet di dil keve, bi me de xerciyekê û çend perane ! »

Gişkan bi edeb, mîna eskerê dewletê sekinîn û qor girêdane

Yek hebû, aqilê wî pirtir bû ji yê hevalane.

Xwedê giravî, digotin berê mala wan maleke nas bû mala mêrane.

Ber ve Memî çû, destê xwe yê rastê li erdê xist, da ser serê xwe û çavane.

Bi destê din, girt hefsarê Bozê Rewane.

Got : « Peya be, kekè, li ser serè me giyane.

Memî li ser pişta Boz silav da li koma wan ebebozane.

Silava wî vegerandin bi edebeke pir e girane.

Mem got: « Raber min kin qesra Hesen, Çeko û Qeretacin kijan e. »

Gelè ebesoran bi vè şora Memî ra giştik giriyane,

Gotin : « Xweziya te em gişka bikuştana û xwîna me birijanda ber lingè vî hespè xwe, Bozê Rewane,

Tek te ne gota : « Raber min bikin qesra van her sè birane. »

Memî gote wan ebebozane :

« Bi min ko min tu şorè xerab ne kirin di heqè we hevalane,

Çima ji çavè we bû gurîna hêstirane ? »

Wan gelè hevalan gotin : « Kekè, em hev digirîn ko adetè me raber yekî kirin qonaxan eyba giran e.

Ko malè me çitonî be jî, kerem ke, işev bi tenè li cem me bibe mêvane.

Ji derdè feqirî û xizaniyè dilè me î bi kul û keser û bi jan e.

Emè işev vekin qûtiya dilane.

Sibe da zû, emè raber te bikin qesra wan her sè şèrane.

Ko tu li cem me peya ne bû, emèdî ne dikarin bigerin li cem hevalan û ne jî herin qehwane.

Xelkê bibè : « Malxerabino, we va mêvanê mîna padişan qebûl ne kir û di ser xwe ra derbas kir, şande qapiyane ! »

Wê bibèn : « Ma bi we ra tune bû namûs, şeref û wijdane ? »

Memî got : « Biran, ez dikim şorekê bikim, bila tiştek nere dilê we giştikane,

Mîna ye ko va bajarê we, bajarê kêmaqil û dînan e,

Ma merî ko dare derekê, yanê adeta xelkê we ko rasti kê hat, here mala wane ?

Derdê min pir î giran e, ew jî bi tenê li mala her sê biran dibe dermane.

Ez reca ji we dikim ko hon bilezinin,

Eger hon dixwazin çêyikê bi ser min xînin.

Yek destê xwe bavêje lîwana hespê min, min li mala her sê Celalian bigihînin. »

*
* *

Ebebozan dîn ko li peya bûna Memî nabe çare û dermane.

Ewê ko di nav wan da biaqil û sergiran e,

Bi hevalê xwe ra got : « Madam ko va xorta peya nabe û işê wî î mezin e, naqede bi me koma xizanane,

Hon li vir bin, ezê pê ra herim heya nêzîkî qonaxa her sê birane,

Jê ra salix dim ji dûr va, bi tiliyane. »

Destê xwe avête lîwana Bozê Rewane,

Kete pêşiya Mem, ketine mihela û çarsî û zikakane.

Hatin tala qesra Mîr Azîn, mîrê Cizîra Botane,

Ebeboz got : « Ev qesra mîrê me û pismamê her sê biran e.

Di vê qesrê da rûdine xwişka Mîr Ezîn, Zîna Zêdane.

Eger hez dikî, binhêre li pencere û şebakane,

Ji wê bi şûnda qesra Hesen, Çeko û Qeretacîn, meqamê şêran e. »

Qonaxa her sê biran ne ewqas qesreke mezin û giran e,
Ji ber ko fikra wan meriyana tim qetl û kuştina mêran e,
Guh nadin çêkirina qesr û qonaxane.
Lê qonaxa Mîr Ezîn, wê mîna kelihan e,
Merî hez dike lê binhêre bi saetane.
Memî dît ko tevda mîna qesra wî ya li bajarê Mixribiyan e.
Bi bîra wî ket wexta ko bi rê ket ji bajarê Mixribiyane,
Ji bo wî girî bûn diya pîr, kalê bavan û her du kokimên apane,
Bi ser rûyan da bû gurîna hêstirane,
Wî ebebozî got : « Bira, ji bo çi digirî û ji çavê te hêstir tên wekî barane ?
Ez jî merîkî mîna te bi derd im û derdê min î giran e.
Heya tu ji min ra derdê xwe nebêjî, ez te bernadim tu derane.
Emê ji hev ra vekin derê dilane. »
Memî got : « Canim, berde serê Bozê Rewane,
Derdê min derdekî pir î giran e,
Lê nabe tu çare û dermane.
Nayê gotin ji bona her kesane.
Niha ko em hatin ber van qesrane,
Berê qesra min jî hebû, û li van çêtir bû, heft qatane.
Ko min ew qesr u qonax terikandin, hate bîra min, lewma hêstir weke baranê ji çavê min rijiyane.
Serê hêsp berde, ez hewşekê berê herim mala van her sê birane.
Belkî ji bona derdê xwe bibînim îlac û dermane. »
Ebeboz serê hêsp berda, got : « Here, kekê, li ser serî û her du çavane. »

Memî destê xwe avête bêrikane,

Bi der xist sê kevirê gewher, danê, got : « Bere, ev ji bo te ù hevalane.

Ji xwe ra bikin mesrefê sûkê û qehwane.

Li qisûrê birayê xwe menihêrin, bidin bin lingane.

Ko eger ez pir mam li mala Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê şêrane,

Tevî gelê hevalan werine cem min, ezê debara we bidim mina ko eskerê hikûmetê digirin meaşane. »

Wî zîlamî destê xwe li erdê xist, da ser serê xwe û çavane

Got : « Here, Xwedè ji derdê te ra çar ke çare û dermane ! »

*
* *

Memî hespê xwe rakire çargavane,

Kete devê zikak û etebeyên bajarê Cizîra Botane,

Xelk, jin û mêr, mezin û biçûk bi der ketin sêran û temeşane,

Hewqas ketine derî û zikakan ko biçûk û pîr birin di bin lingane.

Keçên beg û axan jî hilkişîne ser qonax û daîrane,

Li çelengî û şengiya Memî dikin temeşane.

Bi hev ra dibèn : « Selatek ya Mihemed, ev çitol xortekî çeleng e, çitol can e ! »

Mem di nêv xelkê ra ajot, giha ber derê Celaliyane.

Nihêrî her sê bira jî hazir in, bi ser xwe da bi dar da kirine çengelê silehane.

Mem peya bû, silav da li her sê birane.

Her sê bira bi hev ra hatin pêşiya mêvanê xerîb, sekinîn li ser lingane.

Bala xwe dane rewş û tevgera vî mêvanî, ko ne mînaye tu kesan e,

Her halê wî mîna yê padişan e.

Merî lê dinihêre, dizane ko ji bav û kalan da ji mala mezinan e.

Bi çelengiya rû, nahêle ji bona meriyane.

Hele, hespê wî padişahê hemî hespan e.

Merî hişmetkar dibe ko lê binihêre û ditirse jê û nezera çavane.

Hesen revî, hate pêşiya mêvên, kire himbêza xwe û destê xwe gerand li kêlek û navkêlane,

Rakir, linga ne gihandine erdê, anî, danî mezela jorîn, cihê mêrane.

Çeko direvî, jê ra radixistin mehfûr û doşegê Bûrsê, tevî balgihane.

Qeretacîn dikire qirîn ji xulam û seyîsane,

Dihatin, Bozê Rewan dikişandine axor, tewla hespane.

Îro, çend roj in heywan ji hêlê ketiye ji westane.

Li bajarê Mixribiyan, hatiye heya Cizîra Botane.

Di panzde rojan da, biriye riya şeş mehane,

*
* *

Memê Alan rûniştî li ser zoyê nivîn û mehfûrane.

Xebera hatina wî bela bû li nav xelkê Cizîra Botane,

Digotin: «Hele, em herin mala Hesen, Çeko û Qeretacîn, dibên hatiye wir padişahê Kurdane,

Bimeşin, em herin binihêrin li wî mêvanê navgirane.

Dibên merikî pir î çeleng e, mîna melekan e.

Werqasa merîkî şêrîn ê, li hev hatî ye, ko emsalê wî tune li erdane. »

Ewqasa xelk rabûne diyarê xaniyan û devê pencerane,

Dixwazin li hember va li Memî bikin temeşane.
Bila Mem li vir be, em werin diyarê Zînê, xatûna çel û yek cariyane.

*
* *

Mehên Zînê timama bûne şeşane,
Tu xeber derneketin ji hêla Mem û ji bajarê Mixribiyane.
Sereki dirêj Zîn fekirî di xewna şevane.
Got: « Mala min bişewite, ji bona xewneke şevan, min xwe kire cihê bodelane.
Min cilê xwe avêtin û di histiyê xwe da danî kîrasekî erebane.
Xwe hepis kiriye di nava çar diwarane.
Ev giştik ji bona Memê Alan, padişahê bajarê Mixribiyane.
Ma gelo niha qet ez bi bîra wî dikevim ? Belkî jî niha ji xwe re eciband keçek ji keçên mezinên Mixribiyane.
Belkî ez nakevin bîra wî di xewnane.
Ma li min çi qewimiye, destgirtiyê min Çeko, qesabê mêran e.
Ez bi tenê xwe davême ber wehmane,
Min ji saetekê pirtir ne dî Mem, padişahê Kurdane,
Belkî jî bi şor û emelê xwe ne camêr be, her wekî cemala serçavane.
Ko ne wer bûya, elbet, heyanî niha, wê bi der keta li pêşiya xeberane.
Ma ev nizane ko ez jinek im, tu caran jin nagerin li welatan, li pê mêrane.
Adetê dinê ew e ko mêr digerin li pê jinane.
Ko eger bi min ra î rast bûya, wê heya niha qasidê wî bihata van derane.

Qey zihar ko di dilê wî de tune van yekane.
Êdî ji bo wî dilê xwe êşandin ne karê aqilan e. »

*
* *

Bi van fikaran, Zînê qetand zincîra xemane.
Eger dil i tijî bû jî, bi zor dixwest vala ke ji hezkirina Memê Alane.
Rabû, ber neynikê li serê xwe nihêrî hi zor û kotekane.
Di nava çil û yek cariyane, yek hebû, navê wê Riban e,
Karê wê, her gav Zînê ew dişande ser kaniya Qestelê, ava gulane.
Zînê bang kir, got : « Lê lê, Rihanê,
Ev bûne şeş meh ko hon nayên van derane,
Zûka here ji min ra bike du suxrane. »
Rihanê dît ko kete guhê wê dengê Zînê, ko hemî qewitandine ji berî şeş mehane,
Hewqas revî, jê dikişe rûh û cane.
Sekiniye li kêleka xatûna xwe, Zîna Zêdane,
Got : « Şikir ji kerema Xwedê ra ko ev bû nîzîka şeş mehane,
Îro te gazî kir, bi min ra dikî şorane !
De, bêje, xatûna min, te çi emr e, çi ferman e.
Zînê got : « Va şeş meh in ko min venexwariye ava kaniya Qestelê, ya gulane.
Zûka here, ji min ra bîne elbekê û didiyane. »
Hema Rihanê rakir cotê elbane.
Reviya, çû Kaniyê, elb tijî kirin ji ava gulane,
Li vegerê, riya wê kete ber mala Hesen, Çeko, û Qeretacîn, her sê birane.

Nihêrî ko xelkê Cizîrê li dora qesrê kom bûne, civiyane.

Hinek hilkişine ser xaniyane,

Qiz û jin ketine devê pencerane,

Ji ber ko cariyê zani bû adeta her sê birane.

Got : « Her hal, hinekan mêr kuştine, û xwe avêtine mala wane,

Yan jî, mesela revandina jinan e.

Ev her sê bira, mîna keliha li pola ne,

Di mala wan da diqede doza xwîna mêran û qalanê jinane. »

Zanîna vê meselê bû meraqek ji bo Rihane,

Got : « Ko ez herim, bêjime Zînê, wê bêje : « Tolê ! Ma te nika bû bipirsî ji kesane ? »

Na, wela, ezê niha bipirsim ji hinekane,

Ji bo ko xebera timam berim ji Zînê ra, heta ko cardin min neşîne van derane. »

Nihêrî ko xulamekî têye ji qesra wane,

Rihanê got : « Bira, ew çi xelk e li mala Hesen, Çeko, û Qeretacîn civiyane ?

Ma hinekan mêr kuştine ya dawake revandina jinan e ?»

Xulêm got : « Ne kuştina mêra, û ne jî doza revandina jinan e.

Mêvanek hatiye mala her sê Celaliyane,

Pê ra dibên Memê Alan, Padişahê Kurdane.

Heya me va mêvana ne dî, qet me nizanî bû ko Xwedê evqasa cemal dide mêrane.

Xwelî bi serê te be ! Tu jî dibê : « Xatûna min e çeleng e ; » li ber wî, nake du zoltane.

Li xwe kiriye cilên padişane,

Bi xwe ra heqbeyek kevirê cewher aniye, dikare pê bikire bajarê Cizîra Botane. »

Cariyê got : « Wey ko di mala bavê te keve arê Xwedê, bi heft ciyane !

Merî evqas dike vir ù derewane !

Te di kù ra anî vir padişahê Kurdane,

Navê wî lê kir Memê Alane ?

Va tiştê ko tu dibê, me ne bihîstiye bi guhane.

Ma ko padişah werin, wê li mala Mîr Ezîn bibin mêvane.

Çi îşê wan heye li mala eşqiyane ?

Çima li min dikî derewane ?

Bêje dîsa kuştina çend mèran e,

Ma ne ko carna ne mirine mèr ù egîtên me yèn Botane ?

Ji xwe kesek nika bike dawa ù doza wane. »

Xulam got : « Madam tu bawer nakî şorane,

Ez ù te va mîna xweyîng ù biran e,

Were, emê herin pişta dîwana mezin, pêşberî şibak ù pencerane.

Ezê xwar bim, tu hilkişe ser milê min. »

Carî ewqas e bi meraq bù, bi xùlêm ra çù pişta dîwanê, ber pencerane.

Xulam xwar bù, carî hilkişî ser milane.

Destê xwe avête keviyèn pencerê, xwe pê girt mîna pirçêmkane.

Bala xwe da nava civatê ko yek rùniştiye li ser doşegane,

Gotina xulêm ne zêde ye, belkî kèm e bi pir ciyane.

*
* *

Cemala mèran li ser jinan dike tesîr ù ecêbeke girane.

Gava çavê wê ket li Memê Alane,
Aqilê xwe wenda kir, lingê xwe li ser milê xulêm hildidane.
Xulam serekî çû mala xwe, işê saetekê û didiyane.
Paşê, vegerî û nihêrî ko hîn cariye maye bi keviyê pencerane.
Hate bin caxan, destê xwe avêt linganc,
Got : « De peya be, xweying, li vir, te em rûsar kirin bi barane ! »
Cariye peya bû, dit ko di lingan da tuneye cotê solane.
Li dor xwe nihêrî ko wenda bûne cotê elbane.
Pêxwas berê xwe da mal û vegerî bi ser Zînê da, kor û poşmane.

*
* *

Gava Zînê dît cariye hat, di lingan da tune cotê solane,
Pirsa elban lê kir, got : « Tilingê ! Ka ava Qestel, ya Kaniya Gulane ?
Tu va zirzop li min vegeriyaye, mîna dînan û bodelane.
Tu hîn ne geriye, va bûye meha şeşane,
Îro çûyîn kete dest, tu geriyayî li cem dost û yarane ! »
Cariyê got : « Eman, bano ! Tu iznê bide, ez ji te ra bikim du şorane,
Eger te qisûra min ef ne kir, dîsa her çiya dixwazî bike, li ser çavane ! »
Zînê got : « De, bêje, bike derewane,
Ji xwe, derew şûr û mertalê cariyan e.
Wê herin ji we ra bigerin û yan xerab bikin îşane,
Paşê, jî werin bi xatûnê xwe ra bikin vir û derewane. »

Herçiya hate serê, cariyê ji Zînê ra got, mîna hebê tezbiyane.

Bi ser da got ko : « Eger xelkê bihiştana, ezê li wê derê bimirama. »

Ji gotinê cariyê, Zînê fehm kiri bû hatina Memê Alane.

Gotinên cariyê rast in, ne bi derewan e.

Ji nih va, dilê wê rabû mîna behrane,

Pêlan xwe davêtin serî heya lingane.

Dîsa derd û kulan serî hildane,

Lê ne mîna berê, bê hêvî ye ji hatina Memê padişahê Kurdane.

Êdî Mem hatiye, gihaştiye bajarê wane.

Dixwest ko bi manekê bi der keve, here ser Kaniya Qestelê, ava Gulane.

*
* *

Zînê got : « De, tu rabe, ji min ra werîne çel û yek cariyane.

Bila li xwe deynin cilên reşayiyane,

Li xwe kin cilên eydî û şadiyane.

Bavên histiyê xwe zincîr û rîşiyên himêliyane,

Bidine pişta xwe helqe û çengelên navtengan ji zêrane.

Zû bilivin, mesekinin, berê nîv saetê, we dixwaziin li virane. »

Rihan reviya, direqisî li ser lingane.

Bi ken û listik, çû cem cariyane.

Got wan : « Gelê cariyan, mizgîna min li we giştikan e !

Banoya bi der ket ji qar û wehmane.

Dibê : « Bila li xwe kin cilên eydiyane. »

Hîn wekî din jî pir tişt gotin, lê min ji bîr kirin ji kêfane.

Hele, rabin, werine cem, çi emr e, çi ferman e. »

*
* *

Çel û yek carî rabûn, çûne mezela Zînê, sekinîn li ser lingane.

Gotin : « Bano, bêje, çi emr e, çi ferman e. »

Zînê got : « Carî Rihanê îro derewek kir, nakeve serê meriyane.

Ez dikim bi xwe dakevim kaniya Qestelê, bikevime pê van derewane.

Eger hineke din jî gotin hatiye padişahê bajarê Mixribiyane,

Ezê Rihanê ef kim, lê ko derew be, ez zanim ko bînime serê wê çi bêtarane.

Herin, ji min ra bicivînin qîzên began û axan û giregirane,

Bila nemînin, werine vir, îro şeş meh in ko derneketime ger û seyranane,

Dilê min heye ko herime ser kaniya Qestelê, û vexwim ji ava gulane,

Hinekî bigerim li ser mêrg û çayîrane. »

Çel û yek carî bela bûn li malên beg û axa û giregirane,

Ji bona derketina Zînê dikine tevdîrane.

*
* *

Em vegerin ser mêvanê Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane.

Xelkê Cizîrê li dora Memî kom bûne û civiyane.

Êdî, rihetiya Memî ne ma bû di destê wane.

Hesen û her du biran rê ne didîn ko bi mêvanê xwe ra bikin du sê şorane,

Dilê Memî jî, gelekî teng dibû ji çûyîn û hatina wane.

Li cem Hesen, kêm ne dibûn mêvanê malane.

Bi ro, ode diçelqî ji ticarane,

Bi şev, dor dihate mezinan û begane.

Bi nav ro, dihatin mîrza û pisaxane,

Mem di dilê xwe da digot : « Xwezî dev ji min berdana van xelkane,

Her kes biçûya mala xwe, ez bimama tevî her sê birane,

Yan jî, carekê, Hesen bihata tenişta min, û min jê ra vekiriya derê dilane,

Tema Zîn dotmama wan her siyan e,

Destgirtî û qelendayiya Çeko ya çend salan e.

Êdî, ka min bikujin, yan ji derd û kulên min ra bînin dermane.

Merî, ko îşê xwe nizanî be, tim û tim dikeve fikr û xulyane. »

*
* *

Hesen, Çeko û Qeretacin jî, hevûdin xelwe kirin ji mêvanane.

Gotin : « Sê roj in mêvanê me hatiye, îro dibiye roja çarane.

Me rê ne dî ko em jê bipirsin sebebê hatina wî ya van derane ;

Divê em gaziyê bikin, jê ra vekin pêşiya gotin û şorane.

Li rabûn û rûniştina wî, xweya ye ko merîkî mezin û xanedan e.

Heya em li dinê hebin, careke din, yekî mîna wî li me nabe mêvane.

Mêr li welatê xwe bi der nakevin, îla ji bo îşên girane.

Ko, eger mêvanê me bi çi hati be, lazim e em jê ra biqedînin bi çavane.

Ma dinya namîne ji bo kesane :

Mêr dimirin, kira wan dimîne tevî navê wane. »

Her sê biran bi hev ra li ser vê yekê tifaq kirin û qerar dane.

Her du bira hatin civatê, cem mêvanê xwe Memê Alane.

Hesen derbas bû, çû hêla malê, cem jina xwe Sitiyê, gotê : « Ji koşkê xwe odekê vala ke ji tiştane,

Lê raxîne xaliyê ecem û meqatane,

Şûşek dido bîna xweş bireşîne ser melıfûr û balgihane,

Mêvanê min, xweya ye, merîkî mezin û mêvanê ûde, giran e.

Li odê kêsa me tune, em pê ra bikin çend şorane,

Ez dikim bînime vir, hele ka derdê wî çi ye, gelo jê ra çi derman e. »

Hesen vegerî odê, Sitiyê mezelek raxist ji mehfûrane.

*
* *

Hesen hate odê, rûniştdi kêleka mêvanê xwe Memê Alane.

Gotê : « Kekê, te oda birayê xwe dît, ez dixwazim hewşekê te berim dairê xwîşka te Sitiyê, hêla jinane. »

Mem rabû ser xwe, kete pêşiya Hesen, çûne hêla heremê, wekî du birane.

Piştî ko rûniştin û hinekî nihêrîn ji çek û silehane,

Hesen berê xwe da Memî û vekir pêşiya şor û gotinane.

Got : « Bira, heqê mêvaniyê sê roj in, li cem me Kurdane.

Ji sê rojan bi şûn da, mêvan jî dibe xwediyê malane.

A te sê roj timam bûne, îro bûne çarane.

Heya niha, emê ji xelkê nika bû xwe bigihînin te, hele derdê te çi ye, yan çawan e.

A niha, me serê xwe daye ber hev, wek birane.

Ko gotina te çi ye, bêje, me rûyê xwe ne guhartiye li ber barê camêran tu carane.

Em ji Xwedê bi hêvî ne ko li pêş te rûsar neke me her sê birane. »

*
* *

Memê ko heya wê gavê digot : « Xwezî Hesen bihata tenişta min du deqîqane ! »

Niha jî, ew û Hesen rûniştî bûn di kêlek hev da, çog li ber çogane,

Serê xwe rakir ko ji Hesen ra veke derê derdan û kulane.

Ziman ne digerî û xwêdan bi eniyê diket ji şerm û fediyane.

Çend caran şor hate serê zimên, nika bû biderxe di nav lêvane.

Ker bû, deng jê ne hat, mîna kevirê ko bikeve biniya bîrane.

Hesen dît ko Mem nikaye derdê xwe bibê ji şermane,

Gotê : « Padîşahim, madam ko tu derê din ne bûyî mêvane,

Te halê me qebûl kir û hatî mala me her sê birane,

Em heya niha sisê bûn, ji îro û bi şûn da, dibin çarane.

Ez Hesen im, wergî dîn im,

Ji bona mêvanê xwe, kela li polad im, mîna qapiya tûncîn im.

Gava yek wekî te xwe li min digire, ez derbekê devê wî dilivînim,

Ko çi di dilê wî da heye bi der dixînim.

Madam tu li min bûyî mêvan, ezê serê xwe û her du biran di riya te da deynim.

Eger dawa te çi be, ro li nivro, li kêlekê hikûmeta Cizirê, berî saetekê biqedînim. »

*
* *

Memî got : « Bira, dilê min ji kul û keseran wergî tiji ye, wî bin jan e.

Li dilê min bi der tê arê heft firnane,

Li serê min diçe dû û dûmane.

Gava dixwazim kula dilê xwe bêjim, devê min tê girtin ji şermane.

Li pêş xwe dinihêrim, samê te wekî samê şêran e.

Ji bo vê, nikame raste rast biteqînim birîna xwe, bikim du şorane.

Tirsa min ev e, ko ez bêjim û ji derdê min nebe çare û dermane,

Hînga gotin têkeve devê xelkê Cizîra Botan, mezin û biçûkane,

Wê gavê, mirin tiştekî pir î çê ye, lê nakeve destê meriyane.

Hesen got : « Birao, eger tu dizanî dawa te diqede bi perane,

Tirsa min ew e ko xelkê me yê Cizîrê di vê da jî bi me ra kirine weke dijminane,

Belkî bi te ra goti bin : « Evana diz in, û li cem nayê dîtin navê perane. »

Di vî alî ve guh mede gotina tu kesane.

Ez birayê te Hesen im, wergi dîn im.

Eger dehwa te pere ne, ez niha rabim, xwe bi Çeko û Qeretacîn gihînim,

Zirxan li xwe kim û silehan bişidînim,

Di nav bajarê Cizîrê kevim, ticar pir in, lingê xwe li derê xezneyên wan xînim,

Deriyê xizneyên wan tev bişkênînim,

Qasî ko Bozê Rewan dikare hilde ji te ra zêran werînim.

Di heqbeya birayê xwe kim, li ser pişta hespê te bişidînim,

Pê kula dilê birayê xwe bi der xînim.

Na ko eger derdê te tişteki din e, dîsa bibê, ez îro di sibehê nagihînim. »

*
* *

Memî got : « Birawo, dilê min î liyan e.

Eger dehwa min pere bûna, min ne diterikand welatê dûr, bajarê Mixribiyane,

Min bi şûn da nedihişt diya pîr, bavê kal û her du kokimê apane,

Min pişta wan ne dida kevirê diwarane.

Ne xweş e ko merî li cem dostan ji bo peran bike lehfane,

Ez naxwazim ko ji brayê xwe ra bikim şora dewlemendi û perane,

Lê ji bona vê gotinê, ne hewceyî şahidan e.

Ji kerema xwe, carê dolapê veke, binihêre li heqiba Bozê Rewane,

Min di hatina xwe da dagirt ji kevirên cewher ko emsalê wan tune di tu xezînane.

Hema destê xwe avête her du bêrikane,

Tê da bi der xist du elmasên mîna hêkên di qazane,

Got : « Niha dikarim Cizîrê bikirim bi van her du kevirane.

Bira, ez reca dikim tu nenihêrî li qisûrane,

Min raberî te kirin ko yanî ev hatina min ne ji bona peran e. »

*
* *

Hesen got : « Ez Hesen im, ne î dîn im,

Min emrê xwe di mekteban da kevin kiriye, qelema xwe diweşînim,

Li cem min mêvan geleki bi rûmet in, şîxulê wan bi derengî naxînim.

Şorê min gişki dido ne, ev bûne du; ez nikarime dawiya gotina te bînim.

Min ji te ra sund xwar ko ezê dehwa te bi kurmancî û şûrê zorê biqedînim,

Ko tu bawer nakî, ezê himêliyê di histiyê xwe da bi der xînim,

Li pêş te hezar çarî destê xwe lê xînim,

Ko tu hîn bawer nakî, bila raketina cihê Sitiyê li min heram be, eger ez gotina padişahê xwe bi cih nebînim ! »

*
* *

Memî got : « Bira, dilê min î bi keser û jan e.

Derdê min î mezin e, û kula min giran e.

Ya ko hate serê min, şalê neyê serê tu kesane.

Eger ez niha çiroka xwe ji te ra bibêm bi gotinê, naqede du rojane.

Ev şuxulê xocan û qeleman e.

Riya çetin riya mêran û egîtan e.

Wexta ko brayê te ket bi vê kulê girane,

Bajarê Mixribiyan gişkî li ber min dan û li min ne dîn çare û dermane.

Ez siwar bûm li pişta Bozê Rewane.

Bira, ez ji mala xwe siwar bûm. A defter di bêrika min da ye, ji wê rojê heya ko bûme mêvanê te, ez dihesibînim riya şeş mehane.

Ne min hespê xwe dagerande ser kaniyekê, ne vexwar, ne jî kesî bi ser xist tûrê yêm û êmegê cotane.

Ji aliyê tî bûnê, qenaetê xwe kir bi kotina lîwanê, û kefa dorhêla lêvane.

Niha, di bin qonaxê we da girêdayî ye, qet nasekine li ser lingane.

Eger gişkî ji te ra bêjim, hîn dûr e, mîna çîrok û meselane.

Talî em li ser ya hazir şorê bikin, bi dûr nakevin ji gotinane,

Ez hatime, min xwe avêtiye bextê te û her du birane. »

*
* *

Hesen got : « Birao, mêvano, ez nizanim ez î biaqil im, yan î dîn im.

Ev bûne du saet tu şorê dikî, ez qet teştekî ji gotinên te dernayînim.

Eger tu zanî tirsa te ji hikûmetê Cizîrê ye, ezê niha rabim bajome daîreyan, ko çiqa ewraqê mehkûman hene, bicivînim,

Bidime ser hev, û agirekî berdime di bin da, bişewitînim,

Xelasiya te bi destê zorê û bi hikmê şûr bi der xînim.

Tu dikî ko ez niha bangê her du birayên xwe kim, zirxan girêdim û çapan bi hev xînim,

Têkevim nava bîst û pênc miheleyên bajarê Cizîrê bigerînim,

Ne, ez bi te ra dibêm, bi kêfa xwe be, ezê hîmê bajarê Cizîrê bihejînim,

Ji derdê te ra derman çar bikim, bînim.

*
* *

Bira, dilê min i bi keder û jan e.

Min bi te ra çi got ? Ji bîra meke wan şorane.

Em heya niha sê bira bûn, îro bi te va bûne çarane.

Ji bona derdê xwe mexwe tu xemane.

Biratiya min ne biratiya şivan e.

Gotinê min ne gotinê zarokan e.

Ez naxwazim kesî bixapînim bi şorane.

Ne jî adeta min e ko bikim lehf û gurane.

Biratiya min qewîn e, mîna çapê merbendane.

Hema tu niha derdê xwe bêje û ezê niha biqedînim, saetê nakim didiyane. »

*
* *

Memî got : « Bira, ez ne baqil im, ez î dîn im !

Ez ewqas dairê û qonaxê xwe dihêlînim,

Riya şeş mehan lingê hespê xwe li kevir û çeqmeqan dixînim,

Xwe bi zorê bi qonaxa we her sê biran û Cizîra Botan digihînim,

Tirsa min ew e ko kulê hundirê xwe bibêm û biteqînim,

Çilkekê didiyan li xwînê birevînim,

Pê dawê dostan leke bikim, bilewitînim,

Paşê, eger ez kelîşoyê Cizîra Botan gişkan li ser bicivînim,

Dîsa nika bim wê lekê paqij bikim, rûsariyê bi xwe da bînim.

Maniya vê yekê, stoyê birayê te î xwar e, nikame gotinan bi cih bînim.

Ez dikevim bextê te û biran û dawê we li destê xwe digerînim. »

*
* *

Hesen got : « Bira, dilê min î liyan e.

Te barek hilda pişta min ko Xwedê qet ne daye ser pişta tu kesane.

Ez ketime bextê te, bira, hele ji min re bêje, ka tu bawer dibî bi kîjan sondane.

Ji te ra sond dixwim bi sonda dinyayê ya mezin, bi her çar kitêbane,

Eger li vê bawer nabî, ez sond dixwim bi telaqê jinane.

Derdê te çi be, wê zû biqede, nagihê du rojane. »

*
* *

Memî got : « Hesen, birayê te ne î dîn e,

Yekî ko bixwaze barê min rake, wê bike û xwe zû bilezîne.

Ko merîkî xwe li kî derê hebe, wê niha bîne,

Li pêş çavê min zirxê dawidî lêke û çapanan li pisîrê xwe bi hev xîne.

Mihelek di vî bajarî da heye, ezê bi tiliyan raber wî kim, wê dorê jê bistîne... »

Mem heya vira hat, û di nişkê va gotin di devê xwe da girt û got : « Dîsa aqîlê min nabire ko barê min hilîne.

Malê barê min şewitiyo, giraniya wî mîna girên Cibûlê ye, kes nika li erdê hilîne.

Barê merî mîna min ê xerîb, bi tenê Xwedê bi rehm û kerema xwe hilîne. »

*
* *

Hesen got : « Ko barê meriyan bikeve, hînga merî dare derê deveciyane.

Rast tu hatî derê lokane.

Tu dizanî em sê biran e.

Em her sê jî lokên Mûsiliyan e.

Ez birayê mezin im, wextê ko barê yekî dikeve, yek doban xwe dixime bin çiyane.

Îro jî, rakirina barê te li ser milê me her sê biran e.

Em her gav barê xwe radikin ji girê Cibûlê bi pîvan û qapane.

Eger barê te çiqas î giran be, wê rabe ko hîn ro li taştiyan e.

Em saetê bi nav naxin, yek nabe didiyane. »

Mem hema ji erdê rabû bê hemdê xwe, him giriya, him jî destê Hesen ramîsane.

Gotê : « Ez ketime bextê te û birane.

Ez merîkî xerîb im, şor gişkî nayêne gotin, merî biaqil zane dawiya tiştane:

Tasek av ji kaniya Qestelê ji derd û kûlen min ra şifa û derman e. »

*
* *

Hesen got : « Ez Hesen im, meriyan diweşînim,

Ko çi di hundirê wan da hebe, çê û xerab, gişkî bi der dixînim.

De, min berde ko xwe bi Çeko û Qeretacîn gihînim,

Em her sê jî canè xwe di ber te da telef bikin û xwinè xwe birijînin.

Hewşekî berè, em dawiya mèvanê xwe xelas bikin, biqedînin. »

*
* *

Hesen bi der ket, çû cem birane.

Mem di cihè xwe da rûnişt, dikete raman û tefkîrane.

Di dilê xwe da digot : « Nizam, Hesen baş fehm kir kula dilane.

Min jè ra bi nav ne kir, tirsa min e ko tèkeve teşwişane.

Xwezî min jê ra bi nav bikira kula dilane,

Min bigota : « Ya ko ez bi çolan xistim dotmama we Zîna Zêdan e. »

Na ko wê derdê min derman nekin, qene ez dikuştim, difilitîm ji van kul û derdane. »

*
* *

Gava Hesen li cem Memî bi der ket, rast hate cem her du birane.

Got : « Birano, min derdè mèvanè xwe fehm kir, ji bo hevînekê welatê xwe berdaye, hatiye van derane.

Derdê wî ne malê dinè, bi peran e.

Tenê hez kirin û hevîna dilan e.

Werin, em ji derdê wî ra bibînin çare û dermane.

Birano, min jè ra sond xwariye bi her çar kitêban û telaqê jinane.

Ko derdê wî çi be, jê ra bibînim çarè û dermane.

Gotin bi der dikevin ji devê mêrane.

Werin, milê xwe bidine yê min, mîna gayê cot hevalê haletane,

Divê em bi rûyê spî li mala xwe bi rê kin padişahê Kurdane.

Bila şora birayê we nekeve bin lingane,
Bi me xweş nebe dilê dijminane.
Tim padişahê Kurdan nayê mala me, nabe mêvane.
Jirkî ko hatiye mala me Memê Alane,
Çi gava ez diçime çarşî û bazarane,
Ez dinbêrim ko li her derê dibe şora me her sê birane.
Ez bi çavê serê xwe dibînim, û dibihîsim bi van her du guhane,
Ew kesên ko ne hêjayî du pere û niva ne,
Dibên : « Bila ev xorta li dinê bibêje : « Min jî malek eciband, ez lê bûme mêvane. »
Hinek dibên : « Mem î xerîb e, riya xwe nizane.
Çavê merî xerîb mîna çavê kora ne.
Bi perda nezaniyê hatine girêdane.
Niha her sê bira wê biqedînin mesela padişahê Kurdane. »

*
* *

Hon ji xerezê van bikin, bilezînin,
Ez birayê we yê mezin im, li şûna bavê we me, şora min li erdê mexînin,
Bîst û pênc mihelê bajêr li me her sê biran par ve kin. Miheleyên ko silehê wan e xurt û peyayê wan e mêrxas in bi para min tenê xînin,
Ko eger hon hesabê hikûmeta Cizîrê dikin, we jî wek weqîkê li ser barê birayê xwe daçikînin.
Wekî din, emê xelkê bajêr siwar û peyan giştikan di bin şûrê xwe ra derbas kin, perda dilê wan biqetînin.
Keç û bûkan tev li cihekî kom bikin, yê ko ne kete emrê we, guliyên wan li destên xwe bigerînin,
Li pê xwe tar kin, di erdê ra bikişînin.

Hemiyan bînin di ber hêlê heremê, û di bin koşkê Sitiyê ra tof bi tof derbas bikin, di Memî va bixewînin,
Bila mêvanê me meraqê xwe di nav da nas bike, emê jê ra hilînin,
Îro yan emê meraqê dilê mêvanê xwe bi cameri biqedînin,
Yan jî emê navê xwe ji dinê hilînin. »

*
* *

Pişti van gotinan, Hesen şora xwe biri, kete ramanane,
Got : « Birano, meri xwe digire li malê mêrane,
Niha Mem ne yi li vir e, lê melekê wi li ser piyên meriyan e.
Ji qerezê dijminan, a niha dikim ji stiyê xwe bi der xînim qeytanê şûr û himêliyane.
Em pê sond bixwim, sewê ko paşê em lê nebînin çare û dermane.
Birano, mêvanê me raber min kir bi tiliyên destane,
Destê xwe dirêj kir ber ve kaniya Qestelê, ava Gulane,
Got : « Tasek av ji vê kaniyê ji min ra him şifa ye, him derman e. »
Ma meri nên dixwin, ne mîna dewaran e.
Mêr têne girêdan bi şorane,
Ne mîna heywanan, bi hefsar û merbendane.
Min fehm kir va meriki eşqi ye, dilketiya wi ji ji mihela me ye, di nefsa Cizîrê, ji mala me Celaliyan e.
Min got ko ezê dehwa te biqedînim, a bi vî şûrî û bi vê himêliyê be ko kul û derdê te, kul û derdê me Celaliyan e,
Ezê ko kî be, jê ra bînim, tewre mift û belaş e bê perane.

Wê dobê, Çeko destè xwe lèxist li şûr û himêliyane,

Got : « Ji hêla min va jî, eger hatina vî mèvanè me ji bo çi be, ezê bikim, madam bi dil û rayê we her du biran e.

Ko destê xwe deyne ser kîjan keçê, ko ew jî ji mala me Celaliyan e,

— Ma ez dikim şora Hesen bişkènînim ? — Ezê dilketiya wî bînim, ro li taştiyane. »

Wê carê, hate doba Qeretacîn, biçûkê her sê birane.

Destè xwe da ser şûr û himêliyane,

Got : « Birayê biçûk tim gole û xulamê hemî biran e.

Hezar carî bi vî şûrî û bi vè himêliyê ko, dehwa mèvanè me di bajarê Cizîrè çi be, ezê biqedînim bi dil û çavane.

Weleh, ez pir jè hez dikim, bê mèvanî jî ji min ra mîna biran e. »

*
* *

Hesen car din vegerî, got : « Şolê mèran ji bo sondè yê sisiyan e.

Bi vî şûrî û bi vè himêliyè be ko li ser bajarê Cizîrè giyane,

Şorê min wê biqede, û yek nabe didiyane.

Niha ko li ser mala min bi xwe be, û ko dilketiya wî Sitiya jina min be, ko diya zarokan e,

Heya niha, helala min bû û ji îro bi şûn da, ji min ra weke xwîşkan e.

Hon her du bira rûniştine, şehde bin, min bi kêfa dilê xwe da Mîrê Mixribiyane. »

Vê car, dob hate Çeko, rabû ser lingane,

Got : « Bi vî şûrî, bi vê himêliyè, ji hêla min va jî, hatina vî lawikî eger li ser çar koşeyê bajêr be jî, qediyane.

Na ko li ser malê me be, û nefsê me, her sê birane,
Eger hati be ji bo Zînê, qalandayiya min ya sê salane,
Xwediya biskê birewa û qeterên guliyane,
Heya niha, xwestika min bû, û ji niha bi şûn da, xweyînga min e ji dê û bavane.
Va gotina min, bi şehdeyê we her du birane.
Min jî hiba kir û da Mîrê Mixribiyane. »
Hate dora Qeretacîn, biçûkê birane,
Got : « Bi vî şûrî, bi vê himêliyê eger ne bi ser jin û destgirtiyê we be, yê mayî bispêrine min ko, çi be, li ser serê min, bi şehdiyê we her du birane. »

*
* *

Èdî, gotina wan bû yek ; ji bo qedandina îşê mêvên her siyan qerar dane.
Hesen got : « Birano, nabe ko em mêvanê xwe der bi der bigerînin li malane.
Ew jî fedî dikiye, rasterast ji me ra nabê ko kîjan e.
Ev îşa dibe di rojê eydî û dawetane,
Ko qîzên bajarê Cizîrê gişkî xwe dixemilînin, bi der tên ji qonaxane,
Koın dibin li cihekî û didiyane,
Hînga, em dikarin bi destê mêvanê xwe bigrin, berin temeşane,
Heta ko raber me ke dilketiya xwe, hele em binhêrin ka kîjan e.
Lazim e em îro gazî kin gewendane,
Bila defê lêxin li ber derê me, mîna rojên eyd û dawetane. »
Tacîn got : « Bira, ne hewceyî van tiştan hemiyane.

Min bihîst ko Zîn rihet bûye ji wê nexweşiya girane.
Îro xeber şandiye ji bo qîzên beg û axane,
Dike bi der keve ser kaniya Qestelê, ava Gulan, bike sêr û temeşane.
Ne hewceyî defa gewendan e,
Riya wan jî di ber mala me ra derbas dibe û dare şer ava Gulane.
Mem jî di koşkê Sitiyê da ye. Hon yek herin di paş piştê da bisekinin, mînê dizane,
Bila we nebîne, paşê nika di pencerê da binihêre ji şermane.
Hesen got : « Çeko, tu here jor. Mem di ber pencerê rûniştî ye, tu di pişt va rûne, li halê wî bike temeşane.
Gava derbas bûn qîzên beg û axane,
Binihêre hele dilketiya mêvanê me kîjan e ;
Raber min ke, ezê destê xwe bigerînin li guliyane,
Bînim, derbas kim zikê hewşê me, û hîn paşê, xeberê bidim xwediyane,
Ezê ji wan re bêjim ko keça we me anî ji bo Memê Alane ;
Eger dixwazin, bila qalanê xwe bigrin du qat, sê qat bi perane,
Yan ko wê nakin, bila serê xwe lêxin li teht û kûç û zinarane.
Hînga, emê destê xwe vemalin û birijînin xwîna mêrane,
Emê jê bistînin bi zorê şûrane. »

*
* *

Çeko çû daîra Sitiyê, nihêrî ko Mem rûniştiye di devê pencerane,
Li qonaxa Zînê dike sêr û temeşane,
Li ber derî civîne komê keçane.

Mem nizane ko Çeko li paş piştê sekiniye, qesabê mêrane.

Hesen hate cem Sitiyê, got : « Tu çiqas li hev hatî, çeleng û şêrîn î !

Çiqas cilên te hene, gişka li xwe kî, xwe bîxemilînî ;

Tu herî xwe li cem xweyînga xwe gihînî.

Min ji mêvanê xwe ra kir qerareke mêrane.

Ew hatiye mala me ji bo kuleke dilane,

Me tu cara mêvanê xwe bi rê ne kirine, ilam ko îş î bi dilê wan e.

Tu jî here têkeve nav koma qîzane.

Eger meraqa dilê wî li ser te be, ji îro bi şûn da, li te nanihêrim bi çavê jinane.

Êdî, tu ji min ra dibî mîna xweyîngane.

Sitî bi xulkê Hesen qenc dizane,

Ji tirsan, nika bû bike şor û gotinane

Reviya qonaxa Mîr Ezîn, û kete nav koma keçane.

Hesen zirxa dawidî girêdane,

Avête stiyê xwe qeytana şûrê girane,

Sekiniye li pêş qonaxê, li ser riya keçan hemiyane.

Guhdar e ko Çeko bêje : « Bira Hesen, Memî eciband va keça hane ! »

Da ko rahêle milan, derbasî hewşê ke û paşê xeberê bide xwediyane,

Yan razî bike bav û diya keçê, û çavê wan têr ke li zêr û perane,

Yan jî destê xwe bavê qevdê şûr û birijîne xwîna mêrane.

*
* *

Keçan li xwe kirine cilê eydî û dawetane.

Di serî da heya binê lingan, tev da keskesor xemiliyane.
Çare çar û pênce pênc bi destê hev girtin, rihet daketin devê sûk û çarşiyane.
Tof bi tof hatin, bi der pencera Memî ra derbas bûn, dimeşiyane.
Paşê, dihatin tala ko Hesen lê sekiniye, tevî çek û silehane.
Hesen mêreki navdar e, celatê peyan e.
Silehan li xwe nake bê rojê şerane.
Gava li xwe kir zilxê dawidî û avête sto qeytana şûrê girane,
Êdî, xweya ye ko wê rojê dike birijîne xwîna mêran û lawên bavane.
Gava keçan Hesen dît tevî silehane,
Bû tepetepa dilê wan, û bi guhên hev da dûr û dirêj pistiyane.
Digotin : « Gelo, dîsa di bajarê Cizîrê da, dike rabe çi tofane ?
Nizam dike bikuje tu mêrane,
Yan dike rabêle milê tu qîzane. »
Refê keçan derbas bû heta bi jinane.
Hesen wer di cihê xwe da sekinî bû, mîna kevirê hîmê diwarane.
Tu deng û hes lê nedihat û ne jî di cihê xwe da diliviyane.
Di dawiya hemiyan Sitî jî hat, derbas bû. Ji Zînê pê va, kes ne mane.

*
* *

Dema Zîn hate tala qonaxane,
Nihêrî ko kesek tune li wan derane,
Çîkî çarîka hêzarê li ser çavan hilda, û berê xwe da pencerane.

Çi dinhêre ko di pencerê da rûnîştiye yarê şevan, Memê Alane.

Şeş meh temam bû bûn ko dinalîne bi vê hesreta dilane.

Tu cara ne dihate bîrê ko Memî bibîne li bajarê Cizîra Botane.

Erê, ko çiqas cariyê goti bû jî, bawer ne dikir bi gotin û şorane.

Gava Mem li pêş xwe dît, di pencerane,

Êdî xwe ji bîr kir li ber jin û keçane.

Gûçên hêzarê di dest da filitîn, di cihê xwe da sekinî, berî li Memê Alane.

Nema dikarî bû lingê xwe bavêje, mîna nexweşa çend salane.

*
* *

Mem jî dinihêrî li refê jin û qîzane.

Di dawiya hemiyan ra, yek hate, sekinî li tala pencerane.

Çarîk rakir li ser çavane.

Serê xwe rakir, berê xwe da şibakane.

Mem çi dinihêre ? Ko li hember wî sekiniye Zîn, xwediya xewna şevane.

Bi carê eqil di serî da ne ma, wekî bodelane.

Tu ne ma ko xwe di pencerê da berde ser Zînê ; mîna teyrê ser destane,

Xwe berde nav refên kew û kevokane.

Zînê jî devê xwe vekir ko bi Memî ra bike çend şorane.

*
* *

Çeko ev tiştên han di paş Memî va giş didîn bi çavane.

Nema xîretê hişt ko xwe ragire, û hîn zêdetir bibîne ji her diyane.

Ji hikmê xiretê, ji bir kir ko bi Hesen ra sond xwariye bi himêliyane.

Hema çonga xwe da pişta Memî, dagirt, yanê ko merî hene li van derane.

Gava Memî li pişt xwe nihêrî, dît ko li paş sekiniye Çeko, mîna şêrane,

Dêmûrû sor bûn ji şerm û fediyane.

Bi şîn da vekişî li ber pencere û kulekane.

Vê car, di Zînê va bû xewane.

*
* *

Zînê di cî da fehm kir ko pismamê wê dît hemî tevgera wane.

Her du destên xwe dane ber devûrûyê xwe, got: « Mala min şewitî, ez bûme sebeba pir tiştane !

Di rû vê yekê da, wê birije xwîna mêrane.

Eve desgirtiyê min ê sê salane

Her tişt bi çavê xwe dît, ne hewceyî gotin û şahîdan e.

Çeko ne ew mêr e ko di xwe va derbas bike kêmî û bênamûsiyane.

Hîn îro stêrka min rijiya li ezmanane.

Ez bûme sebebê serê Memî û wê di dilê min da bimîne hesreta girane.

Hêzara xwe girte serê xwe, zû zû meşî û da gav-girane.

Di ber Hesen ra revî, û di pa ra xwe gihande qîzikane.

*
* *

Zîn jî hat, derbas bû û gihêşte hevalane.

Dîsa deng ji Çeko ne hat, ne got : « Bira, ya mêvanê me eciband eva han e. »

Li ser gotina ko bi Hesen ra kirî, lazim bû ko bigota : « Eva han e. »

Dema deng jê ne hat, Hesen jî kete fikr û ramane.

Got :« Her hal, Mem bi Sitiyê qaîl bûye, lewma Çeko gazî ne kir, ne got : « Bira, dilketiya mêvanê me eva han e ! »

Ez birayê mezin im, û Sitî helala min e. Devê Çeko nagere bi min ra bike van şorane.

Divê ez herim jê bipirsim ka kîjan e. »

Hîn Hesen dî vê ramanê da bû, dît ko dengê Çeko hat ji qatê didiyane.

Got: «Hesen, hele were vira, ji te ra bikim çend şorane.»

Hesen ber ve Çeko reviya, hat, go : « Bira zû bibê, dilketiya Memî kîjan e. »

Çeko got : « Bila rihet be dilê hemî kesan û bav û diyên qîzikane.

Dilê mêvanê me ketiye Zînê, destgirtî û qalandayiya min ya sê salane.

Em bi destê xwe ketine gola xwînê, ne ma jê bi der tên, carekê tê geriyane.

Ez li paş piştê wî hazir bûm gava Zîn derbas bû ; aqil wenda kir mîna bodelane.

Zîn sekinî îşê çend deqîqane.

Eger min çongê xwe neda qolincê, hişyar ne ba ji xuliyane.

Mina teyrekî çeng bi şerab û qanad zêrîn û xebxeb zer, di zinarekî bilind da, di hêlînane

Sê ro û sê şevan qet nexwe goştê seydê çolane,

Memî dikir xwe berde ser Zînê, here têkeve nava rê û kûçane. »

*
* *

Hesen di dilê xwe da digot : « Xwezî bila dilê Memî li Sitî ketiya û ne bi vî halî !

Çeko hîn î xort e, hîn ne bûye bîst salî.

Hesreta Zînê di dil da, jê ra ne bû jin û kevanî bi helalî.

Tirsa min e li vê yekê ye ko Zîn di biçûkî da ji Çeko hezdikiye û naxwaze ji kesî din ra bibe bermalî.

*
* *

Ez ketime pêşiya hez kirina van her du dilan û eşqiyane.

Belkî Çeko bi Zînê va li hev hez dikin mîna Leyl û Mecnûn ko bûne istêrik, çûne ezmanane.

Min jî derbekê bi mêvanê xwe ra got erê, lazim e were şûnê gotina mêrane. »

Vegerî ser Çeko, got : « Bira, dilê xwe meêşîne û mexwe tu xemane.

Carekê gotinek bû, bi der ket ji devê me her sê birane.

Heya îro, ji me ne hatiye bîna derewane.

Me tim qedandiye îşê mêvanane.

Emê Zînê bidin Memî, rûyê xwe bi der xin ji bin lingane.

Bira xelk nebêje ko evana gur in ji bo keçên xelkê, lê kirin derew gava dilê Mem ket dotmama wane.

Pişte ko me Mem bi rê kir û bû mirazê Mîrê Mixribiyane,

Ko tu destê xwe bidî ser kijan qîza beg û axan û mîrane,

Bila ez ne Hesen bim ko royê nekim didiyan û sisiyane,

Ji te ra bînim, têxim paş perdane. »

*
* *

Çeko got : « Hesen, bira, dilê min î liyan e.

Min digot : « Belkî meraqa dilê Memî li keçeke began yan axan e,

Emê bi destê zorê biqedînin û bi dilê xweş vegerînin li welatê Miẍribiyane. »

Min niza bû ko wê çavê xwe deyne ser destgirtî û qalandayiya min a sê salane.

Ez ketim bextê te, ji min mexwezî qedandina vê yekêye.

Pişti ko Zîn here, nema dikanim çavê xwe rakim û binihêrim li xelkêye...

Lê ko ez nedimê, rê nabe li sondêye.

Ya çê, ew e, em qenc bifikirin û jê ra bibînin çarekêye. »

*
* *

Çeko mîna merî ker û lal kete fikrane.

Difikirî, mîna kuriya derziyê bidî ber darê maẍan û stûnane,

Jê ra nika bû bibîne çare û dermane.

Li alîkî, ko bide Zînê, qalandayiya xwe ya sê salane,

Nika çavê xwe rake û binihêre ji kesane.

Eger bêje : « Ez nadim, » ji Hesen ra sond xwariye bi şûr û himeliyane,

Rûmeta wî namîne di nav birane.

Him jî ditirse ji Hesen, dijminê derewane.

Talî, razî ne bû bi dayîna Zînê, çavê xwe berda fen û losane.

Got : « Ya qenc, ew e ko ez li Hesen bikişînim şûrane.

Eger wî ez kuştim, bila Zînê bide Memê Alan, Mîrê Miẍribiyane,

Qene, çavê min nabîne tu tiştane.

Na, ko min Hesen kuşt, êdî Mem nema dikare bimîne lî hêviya sondane.

Wê rabe siwar be, here welatê xwe, bajarê Miẍribiyane.

Ez jî, wê gavê dikarim bêjim ko nesekinî Memê Alan, Padişahê Kurdane.

Eger ko ne çûya, minê pê dana destgirtiya xwe, qîza Mîrê Cizîra Botane. »

*
* *

Hesen sekinî bù li benda Çeko, û keti bû tefkîr ù ramanane.

Digot : « Xort e, dil dêşe li ber hesretane. »

Hew dît ko Çeko rabû ser lingane.

Ban kir, got : « Hesen, em tiştekî bibînin,

Salê derbekê, xerc û saylanê welatê Cizîrê, em distînin.

Em wan peran bi sê ciyan dicivînin,

Em banî yekî dikin û sê kevirê peşkê di destan da datînin ;

Ew dê her kevirekî bavêje ser komekê, em her kes bi para xwe razî dibin ù hiltînin.

Lê îsal, ezê her sê paran bigrim, û çavê we bi tiştekî naxînim.

Eger hon dengê xwe bikin, ezê we her diyan bi dora manqirekî bigerînim. »

*
* *

Hesen got : « Çeko, ko ez im, bi me mekenîne dostan û dijminane.

Tu dizanî, bajarê me, bajarê fesadan e.

Tê da tune merîkî bi namùs û lawekî bavane.

Wê destê xwe li hev xin, û werin temaşa şerane.

Hîn heya îro, bi me şa ne bûne. Were, bi gurê min ke, vê kêsê mede wane.

Paşê, dengê xwe pir bilind meke, bila neçe mêvanê min Memê Alane.

Ma ez dikim mêl çi bikim. Kesî bi xwe ra mêl nabe gorinane.

Hele, dengê xwe bibire, heya ji derdê mêvanê xwe ra bibînim çare û dermane. »

Çeko got : « Ez şorê mêl ji te ra dikim, tu tim şorê mêvên davêjî nava me birane.

Maniya ko tu birayê mezin î, tewr tu guh nadî ser şorê meriyane.

Salê derbekê, ez serê xwe ji betalî hiltînim,

Tu dikî ko ez destê xwe bavêjime şûrê Lahûr, bikişînim,

Serê te li cendek bifirînim,

Heya ko rûhê te ji canê te bikişînim. »

*
* *

Hesen nihêrî ko çi bike, nabe, û xelkê bi wan wê bikene, û li wan bike temaşane.

Got : « Law, Çeko, te aqil wenda kiriye, mina serserî û bodelane.

Nizam ko îro tu serxweş bûye, wekî pêxwas û ereqxwirane.

Yan aqilê xwe bide serê xwe, û yan jî niha wê serê te bikeve gihara hane ! »

Hesen dît ko ne bû tesîra van şorane,

Çeko maye li ser gotina xwe, weke înadane.

Ban kire Qeretacîn, biçûkê birane.

*
* *

Got : « Law, Tacîno, Tacînê zoro,

Xwediyê şûrê nêriz ê devzirav ê pişt bi moro,

Şanî te hene, ko te bajar gişkî anî emanê bi zora şûro.

Zûka were, van zilxan hilîne,
Li xwe ke, çapanan li ber pisîrê xwe girêde, li hev xîne.
Emrê ko didime te, bîne. Here xwe bi Çeko gihîne.
Şûrekî di serî ra veweşîne.
Serî jêke, temeriya mor bi xwînê bixemilîne.
Li ber min da bêxîne.
Ez Hesen im, qey mîna wî ne derewîn im.
Ezê vî destê xwe yê çepê li por û temeriya wî bigerînim.
Bi destê rastê xencêrê bikişînim.
Yekê û didiyan di ser dilê wî yê derewîn da lêxînim,
Pê kêmayiya hana li ser xwe hilînim,
Bila her kes bizane ko ez şora xwe bi cih tînim. »

*
* *

Tacîn şora Hesen ne kir didiyane.
Zilxa dawidî rakir ser milane,
Li ber pêsîrê bi hev dixîne çapanane.
Qeytana şûrê Lahûr avête stû û hat, sekinî li ser lingane.
Gotê : « Bira Hesen, serê min bi qurban e,
Bêje ji min ra emr û fermana te kijan e. »
Hesen çav di serî da sor bûne mîna çavên ejdiyane.
Sîng radibe û datê, mîna pêlê behrane.
Por lê gij bûye, mîna stiriyane.

*
* *

Memî dî ko îş xerab bû, wê ilam birije xwîna mêrane.
Çeko aqil di serî ne maye, mîna dînan dikiye gotin û şorane.
Meriyek ko li malekê bi hêvî ye naxwaze ko bigrine hev kulfetê wane.

Mem rabû destekî xwe avête destê Hesen, û bi destê din girt pisîra Çeko, biçûkê her du birane.

Got : « Birano, ez ketime bextê we her siyane,
Hon ji bona min mekin tu şerane,
Bila xelk bi we nekin temaşane.
Ez li we reca dikim ko hon vê şora min bi cih bînin,
Hon xelk û alemê bi tiştekî nehesînin.
Niha, yek herin xwe bi tewlê gihînin,
Bozê Rewan ji merbendan berdin, bifilitînin,
Bi destê min bigrin, û lingê min bi ser pişta wî heywanî bigerînin,
Berê min bidin welatê min û bi şûn da li bajarê Mixribiyan vegerînin,
Tek bila hon xwîna hevûdin nerijînin. »

*
* *

Çeko got : « Memo, bira, dilê min î liyan e.
Tê de agir dibe, li serê min diçe dûmane,
Hele tu bi ser min da berde van her du birane,
Em binhêrin kî ji me berx e, kî beran e.
Ew ji xwe ra dibêne : « Çeko bi tenê ye, bi me her diyan nikane. »
Ez Çeko me ! Ez ne î dîn im !
Mîna gurê çile, zik birçî û dev bi xwîn im.
Eger niha sed mêr bi ser min da werin, ez yekî dû ê din nagihînim.
Ko bajarê Cizîrê gişkî li pişt wan be, dîsa ez xema giştikan nakişînim. »

*
* *

Memî got : « Çeko, bira, gelek eyb e, tu meke van şorane,

Hesen birayê mezin e, li şûna bavan e.

Ji bo tiştên ne hêja, tu dihêlî dilê van her du birane.

Ne, min got, sebeb ez im. Ez niha dikim siwar bim, herim ji van derane. »

Çeko got : « Memo, ez ker bûme, guhê min nabihîsin tu şorane.

Eger di dilê te da jî heye, tu were tevî wane,

De bila weqiya te jî were ser lîtira wane.

Madam iş hat sekinî li van derane,

Ji qerezê Hesen ra , tewr ezê naqedînim tu îşane. »

*
* *

Hesen dît ko kêr hat , sekinî bi hestiyane.

Got : « Çeko, min digot, belkî ezê ji ya di dilê xwe de tiştekî bibînim,

Birayê xwe Memê Alan li ser adetê dînê bizewicînim,

Neyar û dijminan bi me nakenînim.

Madam te va şora kir, ezê ariyeke mezin bi serê te da bînim.

Ezê Qeretacîn ber ve kaniya Qestelê bi rê kim, bişînim,

Ezê bi xwe li vir bimînim...

No, ezê bi xwe herim, bi guliyê Zînê bigirim, di erdê ra bikişînim,

Bînim li vira, li pêş çavê te li Memî mehr kim, şora xwe bi cih bînim.

Ji bo vê yekê, eger xelk bi min ra kêm bibê, ezê wêya jî hilînim.

Ma tu min nas nakî, ez Hesen im. Salê derbekê, ez deqê xwe li deqê şahê Ecem dixînim.

Dewleteke mezin e, yan ew min radike, û yan ez wî dişkênînim.

Ez serê hespê xwe di nav giranî û mekareyê wî bi der naxînim.

Kesb û talanê xwe ji Şahê Ecem distînim.

Ma tu î bodele yî ko ez şora xwe bixwim, neqedînim? »

*
* *

Li ber gotinê Hesen, Çeko di cihê xwe da sekinî, û ne livî, mîna kevirane.

Destê wî maye li ser qevdê şûr û dinhêre li çavê her du birane.

Çav di serî da sor bûne, mîna perengane.

Firnik radibine û datêne ji qehrane.

Ser û çav lê quliptîne, mîna xwîniyane.

Ne deng jê têye, û ne jî dike tu hereketane.

Hesen nihêrî ko li Çeko nabe çare û dermane.

Çiqas biqare jî, birayê mezin ji bona ê biçûk mînanî bavan e.

Dikare him biqare, û him jî bike rihetiyane.

Got : « Çeko, were, em nekin mîna wehşiyan çolane.

Bi me ra dibêjin xelkê Botane.

Hat, li me bû mêvan Memê Alan, padişahê Kurdane,

Me her sê biran di dest hev da sond xwar bi şûr û himêliyane

Ko meraqa wî çi be, emê binin cih, bi destê zorê û hikmê şûrane.

Gava xewinî ko dilketiya wî Zîn, qalandayiya te ya sê salan e,

Te rabû, çêkir reziliyeke girane,

Şikand sonda xwe, û navê xwe kire deftera derewînane,

Di nav xelkê da, bi me va ne hişt ar û fedî, ava rûyane.

Te him xirab kir navê mêrane,
Him jî te xirab kir navê Kurdane.
Êdî nema, serê me tu cara ranabe li pêşberê kesane.
Wey sed xwezî bi mirina me her sê biran, û ne bi van kirinane. »

*
* *

Gotinê Hesen li Çeko pir tesîr kirin, û li kirên xwe bû poşmane.
Serî kete ber, mîna serê zarokane,
Şûr di dest da kete erdê, bi çavan da bû gurîna hêstirane.
Got : « Hesen, bira, tu qisûrê min bidî bin lingane.
Tu caran lê menihêrî bi çavane.
Birayê meriyan ê mezin li şûna dê û bavan e.
Min li pêş te kêmiyek mezin kir, bi van şor û gotinane.
Insan e, aqilê min ne li serê min bû, ez bû bûm weki bodelane.
Min him je xwe xeyidand mêvanê mezin Memê Alan, Padişahê Kurdane.
Tek vê carê min ef bikin, êdî ne ma tu caran dikim van tiştên hane. »

*
* *

Hesen got : « Canim, zihar ez jî peya me.
Xelk dizanin ko ez mezinê we her du bira me.
Nizanin ko her yek ji we bi serê xwe ye. Ez ne li benda tu tişta me.
Belkî carina, mêvan bi ser me da tên, ez jî li benda xizmetê mêvana me.

Herin, di nih va, mîna xwe bikin, ez ne ji wan bav û birayên ko têkevin nav niga me. »

*
* *

Çeko dît ko Hesen pir xeyidiye, û qet lê nabe çare û dermane.

Hema rabû, reviya ser dest û peyane.

Got : « Hesen, bira, ez ketime bextê te, û bi sonda mezin, û her çar kitêbane,

Ez ji wan kir û gotinê xwe bûme poşmane.

Tu vê derbê jî kêmaniya min bide bin lingane,

Berê te çito ji Memî ra tevdîr digerand, bila dîsa wer be, ez jî mîna te û Qeretacîn li ber barê wî me, bi çavane. »

Hesen got : « Çeko, şor û tevdîra ko min gerand ji bona Memê Alane,

Min dixwest Mem siwar kira li pişta Bozê Rewane,

Bişanda ser Kaniya Qestelê, ava gulane.

Bila here binihêre li qîzên Cizîra Botane.

Ko destê xwe dirêjî kijanê kir me rahista destan bi zora şûrane.

Bibira qonaxa xwe û bidana Memê Alane.

Hey, malşewitî ma bi te ra qet tune dil û wijdane ?

Mêvanê me hîn i biçûk e, mîna zariyan e,

Di welatê xwe da bi der ketiye ji bona xewneke şevane,

Text û tacê xwe giş di vê rê da berdane,

Hatiye îro li me her sê biran bûye mêvane,

Bi ser vê da, eger em dawa wî neqedînin, emê bi çi rûyî derkevine pêş kesane ?

Nema dikarin herin gûçê civatane. »

*
* *

Çeko got : « Bira, bes e, eger min kiriye hezar kêmî û xwîna mêrane,

Ez li kira xwe poşman bûm, kêmanî çêdibin ji biçûkan, û ef tê ji mezinane.

Şor û gotina me ya berê çi bû, dîsa wer be, bi soz û qewlê mêrane. »

Gava Hesen nihêrî ko Çeko ji kira xwe poşman bûye, ji dil û cane,

Di cihê xwe da rabû, çû rûniştî di kêleka Memê Alane,

Gotê : « Mêvano, serê min bi qûrbano, em bi hevûdîn ra bira ne.

Eger kêmiyeke min hebe jî, tuê bidî bin lingan û lê mêze nekî bi çavane. »

Bi destên xwe li serê Memî çêkir egala mewalî û şara Kesrewane.

Li ser Memî rakir cil û kiswetê padişane.

Memî got : « Bira Hesen, zehmet mexwe, çira li min dikî cilane ? »

Hesen got : «Her hal, niha xulqê te teng bûye ji şorane,

Him jî îro çend roj in di hundir da maye hespê te Bozê Rewane.

Kesek ne wêriye bi dorê keve, mina şêran deng pê dikeviye di merbendane.

Bê te, kes nika nêzîk bibe, li meriya dide mîna gamêş û wehşane.

Paşê. tu ne hatî mala me ko em te hepis kin di nav çar dîwarane.

Rabe, hinekî ji bo avdanê siwar be li Bozê Rewane,

Bi der keve ser kaniya Qestelê, ava gulane. »

Memî got : « Bira Hesen, ez merîkî xerîb im, serê min meke her karane.

Paşê, ezê nika bim herime pêş xelkê ji şermane.

Ez dinhêrim îro Kaniya Qestelê bûye cih û meskenê zerî û esmerane.

Keçên bajarê Cizîrê tev da li ser ava gulan civiyane.

Ez jî niha herim wê derê ji bona avdana Kuriyê Behrê Bozê Revane,

Eger yek bi min ra bêje : « Law, ji bo çi tu hatiye van derane ? »

Ezê bê his bikevim erdê ji şerm û fediyane. »

Hesen got : « Na, bila tewr wanî neyê xatirê te, şerm karê pirekan e.

Tu bi kêfa xwe be, siwar be li ser pişta Bozê Rewane,

Him av de ji ava Kaniya Qestelê, ava Gulane,

Him jî sereki ji xwe ra binhêre li keçên Cizîra Botane.

Hele binhêrim tu qaîl dibî bi resm û kêsima wane. »

*
* *

Hesen li Memî nihêrî, lêva xwe gezt û da nav diranane,

Çavê xwe qurç kirin û di bin simbêla va keniya bi îşaretane.

Got : « Memo, eger te ji hinan hez kir, destê te ji te ra ye, fedî ne karê mêran e.

Em her sê bira di pişt te da sekiniyane. »

Memî got : « Biran, ez dizanim, îro bajarê we bûye sê bendane.

Bendek ya mala Mîr Şem e, ko ticarên Cizîrê tev di dest wan da ne ;

Bendek ya Mîr Ezîn e, ko hakimê bajarê Cizîra Botan e;

Benda sisiyan, ya we, mala Sêvdîn, her sê biran e.

Ez naxwazim bi çûyîna xwe ya Kaniya Qestelê bibim sebebê tu fitnane.

Bila di rû min da nebe xişîna şûran û vixîna mêrane. »

Hesen got : « Bira, ez dinhêrim tu xelkê me dihesibînî wek wehşiyane.

Bi me ra dibên xelkê Cizîra Botane.
Ma te fehm kir ko em te dişînine pêşiya wan qîzikane?
Na, meraq meke, bira, ev ne wisan e. »
Memî got : « Lê te çawan got, û çawan e ?
Min gotina te fehm ne kir, qisûra min bide bin lingane.»
Hesen got : « Di qanûna xelkê Cizîra Botane,
Eger dewar û tariş û yan jî însan here nav erdê meriyane,
Merî dikare wî dewarî an însanî ji xwe ra bîne, û heqê kes tune ji meriyane.
Xwediyê wî tiştî li cem hikûmetê nikarin dehwê bikin li kesane.
Em niha dikin bi te din tapî û qoçanê Kaniya Qestelê, ko malê me her sê biran e.
Here bêje : « Ez merîkî ticar im, min Kaniya Qestelê kiriye ji her sê birane. »
Ne qîz deng dikin û ne jî işê peyan e. »
Memî got : « Bila be, gotina te li ser çavane. »

*
* *

Hema Hesen, çû, sandiq vekir, bi der xist tapiya Kaniya Qestelê, da Memî.
Her sê bira, tevî Memî daketin, li hewşê sekiniyane.
Hema Qeretacîn, biçûkê birane,
Nigê xwe rakir, û reviya tewla hespane.
Li qeyd û merbendan bi der xist Bozê Rewane.
Zîn û taxim lêkir, dişidîne tengane,
Hefsar kire serî, lîwan kire dêv û nav diranane.
Îro sê ro, sê şev in di tewlê da bi der neketiye Kuriyê Behrê, Bozê Rewane,
Hêç bûye, mîna lokê girgîn, radibe ser lingê paşîn, dinhêre li ezmanane.

Her du bira bezîne serê hêsp, yek digire bi dizginan, yê di bi rikêbane.

Mem siwar kirin, mîna padişane.

Mem fetiliya ser her sê birane,

Got : « Birano, nanê xwe li min helal kin, bi xatirê we her siyane !

Dibe ko veger car din nebe nesîb, ez neyème van derane.

Mebên : « Mem î bê nan û xwey bû, û xatir nexwest ji mêvandarane. »

Hema heywan rakire çargaviyane,

Derket ji kûçeyên Cizîrê, kete pê şopa keçikan, mîna nêçîrvanane.

Mîna teyrekî hûr ko xwe berde ser refê kevokane,

Di nava hezar û du sed qîzên beg û axan da, dibine Zîna Zêdane,

Di ci da nas kir di nav koma qizikan da mêvana xwe ya şevane.

*
* *

Memî bi dengekî bilind ban kir, got : « Lêlê ! Aviya, nemîne, ji navê aviya pir e bi avî,

Tu hêl û qeweta min û Bozê Rewan î

Û ronahiya her du çavan î

Bi bejna zirav û navkêlê qeşeng, tu ketiye pêşiya komê qizikan, darî ser Kaniya Qestelê, ser nihêtê wî delavî. »

*
* *

Dîsa, Memî got : « Mere, zerî esmerê mere !

Hele carê gûçê çarîkê rake, di bin da biskê birewa, morê cinîgê bike pere.

Zalim, bi tenê du şoran bi min ra bike, dîsa here ! »

*
* *

Qîzikan dit li pê wan tê dengekî hezîn û qîrîneke girane

Nihêrîn ko têye mêvanê Hesen, ewê ko dinê û alemê medhê wî didane.

Di heqê wî da tişt digotin mina çîrok û meselane.

Digotin : « Cil û kêsimê wî cil û kêsimê padişan e.

Ko merî dixwaze mîna wan bikire, nayên bi xezinane.

Bi xwe î biçûk e, lê cemala wî giran e. »

Roja ko Mem hatî Cizîrê, mala Celaliyane,

Şoreke wa keti bû nav zerî û esmerane,

Ko hatiye Padişahê Kurdan li welatê Mixribiyan, ji bo meraqeke dilane.

Li ser vê, hemî qizik li xwe ketine gumane.

Digotin : « Ya Rebî, şikir va bi xwe tê nav me, esmer û zeriyane. »

Di bin hêzaran da xwe hazir dikirin, mîna xwendiyên dawetane.

Bisk û perçemê xwe didan dûzane,

Guliyên mor çek dikirin derziyê qolincane,

*
* *

Giştik hatin li kêlek hev sekiniyane.

Mîna eskerê ko di resm û geçîdan da disekinin li pêş zabitane,

Qîzên Cizîrê jî wanî li pêş Mirê Mixribiyan sekiniyane.

Memî hespê xwe da ber zenguyane,

Heywan rabû xar û çargaviyane,

Hat sekinî li ser nihêtê Kaniya Qestelê, di nav koma qizikane.

*
* *

Memî got : « Esmer û zerîno, dilê min dêre,
Ro helat ji mala Xwedê, şewqê xwe da dinya gewrik, çarmedor û hawêre.
Ez nizanim va çi wext e, hema siba we bi xêr e. »

*
* *

Hema Mem nihêrî çerqîn kete kemberê zivîn yên keçane,
Bû şingîna bazînan û vizîna xilxalane.
Giştikan bi hev ra piştê destê xwe li erdê xistin, rakirin, li ser dil girêdane.
Gotin : « Silava te li ser serê me û her du çavane. »
Li ber çelengiya Memî li ser serên xwe avêtin mîratê hêzarane.
Giştikan hêzar avêtin ber kaniyê ser nihêtane,
Li ber kaniya Qestelê bû bêndera hêzarane.
Mîna ko merî here sûka qumaşane,
Ser kaniyê bû kurmauciya gewr, biskên qizan xweya bûn li ser rûyane.
Tev da li pêş Memî sekinin, gotin : « Bêje te çi emr e, çi ferman e. »
Memî bala xwe daye wan giştikane.
Dît ko Zînê bi tenê hêzar navêtiye û bi der ketiye ji nav qizane,
Pişta xwe daye Memî, û berî daye çolane.
Memî got : « Heywax ! Westa min gî li boşê çû, qene Zîn li min venagerîne silavane.
Di berê da heye gotineke mezinan û kalane,

Dibèjin : « Tu caran emel nabe bi jinane,
Dilê wan î mîna tayê kerengan e,
Ba kî derê bixwaze, wê da dibe bi rojane.
Hele ezê ban kim, binhêrim dike tu şorane. »

*
* *

Memî ban kir û got : « Lèlê ! Bi çavê min, ez Mem im, tu jî Zîn î !

Ez kurê Mîrê Mîxribiyan im, tu jî qîza Mîr Zengîn î.

Ez serdarê hezar û pênc sed xortê Kurdan im, tu jî xatûna çil û yek cariyê kember zêrîn î.

Ez xwediyê şûrê Lahûr im ; tu xwediya himêliya zêrîn a bi çin î.

Va bûne şeş meh tu serî li min û vî heywanî digerînî.

Tu pişta diya pîr û bavê kal tevî her dû kokimên apan didî diwaran, bi hesreta dîtina min dihelînî,

Tu wan gotinèn ko me di nav bera her du textan da kirî di bîra xwe nînî.

Tu çira silava min bi gûçê çavan hiltînî ?

Nizam ko tu bi welatê xwe ketî û jî lewre bi min ra nefsê dikişînî,

An nizam tu dixwazî min bi diz û celaliyèn Cizîra Botan dîtirsînî.

Çikî kerem ke, berê xwe vir da ke, ma tu min û vî heywanî qet nabînî ?

Tu vê hêzarê li ser çavèn reş û belek hinekî hilînî,

Ser û çavên gewr û şemşitî bi min binimînî.

Ev bû saetek, şorèn ko bi te ra dikime, tu yek bi yek li min vegerînî,

Ko tu ewqas jî nakî, bi du şoran dilê min ê kul bihewînî.

Weke hekîmên zana, tu devê birînên min bi nihêrîna çavan bişoyî û bi şoran bişidinî,
Tu bi hesreta wê şevê dikî ko tu hesretan di dilê min da nehêlî. »

*
* *

Zînê got : « Lolo ! Memo, ez bi heyrana wê bejna mîna tayê rihanê li qelem me,
Ko tê da tune tûk û gulmit. Ji derdê min ra xweş şifa û bi merhem e.
Her gav kedera dilê min e bi kul û bi elem e,
Seba xatirê te, ez çito ranakim serê lêvane.
Ema paşê bide, bajarê me yê Cizîrê binihêr, ko çiqas xelk hene, li me dikin temeşane.
Ebebozê bajarê me, karê wana dek û dibare ne,
Sibê heya êvarê, digerin, dibên : « Xwedêo, tu ji me ra bişînî şer û dehwiyane ! »
Dibên : « Xwedèo, lê niha, vî xortê xerîb ji qîzên me yên Cizîrê ra şorek bikira, yan peya bibe li cem wane ! »
Berî, giştikan xwe hazir kirine, destê wan li ser şûr û silehan e.
Hele, tu carê binhêre lî şûrê wan, giştik çar tiliyan ji kalan kêşane.
Ma çavê min rijiyane ko ez vê çarşefê li ser çavê xwe rakim li cem van qîzane ?
Welah, welah, ko ez çarşefê bilivînim li ser çavên xwe, bajar gişkê hilweşe van derane.
Wê me her diyan bavên ber devê şûrane.
Ma tu nizanî ko berê xelkê Cizîrê bûne sê bendane.
Wê li ser me bi hev kevin, mîna guran li erdê hildin laşê mêrane.

Xwîna mêran wê bimeşe li erdê, mîna çemane.

Wê li ser Kaniya Qestelê bibe şîngîna şûran û tasên mertalane.

Ez nekevime ber rûhê xwe û wê koma meriyane,

Lê xelkê bêje : « Heyfa Padişahê Kurdan, Memê Alane,

Ko li welatê Cizîrê çû bê pişt, di ruyê toleke jinane ! »

Tu li gore min ke, serê vî heywanî rihet vegerîne, here ber derê Hesen, Çeko û Qeretacîn, wane.

Ji Xwedê berjêr ewana wê ji derdê min û te ra bibînim dermane. »

*
* *

Memî got : Lêlê, Zînê, ez nizam ko tu bi min ra rast î an derewîn î.

Mîna kihêlên tewlan ên sor û zengû zêrîn î.

Arekî mezin ketiye hundirê min, û dûman li devê min diçe, ma tu nabînî ?

Tu nabê, ez carê berê xwe bidime Memî û bêjim : « Tu î dilbirîn î. »

Tu niha bixwazî, dikarî vî arê di dil û hinavê min da vemirînî.

Vê hêzarê li ser çavên reş û belek û eniya gewr hilînî ;

Ma tu kû da herî, tu dergistiya min î, her hal, tu nikanî vê gustîrê di tiliya xwe da bi der xînî.

Ko tu vê nekî, dikarî min li pêş hezar û du sed qîzê Cizîrê bigerînî,

Dinê û alemê bi mêvanê xwe yê şevan, Memê Alan û siwarê Bozê Rewan bikenînî.

Were, guh bide min, carê gucê hêzarê bilivînî,

Çaven reş û belek, eniya gewr di bin da ji bo xatirê min bi der xînî.

Werî ser kaniyê, tasa zîvîn di ber kemberê da bi der xînî,
Li ava Gulan tijî bikî, bînî, li ber pisîra Bozê Rewan bisekinînî,
Çavên xwe rakî, li çavên min binhêrî û tasê bi destê rastê hilînî.
Bi destê xwe avê bi ser min va kî û meraqa min xerîbî bi cih bînî ;
Pê vî arî di hundirê min da bi carekê vemirînî. »

*
* *

Zînê got : « Lolo, Memo, dilê min bi kulan û bi jan e.
Madam ko tu guh nadî ser şorê meriyane.
Di berê da, xelkê kêmani xistine derê me jinane,
Dibêjin : « Jin parsiya kêm in, dibin ser hev de û rûreşiya dê û bavane. »
Were, destê xwe bavêje destê min, û min çek ke ser pişta Bozê Rewane,
Berê xwe bide welatê xwe, Bajarê Mixribiyane,
Bila heywan me her diyan bere, bigihîne xwediyane.
Emê xelas bin, û bifilitin ji şor û gotinane.
Ne jî li ser me dimîne tirsa mêrane.
Ne jî ji bo me dirije xwîna tu kesane.
Wexta em çûne bajarê we, Mixribiyane,
Wê li nava xelkê welatê we bibe şor û gotin û dengiyane,
Şorê bigere di devê mezin û biçûkane.
Wê bêjin : « Dibêne, hatiye Memê Alane,
Bi xwe ra aniye tihfeke pak û hediyeke layiqî devê padişane.
Keçek aniye li welatê Cizîra Botane,
Dibên navê wê keçê Zîna Zêdan e. »

Wê were Beglî, birayê te yê canecane,

Li dora min kom bike temamî qîz û bûkên Bajarê Mixribiyane.

Gişkê bêjin : « Ha zewaca wan dibe, » û ji me ra bikin pir diane.

Wê bên : « Ko qeder bû, bila wa be, bûk û zava mibarek bin ji xwediyane ! »

*
* *

Memî got : « Zalim, li çêkirina bajarê we yê şêwitî û li van zikakan û ewcane,

Li van kaş û newalê di dorê da, li van çole çivan û meslewane !

Ko merî bû hevalê jinan, ber gav westê were ber dest û çavane.

Min ji te tiştekî biçûk xwest, te di niha da berê min da dawiya îş, nizam ko dikî min biceribînî bi derewane.

Min ji te ra digot : « Hele, gûçê hêzar û çarîkê hil de li ser eniya gewr û her du çavane,

Were, tasek av bi dest min de, belkî pê vemire arê di kezebê min da, tev hinavane. »

Gava Xwedê kire qeder, emê herin, tuê bibî bûk, û ez zavane. »

*
* *

Zînê got : « Memo, dilê min ji kulan bi keser û firqat e û wer liyan e.

Ya ko îro bi dest te da hatî serê min, bira neyê serê kesê gawir û misilmane !

Ne min got : « Em jin qismê parsiya xwar in, hergav dibin ser hevda serê peyane,

Serê xwediyê xwe berjêr dikin di nav xelkane,

Madam tu qebûl nakî şor û gotinane,
Ko tuè tim bibî sebeba serê me her diyane,
Tu were, ez bi te ra rûnim li ser Kaniya Qestelê, ava Gulane.
Tu jî peya be li ser pişta vî heywanî, û berde nav keskayî û mêrgane.
Were, ez û tu va çokèn xwe bidine ser hev, têr li hevûdin binhêrin, bila ev hesreta nemîne di dilê me her diyane.
Ez dibêm : « Belki va ji te ra çêtir e ji vexwarina tasek av ji ser destane. »

*
* *

Memî got : « Canemergê, dile min hewa ye,
Va bû saetek te di serê min da nehişt bi şoran û bendan, aqil û sewdaye.
Ev gotina ko tu dibè, em li cem hev rûnin, çongan bidine ser çongaye,
Ev tiştè han li tu deran ne layîq î mîr û padişa ye ! »

*
* *

Zînê got : « Min jî te ra çi goti bû ? Hele carê binhere li paş xwe, li bajarê Cizîra Botane !
Di nava bajèr da, giregir û axa ne mane,
Hemî rabûne ser banê qesr û qonaxan, rûniştine li ser kursiyane.
Tu niha dibè Kaniya Qestelè li bajêr pir e dûr e, kesek nabîne meriyane,
Herhal, niha dûrbîn dane ber çavane,
Dinhêrine li dorhêla Kaniya Qestelè û li vî êxliyê qîzikane.

Gava hinek me di vî halî da bibînin, li van derane,
Ji bona me her diyan şermeke giran e. »

*
* *

Memî got : « Ez Mem im, wergî dîn im,
Va şeş meh in bi pê vî işî ketim, text û tacê xwe dihêlînim,
Ma ez nizanim vî canê xwe derbeke din li welèt venagerînim.
Zînê, bila tu zanî bî ko Hesen, Çeko û Qeretacîn bi min ra bûne bira, êdî ez xemê li tu kesan nakişînim.
Tu dixwazî ko ez carê şûrê xwe ji kalên bikişînim.
Ez neketime xema mezin û giregirê Cizîrê, tirsa min ew e ko pê ra xwîna feqîr û fiqarê bê sûc birijînim.
Niha ko tu pir bi dilê min bidî, ezê werim, bi destê xwe vê hêzarê li çavê te hilînim,
Tasek av bi dest te dim û paşê li ser destê te hilînim,
Daxwaza xwe bi zorê ji te bistînim ! »

*
* *

Zînê got : « Memo, dilê min î liyan e.
Ne dihate xatirê min ko ji devê te bibihîsim van şoran û gotinane.
Ma tu dixwazî min bitirsînî bi şûrane ?
Ko tu niha destê xwe bavêjî qeterê guliyane,
Canê min bidî ber devê lahûrê girane,
Perçe perçe bikî, bavêjî ber lingê Bozê Rewane,
Dîsa tu nikarî hêzara min rakî li serûçavane,

Çima ko va yeka tune di qanûna welatê me Cizîra Botane. »

*
* *

Memî got : « Zînê tu min nas nakî ! Ez Mem im, wergî dîn im.

Mîna teyreki serdestan î çeng bi şerab î xebxeb zêr û per zêrîn im !

Ez ne tirk û ne tacik im, ez kurd canpola î serhişk i dilbirîn im !

Ez ne hatim ser Kaniya Qestelê nav koma keçikan, xelkê bi xwe bikenînim.

Hewqasa pere didim, milkiya Kaniya Qestelê ji her sê biran distînim,

Ev bûne sê roj dixebitim tapiyan bi hikmê peran bi der xînim.

A tapi vaye, min kirine bêrika xwe û têda digerînim.

Ez hatime ko her çar terefên Kaniya Qestelê tevî milkê wê bibînim.

Bi qanûna bajarê Cizîra Botan, hon çiqas qîzik tê da ne, madam hon bê izna min hatine nav vî milki, ez dikim cezaki mezin ji we hemiyan bistînim. »

*
* *

Paşê, Memî berê xwe bada ser koma qîzên Cizeriyane,

Got : « Keçino, metirsin, ez li we kesî naxwazim tu cezane.

Gava civatek bi axayê xwe ra dare bajaran û rûdine li qehwane,

Vexwarina qehwê li civatê ye, û pere dayîn para axayê wan e.

Hon jî iro bi Zînê ra hatine ser Kaniya Qestelê, ava Gulane,

Di ber we giştikan va, ewê bide cezaue. »

Mem dîsa vegerî ser Zînê û got : « Zînê, ez î baqil im, ez ne î dîn im !

Ezê niha destê xwe bavêjime qevdê şûrê Lahûr, bikişînim.

Lê ez naxwaxim şûrê xwe bi xwîna jinan bikim û biherimînim.

Ma tu nizanî ko ezê bi zor tasek av ji te bistînim ? »

Zînê dît ko bayê Memî bayekî şaş e, sewdake giran e,

Nikane jê ra bibîne çare û dermane.

Wextê ko Mem nih hati bû, goti bû : « Siba we bi xêr ! » Zînê di nih va silava wî vegerand, bi ser û çavane.

Li ser serê xwe hêzar rakir, tertîbê bajarane,

Bû mîna qaîdê eşîrê Kurdane.

Tasek av rakir, da ser kefê xwe yê destane,

Da dest Memî, Memî di dest da girt, vexwar ava gulane.

*
* *

Zînê got : « Memo, di ber ra, di ber ra !

Tu vê sibê mîna teyrê şahîn, xumaniyê girtî, ser bask û pera.

Tu ji welatê xwe, bajarê Mixribiyan bi der ketî, heya bajarê Cizîrê hatî li ser çavê eşqî û xatûna xwe ra. »

Hînga Memî lingê xwe bi der xist ji rikêbane,

Peya bû li ser Kaniya Qestelê. Mîna teyrê ko xwe berde ser koma kewane,

Kew gî bifirin, yeke bi tenê bimîne li şûna wane.

Memî jî Zîn girt û rûnişt li ser Kaniya Qestelê ava gulane.

Esmer û zeriyên Cizîrê kirine qirîn, giştik reviyane.

Di bajarê Cizîrê da diz û ebebozan nemane,

Dest avêtine ser qevdan ṣûrane,

Berê xwe dane Mem û Zînê ji bo kuṣtina wane.

Bi hev ra ber ve Kaniya Qestelê û ava Gulan direviyane.

*
* *

Em herine ser Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane.

Hesen berê xwe da her du birane.

Got : « Birano ! Me mêvanê xwe ṣande Kaniya Qestelê, ser ava Gulane,

Ji bona ko here nav koma qîzane,

Paṣê, çi dibe, çi nabe, serê wî dikeve tengiyane.

Va bi xweser ne çû, ilam bi dilxweşiya me her siyane.

Ko îro ji Memî ra gotinek xerab were kirin, ew bi mirina me giyane.

Rabin her du jî, li xwe kin zirxane,

Bavêjine sto qeytanên ṣûrê girane,

Siwar bin li ser piṣta hespane,

Berê xwe bidin ser riya Kaniya Qestelê, ava Gulane.

Meriyên fesad û nerind pir in di bajarê Cizîra Botane.

Ko yek lê merî tune, li meriyan dikin bêbextî û îftîrane.

Mem jî me ne ṣandiye kêf û sêranane,

Çûye ji bona Zînê, xatûna çil û yek cariyane.

Ne mikûn e ko îro di nava bajarê me da nebe govenda zarane.

Law, ko tiṣtek bi mêvanê min were, bi serê we her diyan e.

Gava hinekan tiliya xwe dirêjî Memî kir, hon jê ra jêkin destane.

Heqê kesî tune ko bike şorane.

Zîn dûşka min, qalandayiya Çeko û dotmama me her sê biran e.

Ji Memî ra jî bêjin: « Hesen ji te ra dişîne pir silavane,

Ko dilê xwe heye nesekine li isûl û adetên dinê, wek padişane,

Hema bila bi milê Zînê bigire û bavêje terkiya Bozê Rewane.

Werîne qonaxa me, êvarê emê bidin birîn nikaha we her diyane.

Na ko dixwazî îş bimeşînî li ser adetane,

Zînê berde, û bi me ra vegere malane.

Najo sê rojan, emê bikin daweta we her diyane. »

*
* *

Çeko û Qeretacîn berê xwe dane riya Kaniya Qestelê, ava Gulane.

Nihêrîn ko ji bajêr bi der dikeve koma ebebozane.

Giştikan berê xwe dane ava Gulane,

Destên xwe dane ser qevdên şûrane.

Çeko fehm kir ko vana darine ji bo kuştina Memî li ser gaziya qîzane.

Ban kir bi ser wan da dengekî didiyane,

Got : « Law, gelî dizan û ebebozan ! Ma çi îşê we heye li van derane ?

Ma bi stiyê we ketiye parastina namûsa me mîrekane ?

Ma qey bi me nabe, ko hon xwe didine şûna mêr û egitane ?

Law, ew qîza apê min e û qalandayiya min a sê salan e.

Yê din jî mêvanê me, Padişahê Kurdan e.
Hon bi çi dilî darine ji bo kuştina wane ?
Qey ko we ji bîr kiriye tirsa me Celaliyane ?
Hon nizanin ko serêşa Memî bi mirina we hemî diz û ebebozan e ?
Çima, gava tê disekine bi şerê eşîr û dewletane,
Hon tev da kes naxewînin li meydana mêrane ?
Gişkan direvin, xwe veşêrin paşiya kadinane ?
Îro hon gî bûne mêr ji bo kuştina yekî mêvane.
Eger kî ji we tiliya xwe dirêjî Memî ke, ezê jêkim her du destane. »
Diz û ebeboz di ciyê xwe da sekiniyane,
Bi hev ra digotin : « Ma ji me ra çi gerek e îşê namûsa mîrekane ?
Madam ew dixwazine, îşê me tune bi tu kar û şixilane.
Haydinê, em vegerin, hîn ko nebihîstiye Hesen, mezinê birane.
Merîkî zalim e, dilê wî neşewite bi tu kesane.
Paşê, wê were me bide ser devê şûrane. »
Giştik vegeriyan nava bajêr, bela bûn li qehwane.

*
* *

Çeko û Qeretacîn hatine ser Kaniya Qestelê, ava Gulane.
Nihêrîn ko Memî Zîn daye bin çengane,
Mîna teyrê ko seyda xwe digire û dide nava pencane,
Hêdî hêdî dide ber nîkul û dimkane.

Wî jî Zîn daye kêleka xwe û rûniştiye li ser nihêtane.

Rihet rihet pê ra dikiye şorane.

Tew xebera wî tune ji êrîşê dizan û ebebozane.

Tu dibê qey rûniştiye di qesra xwe da, li Bajarê Mixribiyane.

Tirs û kuşima wî tune ji kesane.

Çeko û Qeretacîn hatin nizîkî wane,

Qe ne bihîstin çeqareqa lingê hespane.

Serên xwe dane ber hev, û bi ser hev da dikine naz û henekane.

*
* *

Çeko ban kir, got : « Mêvano, dilê min î liyan e.

Tu hinekî dereng mayî li van derane.

Hesen got : « Mem hîn î xerîb e, belkî aciz bibe ji bîntengiyane.

Herine cem wî, ji aliyê min va jê ra bibin gelek silavane.

Dibêje : « Eger naxwaze qanûn û adetane,

Bila Zînê bigire, bavêje terkiya Bozê Rewane,

Bigire, bîne qonaxê me, ezê îşev bibirim mehr û nikahê wane. »

Na, ko dixwaze ez wî bizewicînim li ser isûl û adetê padişane,

Bila Zînê berde, vegere, were malane.

Bi izna Xwedê, ez nahêlim sê rojane,

Eger me nika bû Mîr Ezîn razî bikin bi malê dinê û perane,

Emê hinga dest bavêjin qevdê şûrane.

Dîsa ezê wê dawetê bikim, û ji kula dilê mêvanê xwe ra bibînim çare û dermane. »

Memî û Zînê li paş xwe nihêrîn, ko sekinîne her du bira, mîna du şêrane.

Ji fediyan dixwestin ko erd veqelişe, her du têkevin bin heft tebeqane.

Her du jî rabûne ser xwe, bi eybeke girane.

Mem rabû, siwar bû li ser pişta Bozê Rewane,

Berê xwe dane qonaxa Hesen Çeko û Qeretacîn, her sê birane.

*
* *

Hesen li mal bû, çav li riya vegera Memê Alan û her du birane.

Gava dit ko her sê bi hev ra vegeriyane,

Edî, jê ra şik ne ma ko çavê Memî li qalandayiya Çeko, Zîna Zêdan e.

Got: « Eger ez dernekevim pêrgîna Memî, wê bêje: « Zihar ko xeyidîne ji bo dilketiya min, qiza apê wane.

Ji bo vê yekê, Hesen dilê xwe li min teng kir, derneket pêş min û birane. »

Hesen rabû, bi der ket, hate pêş Memî û her du birane.

Wexta Memî dit bi ser da hatin her du birane,

Pir fedî kirî bû ji rûniştina xwe ya li cem Zînê, qalandayiya Çeko ya sê salane.

Deh caran di dilê xwe da goti bû: « Xwezî erd veqelişiya, ez têketama teweka heftane. »

Reng lê xerab bû bû mina bengzê miriyane.

Meriyan digot: « Belkî niha bi der xistine di bin siha gornane! »

*
* *

Hesen ber vê çû, got: « Birao, çira bengzê te qulibitiye mîna miriyane ?

Nizam, behna te teng bûye ji çûyîn û hatina diz û ebebozane.

Nizam ko tu aciz bûyî ji gotinê kesane.

Gelo hineke bê bav dilê te hiştine bi gotin û şorane,

Yan na, li canê te heye derbê şûrane ?»

Memî nihêrî ko her kesî fehm kiriye, ne hewceyî veşartinê ye ko bide paş, di dilê xwe da got: «Rastî karê mêran e!»

Got: « Bira Hesen, dilê min î liyan e.

Qulibtina bengzê min ne ji wan tiştan e.

Ne jî ji hatin û gotinê dizan û ebebozane,

Ne jî ji derbê şûr û riman e.

Îro fersendek hate min, û min di xwe va derbas kir û ez jê bûme poşmane.

Di dinê da du caran bext nabe hevalê meriyan û seyd nakeve tora meriyane.

Xwedê her yekî carê bext didê, gava ne layiq bin, jê distine, dide xeyrî wane.

Îro, ez çû bûm ser Kaniya Qestelê, ava Gulan, ji bo sêr û temeşane.

Ez hinekî sekinim li pêş koma qîzane,

Çi dihnêrim ko sekiniye Zîna Zêdan, sereka çelengane,

Min di xewnê da dîtî bû li bajarê Mixribiyane.

Min text û tacê xwe terikand ji bona xatirê wê meraqa dilane.

Îro bû bû mîna kewa ko têkeve nav pencê teyrekî nêçîrvanane,

Min ne avêt terkiya Kuriyê Behrê, Bozê Rewane.

Min berda, çû. Ez bi destê vala hatim, ez li vê yekê bûm poşmane.

Ditirsim ko car din, ev fersend nekeve dest min, û Zînê nebînim bi çavane.

Bê ditina wê, dinê li min heram e, mîna goştê berazane.

A eve sebebê qulibtina bengzê min, ko ez kirime mîna miriyane. »

*
* *

Hesen got : « Memo, birao, dilê min î liyan e.

Di vî alî va, mexwe tu xemane.

Ne jî ji vê kira xwe bibe poşmane.

Ev tiştekî hêsanî ye. Ne heveceyî qehr û xeyidiyan e.

Ya ko dilê te girtiye, jî mala me ye, ne ji xerîban e.

Zîn dotmama me her sê biran e.

Dûşka min e, xweyînga Sitî ye, ji dê û bavane.

Hero tê mala me, cem xweyînga xwe, dn sê carane.

Çi wextê bixwazî, ditina Zînê ji te ra ne çetin e, pir hêsan e. »

Destê xwe avête destê Memî, peya kir li ser pişta Bozê Rewane.

Tev hilkişiyan mezela jorîn, û jê datînin doşeg û balgihane.

Mem rûnişt dit nav bera her sê birane.

Ji xwe ra dikine şor û galigelane.

*
* *

Zîn jî vegerî li ser Kaniya Qestelê, ava Gulane.

Ew jî bi qasî Memî li wê kira xwe ya wê rojê bû poşmane.

Çû bû tevî hezar û du sed qizê giregir û began û axane.

Di vegerê da, li dora wê tu kes ne bû ji xeyrê çil û yek cariyane.

Zanî bû ko gişkî revîne û vegerîne ji mal û xwediyane.

Wê di heqê wê û Memî da bikin pir gotin û şorane.

Bi şun da li mal vegeri, tev çil û yek cariyan, bi eybeke pir e girane.

Wê ji dixwest erd veqelişiya û têketa bin heft tewekan, tevî wan cariyane.

Tek ne bihista navê xwe û Memî bi xerabî ketiye ser zarane.

Vegeriya, hate mal, rast çû koşkê xwe, serê xwe danî ser balgihane.

Êdî, mecala wê tune bû ko bi kesî ra bike tu şorane.

Carî qewitandin, canê xwe siparte xiyalane.

Digot: « Belkî ez dîsa xewnekê bibînim û xelas bim li van derane. »

Nema dixwest bibîne rûyê tu kesane.

*
* *

Şalê xwe şor û gotinê meriyan nexîne devê zirgûrt û êlekane.

Ne fedî dikin, û ne jî difikirin namûs û şerefa tu kesane.

Dixwazin ji xelkê bikin îftirane.

Ko yekê dibibisin, yan dibînin bi çavane,

Li ser zêde dikin bi sedan û hezarane.

Wexta ko bû bû qirîna qizikan û tev da reviyane,

Diz û ebebozan dest avêti bûn qevdê şûran, xwe da bûne ser riya Kaniya Qestelê, ava Gulane,

Her tiştek bihisti bun ji wan qîzikane.

Gava Çeko û Qeretacîn ew vegerandin, hatine nav bajêr û qehwane,

Wê gavê, gotin li hev zêde kirin, yek bi sedane.

Hin tişt digotin ko meriyan ji fediyan paç dikirin guhiyane.

Saetek ne çû di nava wan îşane,

Bêbavekî diz xeber da Bekoyê Şeytane,

Her tiştek jê ra digot, mîna hebên tizbiyane.

Belkî jî yek zêde dikir bi dehane.

Beko mîna şeytanekî mezin nava riyê xwe yê kose tev didane.

Ji xwe, berê hez ne dikir ji Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane,

Jê ra rê yebû ko bike şeytaniyane.

Mem jî hati bû, bû bû mêvanê wane.

Beko difikirî mîna şeytanane.

Dixwest rêkê bibîne, pê winda bike Memî û Celaliyane.

Ne wêri bû rasterast ji Mîr Ezîn ra bêje: « Mem û Zîn ji hev hez dikine, » Mem padişahê Mixribiyan e.

Digot: « Belkî Mir bawer neke, wê paşê bêje: « Tu li xweyînga min dikî îftîrane. »

Wê serê nin jêke, bavêje ber kûçikane. »

Heya serekî dirêj fekirî di van tiştane.

Paşê, berê xwe da diwana Mîrê Botane.

*
* *

Bekoyê Şeytan çû cem Mîr Ezîn, digot: « Mîro, dilê min liyan e !

Xwe biparêze li pismamê xwe, Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane.

Li serê te digerînine şor û tevdîrane.

Tu hildayî ser darê û di bin te da dikin bibirin guliyane.

Mêrine dilxwar û zikreş in. Beqalekî welatan hatiye, li mala wan bûye mêvane,

Jê ra dibêjin Memê Alan, Padişahê Kurdane.

Dibêne, yanî kurê Mîrê Mixribiyane.

Dikin te ji mîrîtî bi der xin, wî li şûna te bikin mîr û hakimê bajarê Cizîra Botane.

Ji mala we ra, ji bo rastiyê, min sond xwariye bi bav û kalane.

Gava min bihîst ev yeka hane,

Ez beziyam û hatime cem te û dibême ka te çi emr e û çi ferman e ? »

Gotina Bekoyê Şeytan di serê Mîr Ezîn pir kar kir, fikirî saetekê û didiyane.

Erê, car caran, serhişkî didîtin ji her sê Celaliyane.

Hele, di dehwiyên kuştina mêran û revandina qîz û jinane,

Pir caran, kes ne dihate cem mîr û îşê xelkê diqedîn li mala her sê birane.

Gava diqarîn, Mîr nedihesibandin bi tu tiştane.

Mîr jî dilteng dibû ji kira wane.

Paşê, dîsa aqilê xwe dida serê xwe, û digot : « Ew jî pismamên min in, heqê wan e. »

Carna jî ditirsî ko rojekê ji rojane,

Germ bibe serê wan her sê birane,

Werin wî bi der xin ji mîrîtiya bajarê Cizîra Botan û hakimiya wane.

Wexta Beko got : « Mêvanekî wan hatiye, navê wî Memê Alan, Padişahê Kurdan e, »

Wehma Mîr mezin bû li pêş çavane.

Piştî saetekê serê xwe hilda, bi der ket ji behra fikrane.

Got : « Beko, ji te û van şorane.

Eger va gotina rast be, ezê te hildim dereca mezin û rîspiyane.

Lê, ko derew be, ezê te bidim ber devê şûrane,

Canê te lete lete bikim û bavêjim ber kûçik û sane. »

*
* *

Beko got : « Mîrim, ma te dîtiye ko kes ji mîrê xwe ra bike derewane ?

Eve, salê min gîhane dora heftê û pêncane.

Hîn rojekê te li min ne dî bîna derewane. »

Rast jî, heya wê gavê, Mîr li Bekoyê Şeytan ne keti bû şikane.

Got : «Emê çer bikin? De, jê ra bibîne çare û dermane.»

Beko got : « Ko Mîr li hêviya min bihêle, pir î hêsan e.

Ev yeka îşê van destan e.

Bes tu guh bide min, eger min ne kir, tu min bişîne bin sêpiyane. »

Mîr got : « Çito ? Hele, bêje tevdîra te kîjan e.

Eger baş e, emê bi ya te bikin, wekî her carane.

Na, ko ne baş be, emê jê ra bibînin çare û dermane. »

Beko got : « Îro şerjê ke gelek pezane,

Xeberê bide xelkê bajarê Cizîra Botane,

Bêje : « Li mala min heye daweteke girane. »

Banê Hesen ke, tevî Çeko û Qeretacîn, her sê birane,

Bila bi xwe ra binîn dawetê mêvanê xwe Memê Alane.

Emê xeberê bidin zabitan û leşkerane.

Gava hatin, rûniştin li ser nane,

Ezê fermanekê bi navê Mîr binivîsînim, ko Ecem serî rakir, û têne ser bajarê me Cizîra Botane.

Herçî dest ço digirin ji çarde salî heya bi kalê şêst û pêncane,

Ne kor, ne kulek, ne xerîb û ne jî mîr, bila gişkî hilgirin silehane.

Bajêr berdin û bihêlin ji bo pîrekane.

Siwar siwar bin, ji îro da heyanî sibe bi van çaxane

Xwe bigihînin serê çiyane,

Li pê dijmin rawestin, şalê neyê, nekeve bajarê Cizîra Botane.

Irz û eyalê me nekeve ber lingane.»

Vê fermanê bixwîne ji bo wane.

Tu bêje: « Ne wexta sekinînê ye, yelah, kes mesekinin li van derane,

Giş bi der kevin serê çiyan û bikolin meterîs û tawiyane! »

Tu min deyne ser nan û erzaqane.

Ezê di nanê Memî kim axûya Silêmanî, ko nemîne du saetane,

Bimire, û kes bi sebebê mirina wî nizane.

Emê bi vî awayî xelas bin ji şirê wane. »

*
* *

Pirsa Beko kete serê Mîr Ezîn. Emir da xulmane,

Got: « Zû bin, herin bînin keriyek pez, wek gurane.

Bila dilê we neêşe li ser wane.

Serjê kin, îro li cem min heye daweteke girane. »

Rabû, kaxetek nivîsî ji bo Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane,

Got: « Îro li cem min heye dawet, bila werin, bixwin pariyek nane.

Bi xwe ra binin mêvanê xwe Memê Alane,
Îro çend roj in dibêne hatiye bajarê me Cizîra Botane,
Li her sê pismamên min bûye mêvane.
Me hîn ne diye va mêvanê xerîb, mîrê Mixribiyane.
Ez dixwazim ko were, li mala min jî bixwe pariyek nane. »
Kaxeta Mîr Ezîn giha destê Celaliyane.
Ji bona xatirê Zînê û mêvanê xwe yê xatir girane,
Kaxeta Mîr ramîsan û dane ser serên xwe û her du çavane.
Çima ko girêdan û berdana Zînê di destên Mîr Ezîn de ne.
Wan jî dixwest Memî bi wesîlekê bibin mala Mîr Ezîn, ji bo ko nasî têkeve navbera wane.
Gelekî di dilê xwe de şa bûn, ma çi zanin ko ev daweta han bi doxman e ?
Her sê biran berê xwe dane mala Mîr, tevî mêvanê xwe Memê Alane ;
Gava ketine derê diwana Mîr, Beko bi tiliyan şanî Mîr da Memê Alane,
Digot : « Mîro, binihêre yê ko li şûna te dike bibe mîrê Cizîra Botane. »
Ko çavê Mîr Ezîn li Memî ket û dît ko tertîb û cemala padişan e,
Erd di dorê da viz bû, mîna delemeyê zarokane.
Aqil di serî da qet ne mane,
Digot : « Beko, hîn niha min bawer kir. Va xorta i mîna padişan e.
Lazim e em nehêlin ko lingê wî li van deran bi ax bibe du rojane.
Ko xelkê Cizîrê wî bibînin, wê gişkî aşiqê bibin, tevî jin û mêrane.

Namûsa me wê bikeve ber lingane.

Zû here, ko tu çi dikî bike, tek rojê li vî meke didiyane. »

Beko li cem Mîr rabû û got: « Mîrim, gotina te li ser serê min û çavane. »

*
* *

Beko li civata Mîr rabû, bi der ket, berê xwe da cihekî xewle, rûnist nava du kevirane.

Li ser tertîba ko wî û Mîr Azîn gerandî, kaxezek nivisî bi derew û virane.

Moreke bi şima lêxist, weke fermanane,

Û li ser hespê xwe siwar bû, berê xwe da mala Mîr Ezîn, û hesp da ber zenguyane.

Hîn Mîr û civata wî, tevî Memê Alane.

Li ser sifrê rûniştî ne, ne qediya nane,

Beko bi der da hat, got: « Eman, Mîrim, zû be û emrê bide leşkerane.

Hinekî din jî bimînî, irz û eyalê me wê here li ber lingê hespên Ecemane ! »

Mîr Ezîn bi lez zerf vekir û di nav da hi der xist fermane.

Serîkî lê nihêrî, da ber çavane.

Paşê, rabû ser xwe, sekinî li ser lingane,

Berê xwe da civatê, tevî beg û axane.

Bi dengekî bilind bi wan ra dike şor û galegalane,

Digot: « Bila dengê min here hemî mêr û mêrxasên Kurdane !

Heçiyên xîreta milet dikişîne, divê bizane ko halê milet çawan e.

Ecem serî rakiriye, û têye ser welatê me, Cizîra Botane,

Têye şerê me bi leşkerekî girane.

Kurdan meterîs kolane,

Lê Kurdan nikarin di pêsiyê bisekinin, leşkerê Ecem pir e, bi lekan e.

Bi ser Kurdan da têye mîna pelên behrane.

Kurdan gazî li me xwestine. Ko em îro neherin, sibe wê bigihê ber derê me va şerê hane.

Ez ji we dixwazim, ji çarde salî heya bi şêst û pêncane,

Xwediyên hespan niha siwar bin li ser pişta hespane,

Berê xwe bidin ser sînorane,

Hinga sibê tê, doba çapik peyan e. »

Hema bi lez ji xulaman kir fermane,

Got : « Hespê min hazir kin, bidin ser zîn û taximane.»

*
* *

Hesen got : « Mîro, ez ketime bextê te, va mêvanê min hatiye qonaxa şeş mehane.

Gelikî westiye li ser riyane.

Ne heq e ko hon bi xwe ra bibine pêş dijmin mêvan û xerîbane ;

Him qanûn ranake, salê wî ne gihêştine dawiya çardane. »

Beko got : « Canim, Heseno, vê yekê bermede navbera me giyane :

Wextê ko mêvanê we ne hat, her kesê xwe ragire bi fen û derewane.

Ma çira mêvanê te li xwe datîne navê mîran û padişane ?

Ma qey karê mêran nîne teqandina silehane ?

Em dibihîsine ko mala wan maleke pak e, Mem bi xwe xwarziyê Şêxan e.

Belkî em bi xêra rûyê wî bişkênînin vî dijminê mezin û girane. »

Tema Hesen jî bi maniya Zînê nika bû li Mîr Ezîn bike recane,

Her kes siwar bû. Hesen, Çeko, Qeretacîn û bi Memî va jî ketin nava wane.

*
* *

Dema siwar bûnê, Mîr Ezîn çavên xwe qurç kirin li Bekoyê Şeytane.

Ko ew tiştê te got, axu ye, yan çi derman e,

Bi pêş me da here, çêke li wan derane. »

Beko siwar bû, bi xwe ra rakir heqîbek ardê genim û şişek axuya marane.

Di pêş siwaran giştikan da bi der ket, û berê xwe da çolane.

Memî jî di dilê xwe da digot : « Hîn nih hat firsenda dîtina Zîna Zêdane.

Xelk tev da ji bajêr bi der ketin, ne man tu kes bê jinane.

Niha kes tune di mala Mîr Ezîn, û di mala her sê birane.

Eger ez ne bi van siwaran ra bûma, esê minê bi Zînê ra bikira kêfeke girane. »

Bi der ket ji nav siwarane,

Hate tala Hesen, mezinê biran, qesabê mêrane.

Ajote kêlekê, heya gihêşte hev rikêbên zînane.

Serê xwe bi ser Hesen da xwar kir, û devê xwe xiste ber guhiyane.

Gotê : « Bira Hesen, dilê min î liyan e !

Ez dixwazim bi te ra bêjim du şorane.

Bila neyê bîra te ko gotina min ji tirsan e.

Mala me tucaran rûyên xwe ba ne dane li rûyê dijminane.

Navê tirsê li malbata me heram e, mîna goştê berêz li mêrê misilmane.

Îro ne xwe dibînime, nexweşî giran e.

Serê min bûye mîna berê aşane.

Pişt li min bûye kulingê demirciyane.

Hestiyê movika pişta min di hev da ketine, mîna maxê ser xirbane.

Pêşiya çavên min reş dibe, nabîne tu derane.

Ez nikarim xwe bigirim li ser pişta Bozê Rewane.

Ma ezê bi vî hesabî çawan herim şerê dijminan û Ecemane?

Şalê tu izna min bistînî ji Mîrê Botane. »

*
* *

Hesen bala xwe da rengê Memî, ko ne rengê nexweş û bêkêfan e.

Zanî bû ko Memî çav berdaye vegera Cizîrê bi fên û hîlane.

Him difikirî, û him jî di bin simbêlan va dikeniyane.

Gotê : « Memo, bira, ne ko ez ji te bawer nakim gotin û şorane,

Lê adeta me qebûl nake ko mêrê nexweş vegere li seferane,

Ilam ko direj be di nava darbestane.

Lê, şikir, tu î sax î, û li ser pişta Bozê Rewan e.

Ko niha ez bi Mîr ra bêjim, wê bêje ev nabe di qanûna Botane.

Lazim e yê ko li mal vegere birîn be bi birînê şûrane.

Bê vê, li vegera te nabe çare û dermane. »

*
* *

Memî dît ko gotina Hesen di cih da ye, bi der ket di nav siwarane.

Di kalên bi der xist lahûrê girane,

Di ser zenguyê ra avête lingane.

Lingê xwe birî û xwîna sor bi ser da dirijiyane.

Li Hesen vegerî, gotê : « Bira, vê carê gotina te çawan e ? »

Hesen dît ko hêlekê ling birîn bûye, birîneke girane.

Hema berê xwe da cem Mîr Ezîn, serleşkerê wan, Mîrê Botane.

Got : « Mîrim, min ji te ra goti bû ji bona mêvanê xwe Memê Alane.

Ko niha digere li rê û dirbê şerane.

Hîn ne bûye heftek ko hatiye ji Bajarê Mixribiyane ;

Canê wî î nazik e, nika xwe bide ber ger û westane.

Mezin bûye, weke padişan, di qesrane.

Mala te ava he, tu qebûl nakî reca meriyane,

Tu guh didî ser şora Bekoyê Şeytane.

De, binihêr, di ling da bibirîn bûye bi derbê şûrane ;

Xwîna sor dirije di zengû û rikêbane.

Qey vêcar jî tu jê ra nabînî manane. »

*
* *.

Mîr Ezîn fekirî di rengê Hesen, mezinê her sê birane,

Ko şor di dêv da bi der tên mîna kozê maziyê di tifikane.

Ko qebûl nake gotina Hesen, wê dîsa mêvanê xwe vegerîne Cizîra Botane,

Wê di nav wan keve sariyeke girane.

Na, ko bêje: « Bila here », êdî, nema maniya hatina vî leşkerê girane.

Serîkî wer ma di behra fikrane.

Got: « Ezê destûra Memî bidim. Heya em bigihên Bekoyê Şeytane,

Belkî bi awakî din ji vî îşî ra bibîne çare û dermane.

Çêtir e ko ez bêjim na, û li min bixeyide Hesen, mezinê Celaliyane. »

Mîr Ezîn serê xwe hilda, got: « Hesen bila tiştek neyê dilê te û birane.

Meqseda ko min berê got na, ji bona xatirê qanûna Cizîra Botan e.

Merî bibirîn dikare vegere li malane

Here bêje mêvanê xwe Memê Alane,

Ji bona vegera wî heye emr û fermane. »

*
* *

Hesen vegerî, hate cem Memê Alane,

Gotê « Bira, Mîr da te destûr û fermane.

Tu dikarî vegerî, herî malane. »

Memî vegerand berê Bozê Rewane,

Berî da Bajarê Cizîrê, û heywan da ber zenguyane.

Hat, peya bû li mala her sê birane,

Nihêrî ko bi navê mêran kes tune li wan derane.

Got: « Heya ez hebim, fersendeke wanî nabînim tu carane.

Ezê berê xwe bidim koşkê Zînê, yataxa derd û kulane.

Xwedê carê ez dame, min carê jî bere, mirin nabe dû carane.

Hele ez herim binihêrim çi hate serê Zînê xatûna çil û yek cariyane.

Ka ji gava vegerî li ser ava Gulane,

Haya birê wê Mîr Ezîn bûye li van tiştane ? »

Hema pihêt girêda Bozê Rewane,

Berê xwe da mala Mîr Ezîn, koşkê Zînê, hêla jinane.

*
* *

Wexta Zîn vegerî bû li ser Kaniya Qestelê ava Gulane,

Kete mezela xwe û derî li ser xwe pihêt dadane.

Nema ji fediyan dikari bû binihêre ji rûyê tu kesane.

Heya digihê cariyên berdestane.

Ji xwe ra digot : « Eger Mîr bibihîse vê rezîliya hane,

Êdî ji min ra li dinê mayîn tune du saetane. »

Gava ko bihîst Mîr Ezîn berê xwe daye sefera girane,

Hinekî behna wê bi der ket, û derî vekirin li ser cariyane.

Rûnişti bû di devê şibak û pencerane,

Ji bona çûyina Memî keti bû fikrane.

Bi xwe ra digot : « Mîr çûye şerê Ecem, venagere, seş mehane.

Qene, xwazî Mem bi xwe ra ne bira, bihîşta li van derane !

Wê pê bi der keta sebra dilane. »

Rûnistina xwe û Memî ya berî dû rojan dihate ber çavane.

Hîn Zînê di vê da bû, nihêrî ko li pişt têye xirtexirta lingane.

Wê got: « Belkî pêjna cariyan e. »

Berê xwe bada, ko kî ji wan e.

Hew dît ko kete hundir Memê Alan, Padişahê Kurdane.

Hema Zînê da xwe, rabû ser lingane.

Êdî ji bîr kir tirs û fediya berî du rojane.

Got: « Wey, tu bi xer û selamet hatî, li ser serî û her du çavane ! »

Memî rahişte destê Zînê, got: « De rûne, xatûn, ez heyranî van çavan e.

Ji bona ko bigihême te, min destê xwe avête qulpê derewane,

Li stoyê xwe danî kirasê tirsokane.

Lingê xwe da ber devê şurane, »

Hema Zîn rabû ser xwe. Mîna hekîmane,

Zû anîn paç û dermane.

Birîna Memî kewand, bi tirşê simaqê derman kir û dipêçane.

Bi hev ra digotin: « Mîr venagere heya pênc û şeş mehane.

Heya wê çaxê, kerem ji Xwedê ye, ev e dermanê derdê aşiqane. »

Di kêlekê hev da rûniştin, dikine şor û mesqerane.

Çongê xwe dane ser hev, hûrik dikine gilî û gazindane.

*
* *

Em herine dora sefera Mîr Ezîn û Bekoyê Şeytane.

Beko çêdikir û hazir dikir nanê wane.

Kire nav nanê Memî axuya marane.

Dema Mîr Ezîn tevî siwaran hat, Beko nihêrî li gştikane,

Dît ko tune Memê Alane.
Ma bû di fikir û ecêba girane.
Revî, çû, xwe gihande Mîrê Botane.
Gotê : « Mîro, kanî Memê Alane ? »
Mîr go : « Beko, qet meke tu şorane,
Îşek li min qewimî, ez tî mam di navbera du çemane.
Pişti ko tu veqetî ji me û bi der ketî ji nava siwarane,
Şûrê Memî li ber şemitî, û rastî hêtê hat, û pê ra bû birîneke girane.
Hate cem min Hesen, mezinê birane,
Got : « Bibirîn bûye mêvanê min Memê Alane.»
Di rengê wî min zanî ko her sê biran jî pir qehiriyane.
Êdî, ji tirsa wan, min nika bû bikim tu gotinane.
Min nexwest ko di nava me da bibe şer û rê têkeve şorane.
Wan got : « Bila Mem vegere bajêr, û birîna xwe bike dermane. »
Ji bona ko kes li me neke tu şikane,
Min got : « Bila here, û reca te Hesen, li ser serî û her du çavane. »
Mem vegerî bajêr, qonaxa her sê birane, »
Beko got : « Mîrim, ma gotina me li kû ma ? Ma tu em bi rastî darîne şerane ?
Ma ne va tevdîrek bû, me gerand ji bo kuştina Memê Alane ?
Ko Mem vegerî bi şûn da, ji bo çi em berê van siwaran didine çolane ? »
Paşê got : « Mîrim, hon hêdî hêdî werin, ezê bi pêş we da herim çend saetane.
Emrekî binivîsînim, û bînim, û bêjim ; « Va emra qolordiya Kurdan e,

Ko şer ne ma, û rihetî heye heyanî sè mehane. »

Bè vê yekè, gava em vegerin, Hesen, Çeko û Qeretacin li me bikin kuşimane. »

*
* *

Mîr qebûl kir tevdira Bekoyê Şeytane,

Beko hespê xwe rakir çargaviyane,

Çend gir û feyd kirine nava xwe û siwarane.

Li ser pişta hespî tavilî emrek nivîsî û li bin xist mora qolordiyane,

Ko şerè Ecem sekinî heya sè mehane.

Herçiyê seferè, bila vegerin, herine malane.

Emir xiste paşila xwe û bi lez û bez vegeri, hate nav siwarane.

Ew emra bi der xist di paşila xwe da û da dest Mîr Ezin li pêş wane.

Got: «Mizgina mîn li we, min ji we ra anî izna rihetiya sè mehane.

Bila her kes vegere mal, li xwediyane. »

Mîr Ezîn ferman vekir, û xwend di nav wan siwarane.

Got: « Gotina Beko rast e, şer sekinî û ji me ra hat rihetiya sè mehane.

Di bin fermanè da heye mora qolordiya Kurdane.

De, gişkî vegerin mal, li xwediyane. »

Her kesî berè xwe bada ber ve bajarê Cizîra Botan û gundane.

*
* *

Bekoyê Şeytan xwe da kêleka Mîr Ezîn, di pêşiya siwarane.

Difikiriye ka wê çi tevdirê bigerîne li serê Memê Alane.
Hesen, Çeko û Qeretacîn mane li dawiya siwarane.
Hêdî hêdî bi hev ra ketine şorane.
Şora xwe anîne ser mêvanê xwe yê mezin, Memê Alane.
Digotin : « Emê çawa li derdê wî bibînin dermane ? »
Hesen got : « Gelî biran, dilê min î liyan e !
Ez ne î rihet im ji hêla Memê Alane.
Ez exlaqê wî nas dikim, wekî me her sê biran, ko yek bi yê dîn dizane.
Merîkî eşqî ye, dilê wî bûye mîna yê zarokane.
Merîkî çê ye, li dinê nakeve dil wî tirsa tu kesane.
Nizane ji kesî bike hesab û kuşimane.
Gava vegeriya Cizîrê, her hal, ew ne çû mala me her sê birane.
Niha ew dibê : « Wana çûn seferekê mezin û dirêj û girane.
Di hêla jêrîn va, venagerin şeş mehane. »
Her hal, niha, ew çûye mala Mîr Ezîn, koşkê Zînê, ketiye mihebeta dilâne.
Mîr Ezîn û Beko wê bi ser da bigirin her diyane.
Hînga wê di nava me û Mîr Ezîn da bibe şereki girane.
Ewqas xelkê di ser de herîn ko êdî kes nika li gihare bikişîne meyîtane.
Bajarê Cizîrê wê here di ber lingane.
Eger ez niha yekî pês da bişînim, tirsa min ew e ko Beko bike tu şorane,
Ko Mîr li gotinê wî bike kuşkuşane.
Dîsa lê bi der keve fesadiyeke girane.
Werin, hon her du bi hev ra bikin qerezane.
Her yek ji we bêjin : « Hespê min î beza ye. » Bigirine hev û li hev bikişînin şûrane.
Ezê werim xwe bavêjim nav bera we her diyane

Hinga, ezê yekî bişînim ko kes neke şikane. »

Hesen ji wan veqetî, û çû kêleka Mîr Ezîn, û bi hev ra meşiyane.

*
* *

Çeko got: « Hespê min pir î beza ye, merî dikare pê bigire xezalane.

Tu hespê mîna wî neketine destê kesane.

Ez dikarim bêjim ko hespên wanî peyda nabin di tewlên padişane »

Qeretacîn got: « Bişewite mala virane!

Hespê te ne hêjayî du golikan e!

Min pir bergirê wanî dîtine li mezata Bajarê Cizîra Botane.

Çeko qehiriya, destê xwe avête qevda şûr; û hespê xwe da nav zenguyane.

Got: «Law, Tacîn, te bi min ra got ko tu dikî derewane.

Ma tu nizanî ko ez jêdikim serê meriyane? »

Qeretacîn sekinî li pêş Çeko, mîna çêliyê şêrane.

Got: « Law, Çeko, ma dilê te heye ko min birevînî bi tirsane?

Tu li min dikişîniye şûrane?

Tu min dihesibînî bi ebebozên bajarê Cizîra Botane! »

Wî jî dest avête qevdê şûrê girane.

Hesen dît ko siwar li hev ketin, bûne du şopane.

Di nava wan da têye bûrîna Çeko û Qeretacîn, mîna dû şêrane.

Hema hesp ajot, çû, kete nava wane.

Got: « Law, madam şerê we li ser hespan e,

Yek birevin û yê din li pê din, heya bajarê Cizîra Botane.

Eve Mîr Ezîn li we dinihêre, tevî van siwarane,
Wê bixewîne hespê beza kîjan e. »

*
* *

Beko her tişt fehm kirî bû, mîna şeytanane.
Got : « Her hal, va hîleke di nava Celaliyan e.
Wana Mem ji destê me xelas kirin bi fên û fûtane,
Şandine cem Zînê ko pê ra bajo kêf û mihebeta dilane.
Niha jî, gava dîtin em diçin malane,
Bi vî awayî dikin herin xeberê bidine Memê Alane. »
Berê xwe da Hesen, mezinê birane.
Got : « Hesen, ma lisk bi tenê ya van her du biran e ?
Ma şikîr, sê meh rihetî hatin ji bona me giştikane.
Em tev da bi selametî vedigerine mal ji xwediyane.
Her kes ji me dixwaze zû here mala xwe nav zariyane.
Niha, çavê kulfetê me giştikan li riyan e.
Bila gî hespê xwe bajon û berê xwe bidine Cizîra Botane ! »

*
* *

Mîr Ezîn zanî bû ko di gotina Beko da tiştek heye, ne bi derewan e.
Rê ne da ko Hesen bike tu gotinane.
Got : « Gotina Beko rast e. Siwarino, zû hespa bidin nav zenguyane. »
Hema bi xwe, hesp rakir çargavî, tevî Bekoyê Şeytane.

Dema siwaran dît mîr çû, tev da li pê bûne rez, mîna refê qulingane.

Beko digot: « Hîn niha hespê ji hev bi der kevin, wê xweya be kihêl kijan e. »

Bû bû qîreqîra siwaran li ser pişta kihêl û nijdiyane.

Mîr Ezîn û Beko keti bûn pêş giyane.

Siwarên bergîran di par ra dimane.

Pêşî û paşiya siwaran ji hev ne dibûn xweyan bi çavane.

Heya di wan va xewinî Cizîra Botane.

*
* *

Gava Beko ev hila han kir li Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane,

Êdî nema dikarî bûn ji bo Memî û Zînê bibînin tu çarane.

Ew jî hatin di nava siwarane.

Çiqasî zor dane heywanên hespane,

Nika bûn berî Mîr Ezîn û Beko xwe bigihînin bajêr û qonaxane.

Berî giştikan, Mîr Ezîn û Beko hatin, peya bûn li Birca Belek, li ber deriyê malê, hêla jinane.

Beko bi lez û bez hesp girêdane.

Tevî Mîr Ezîn hilkişiyan qatê didiyane.

Beko got: « Mîrê min, te berê xwe da bû sefereke pir e mezin û girane.

Xwişka te Zîn, niha ma bû di meraqane.

Lazim e tu berê herî koşka wê û rûnî çend deqîqane.

Ji berê nexweş bû, bîntengî kete ser bîntengiyane.

Eger bibîne tu çûyî koşka wê ji bona pirsîna dil û xatirane,

Kêfa wê pir e xweş bibe, wê zûka rihet bibe ji nexweşiyane. »

Bi destê Mîr girt, berê xwe dane hêla Zînê, cihê her du aşiqane.

*
* *

Ji gava Mem giha bû cem Zînê, rûniştì bû, çong da bû ser çongane,

Devê xwe da bû ber guhiyane.

Û bi hev ra keti bûn sihbeteke pir e girane.

Eger bajar bi ser hev da bihata, dengê tu tiştî ne dihate wane.

Memî hew dît ko dengê lingê peyan li ber derê Zînê hat, û sihna peyan jê re bû xewane.

Hema Zîn xiste bin dawê kurkê bi çî, û hewrane.

Memî dît ko Mîr Ezîn bi Beko va ji der da hatin oda wane,

Di dilê xwe da got : « Ko ez rabim, her hal, Zînê bike xewane.

Ko ez ranebim, li pêş Mîr Ezîn, va yeka bêedebiyeke giran e ! »

Mem jî bê izna Mîr hati bû hêla malê, daîra jinane.

Zînê xwe civandi bû hev di bin kurkê Memî da, mîna kewane.

*
* *

Mîr Ezîn û Beko rûniştin, lê li Memî silav ne dane.

Rengê Mîr Ezîn bûye mîna rengê celatê mêrane.

Mem di dilê xwe da dikete fikr û xuliyane.

Digot : « Hele, ko çi tê ser riya me her diyane ? »

Beko got: « Binihêre, mîro, min ji te ra ne got dirvê Memî yê xayînan e ?

Te digot birîn bû, û min vegerand ko here birîna xwe bike dermane.

Ma çi işê wî heye li hêla heremê, nav jinane ?

Ji te ra ev yeka bû eybeke girane.

Gava xelkê bajêr bibihîse van tiştane,

Par û hêviya me nema di xelkê yan bîst û pênc mihelane. »

Mîr Ezîn, berê xwe da Memê Alane,

Got: « Memo, dilê min î liyan e

Bira di dinê da kes neke çêyiyane,

Bawer nebê bî nezan û xerîbane !

Te bi min ra got: « Li min bûye birîneke şûrane.»

Min ji ji te ra got: « Here mala Hesen û ji birîna xwe ra bibîne dermane. »

Tu hatî bajarê Cizîrê, ne sekinî li tu cih û derane,

Ne jî ji birîna xwe ra dît dermane.

Te rast berê xwe da Birca Belek, hêla heremê, koşkê jinane.

Ev yeka ne karê camêr û mêran e ! »

*
* *

Memî got: « Mîro, dilê min î liyan e !

Ez dinhêrim, gotinên te ne gotinên hakim û mîrane.

Şertê merî hakim ne wisan e.

Berê dipirsin sebebê tiştane.

Paşê hinga gotina xwe dikin, bi adet û qanûna welatane ;

Berê bipirse balo ez çewa hatime van der û cihane !

Berê, ez hatim peya bûm li mala her sê birane.

Min pirsî li hekîmane.

Xwedê xirab ke mala nerind û derewînê Cizîra Botane !

Bi min ra gotin : «Hekîm peyda nabin li cem Celaliyane

Eger tu dixwazî cihê hekîmane,

Here Birca Belek, tuê ji birîna xwe ra bibînî dermane. »

Tema ez î xerîb im, nizanim adetane,

Di berê da gotine merî xerîb kor e, tu tiştan nizane,

Ez jî rabûm, min berê xwe da Birca Belek, cihê hekîmane.

Ez hatime vê odê, nizam ko hêla mêran, an hêla jinan e. »

*
* *

Memî niherî li rengê Mîr Ezîn û tesîra van şorane.

Te digot belkî Mîr Ezîn kevir e, qet nabibise tu şorane.

Pê da, pêda reng lê re ; û zer dibe, mîna rengê xwîniyane.

Tu ya çê lê nabe diyar û xewane.

Bi xwe ra got : « Ma ko yê tim hati be bi mirina me her diyane,

Ezê bikim ko xwîna me neçe erzane.

Ji xwe, eger Mîr Ezîn bibe bavê min jî, reziliye bi eban e !

Eger niha mêrik bibê : « Di mala min da bi der keve, » dîsa îş bisekine li mirina me her diyane.

Ko ez ranebim, nabe ; ko ez rabim, Zînê di bin hewranî da bibe xewane.

Ma qey ez nahêlim li şûna xwe mîna kara xezalane !

Rûhê ko Xwedê dayî, wê carê here, û îro çêtir e ji hemî rojane. »

Nihêrî ko Mîr Ezîn û Beko jî di wê fikrê da ne.

Destên xwe birine ser qevdên şûrane.

Memî jî bi destê çepê rahîşte porê Zînê di bin hewranî da, qeterê guliyane.

Bi destê rastê, rahişte qevdê şûr û rabû ser her du çongane.

*
* *

Em herine dora mala Hesen û Sitiyê, dotmama Celaliyane.

Bi der kete pêş koşk, berê xwe da hêla odê, cihê mêvanane.

Nihêrî ko Bozê Rewan li hewşa odê bi hefsar girêdane.

Derbas bû, hate hêla odê, dît ko Mem nabe xewane.

Li wir çend zarok dileyizîn, pirsî ji wane.

Gotin: « Me dît siwarê hêsp, hat û peya bû berî sê saetane,

Berê xwe da Birca Belek, hilkişiya qatê didiyan, hêla jinane. »

Sitiyê fehm kir ko Mem çûye cem Zînê, ji bo mihebeta dilane.

Got: « Wê rojê Mem çû cem Zînê, li ser Kaniya Qestelê, ava Gulane,

Di nava xelkê Cizîrê da bû şoreke mezin, kete devê ebebozane.

Ezê herim, Memî binime mal, û him jî jê bipirsim li ser Hesen, wane.

Zin jî wê were li cem me, Memî bibîne, û kes nebihise tu tiştane. »

Sitî kete derê hewsê, nihêrî ko Mîr Ezîn peya dibe, tevî Bekoyê Awane.

Berê xwe dane koşkê Zînê, cihê ko Mem û Zîn te da ne.

Sitiyê got: « Mala me şewitî, pergala me ma bi neyarane.

Him mêvanê me wê were kuştin û him jî Zînê li cem were girtin. Vê carê, rezîlî bi baran e. »

Ew jî di pê Mîr Ezîn hilkişî qatê didiyane.

Nihêrî ko Mem rûniştî di nava kurk û hewraniyan e.

Gava çavê Memî li Sitiyê ket, guliyê Zînê di hoçikan ra şanî dane.

Hema Sitî di dest da vegerî, dît ko têye Hesen di pêş birane.

*
* *

Sitiyê got: « Hesen, mala me şewitî ! Ketiye tengiyê Memê Alane.

Hatiye vir, xeber ne daye me, hema çûye mala Mîr, hêla jinane.

Niha Mîr Ezîn hat tevî Bekoyê Şeytane,

Ew jî bi ser da çûn, Memî Zîn veşartiye di bin dawê kurkane.

Îro canê mêvanê we ketiye ber lingan û tehlûkane.

Yan lazim e hon qebûl nekin mêvanê ûdane,

Yan jî xwe bidine ber barê wan, mina mêrane.

Mêvanê me îro ketiye gola xwînê, hele binhêrin tuê karî bi wî jî hev bi der xî mina mêrane.

Li hêlekê, mêvanê te ketiye tengiyeke girane,

Li hêla din, xweyînga min maye di bin kurk û hewrane.

Eger jê ra çarek nayê dîtin, rezîliya mezin e, bi eban e.

Zû here, eger bi kuştina birayê min be jî, Zînê xelas ke ji vê arî û reziliya hane. »

Hesen peya bû, hespê xwe da dest Sitiyê, got: « Tu wanî mebêje ji bo ber du birane. »

Berê xwe da Birca Belek, qatê didiyan, hêla heremê û jinane.

Bi çavê xwe dît tengiya ko Mem û Zîn tê da ne.

Mîr Ezîn û Memî li hev dane gotin û şorane,

Memî destê xwe avêtiye qevdê şûr û rabûye ser çongane.

*
* *

Gava Memê Alan Hesen dît, zanî bû ko hatiye gaziya wane.

Wê her hal jê ra bibîne çarane.

Hinekî xwe nerm girt li pêş Mîr û Bekoyê Şeytane,

Tenê gûçê guliyê Zînê di hoçikê hewranî ra şanî Hesen dane.

Hema Hesen vegerî mal, dest avête lahûrê girane,

Got: « Sitî, berê dora hesp û dewarane!

Paşê, ezê êr berdime xaniyane.

Tu here li Mîr Ezîn bike gazî, belkî em wî rakin li wan derane.

Ko ranebû, were ka em çi bikin, eger lazim bû, bila biqede bi kuştina mêrane. »

Hesen berê xwe da hespan û tarîş û dewarane,

Li van heywanan dixe bi şûrane.

Sitî revî cem Mîr Ezîn, got: « Birao, rabe, pismamê te dîn bûye, bi şûran ketiye nav hesp û dewarane.

Tu bi aqilê wî zanî, wê niha dest bavêje gewriya mêrane!

Were, belkî weke her car tu jê ra bibînî çare û dermane. »

Mîr da xwe ko rabe ; rahîşte pêşê kurkê Mîr Bekoyê Şeytane,

Gôtê : « Malava ! Tu guh mede şorê jinane.

Ma Hesen dîn ne bûye ko bikuje hesp û dewarane.

Paşê, îro li pêş te rûnîştiye mîrê Bajarê Mîxribiyane,

Di nava mala te da ji te ra hişk xeber didiye, wek zarokane.

Ma tu dixwazî ko sibe Mem here welatê xwe, û bide fort û gurane ?

Bêje : « Di mala xwe da li ber min revî Mîr Ezîn, mîrê Cizîra Botane ».

Gotinê Beko Mîr Ezîn girêdane.

*
* *

Hesen dît Mîr ne hat, hema ar berda qesr û qonaxane.

Pê da rabû gurîk û dûmane.

Sitiyê li çonga xwe xist û got : « Birao, hele binhêr ev çi dûman e.

Hesen ar berda qesr û qonaxane.

Ma çima tu wanî dilhişk bûyî ? Dilê te naêşe ji bo kesane. »

Beko zanî bû ko tiştek heye di van tevdîrane.

Dîsa Mîr da xwe ko rabe, Beko dest avête gûçê hewrane,

Bi dizî di guhê Mîr da got : « Xwedê bişewitîne mala wan kesane

Ko tu kirî Mîrê Cizîra Botane !

Ma tu guh didiyê gotinê jinane ?

Belkî ar keti be kadîna wane.

Dixwazin te birevînin li pêş Memê Alan bi fên û fûtane.

Sibe jî bi ser hev da serê te kin û bêjin : « Mîr revî li ber Memê Alane ! »

Rûne, di cihê xwe da giran be mîna kevirê koşane. »

Dîsa Mîr rûniṣt, guh da gotina Bekoyê Şeytane.

*
* *

Sitî bi der ket ji koşka Zînê, bi destan îşaret da Hesen ko nayê, sebebê wê Bekoyê Şeytan e.

Hema Hesen rahişte milê kurê xwe yê biçûk, avête nav arê darane.

Sitiyê, vê carê bi rastî kire qirîn, got : « Mîro, dilê te î mîna keviran e.

Hesen kurê min Celal jî avête nav êr, ma ez çi disekinim li van derane ! »

Revî, berê xwe da êr, di wê va, Hesen hatê, got : « here, » bi îşareta destane.

Sitî bişûn da vegerî, hat cem Mîr, got : « Xwedê bişewitîne mala birane

Ko di zikê wan da tune esera rehmê û ne îmane !

Hesen jî lawê min avête nav êr û vê carê hatiye min bi şûraue.

Hele, rabe, binihêre, sekiniye li pêş Birca Belek, mîna celatane. »

Mîr da xwe ko rabe, Beko rahişte her du dawane.

Êdî sebra Mîr ne ma, destê xwe rakir, çerpande ser çavane,

Mîna ko birûsk lêxe, Beko xwe avête erdê li ser dev û rûyane.

Mîr jî bi der ket pêşiya Hesen, ko bipirse hele ev çi îş e û çi ecêb û elameta giran e.

Di wê sirê da, Memî fersend dît, hema Zînê berda, û di şibakê da xwe berda oda cariyane.

Bi kutekuta lingê Zînê ra, Beko serê xwe hilda û dest rakir li ser çavane

Dît got jinek di bin kurkê Memî da bi der ket û kete oda cariyane.

Hema kire qirîn û hawara girane.

Mîr Ezîn bi dengê Beko ra berê xwe bada, tê va xewinî şiklê jinane,

Ji oda ko Mem tê de ye, bi der ket û revî, kete oda cariyane

Ji ber ko cilê Zînê û jina Mîr yek qumaş bûn, Mîr nizanî bû ko kîjan e.

Vegerî ser Beko, got: «Te dît kir û emelê birane.

Di nav mala min da ji bona mêvanê xwe dikine gewadiyane.»

Hema şûrê xwe kişand, hate ser Memê Alan, mîrê Mixribiyane.

Memî jî şûrê xwe kişand û sekinî li pêş mîrê Botane.

Beko dizanî bû ko tiştek wê çaxê were ser Memî, nikane xwe xelas bike ji destên her sê birane,

Hema revî, hat, kete nava wane.

*
* *

Gava Sitiyê bi çavê serê xwe dît ev yeka hane,

Reviya, hate cem Hesen, got: «Tu çi sekiniye li van derane?

Te mala xwe şewitand û kurê xwe avête nav, dîsa nebû tu dermane.

Gava Zîn bi der ket, reviya û xwe avête oda cariyane,

Beko kire qîr û Mîr berê xwe bada, dît ko jinek bi der ket li odane,

Rind ne dît û nas ne kir li cilane,

Lê ji gotinê wî, xweya ye ko li jina xwe, xwîşka te bi guman e,

Va rezîliya mezintir e ji giştikane.
Niha Mîr Ezîn û Mem rabûne hevudin bi şûrane.
Bekoyê Şeytan ketiye nava wane.
De, here ka tu dikarî jê ra bibînî çare û dermane. »

*
* *

Hesen revî, hate cem wan her siyane.
Got : « Mîro, ez ketime bextê te û Xudane.
Ji bo ko dilê te nemîne, min mala xwe şewitand bi arê darane.
Min kurê xwe avête nav, ko delal bû li ber çavên dê û bavane.
Dîsa me lê ne dît çare û dermane.
Dawî, tu li namûsa me ketî şik û şivîkiyane.
Madam ko işê gihêşti be van derane,
Emê ji te ra ya rast bêjin, rastî hatiye li cem Xudane.
Eve mêvanê min, Mîrê Mîxribiyane,
Zîn li welatê xwe dîtiye di xewneke şevane,
Dilê wî ketiye Zînê, destgirtiya Çeko, dotmama me her sê birane.
Em di heqê xwe buhirîne, ji bona mêvanê xwe Memê Alane.
Êdî wekî din dimîne li piyê Mîrê bajarê Cizîra Botane.»

*
* *

Gava Mîr mesele fehm kir, şûrê xwe kire kalên, Memî jî wer kir, di navbera wan bi der ket Bekoyê Awane.
Mîr got : « De rabin, em bikin bilezînin,
Şalê em zûka xwe bi xaniyê Hesen gihînin,
Belkî hîn pir neşewitî be, em karin vemirînin. »
Her sê bi hev ra rabûne ser piyane,

Hatine mala Hesen, ko bûye gûregura arè darane.
Dîwar û ode ne mane, giş hilweşiyane.
Nihêrîn ko Sitî digiriye û dibarîne bi kulman hêstirane.
Memî pirsî ji hazir û xulamane,
Got: « Ji bo çi Sitî dibarîne hêstirane? »
Yekî got: « Hesen kurê wê yè biçûk Celal girt, avète nav arè darane. »
Memî zani bû ko ev giştik di rûyê wî û Zînè da ne.
Memî kire qirîn û ban kir ewliyan û enbiyan û Emer beg, şêxè Qureyşiyane.
Hema xwe avète nav arè darane.
Di nava èr da demekè geriya, paşê bi der ket, ko kurè Hesen di desta da ne,
Tiştek pê ne bûye, û ne şewitiye beta bi cil û paçane.
Rakir, da dest Sitiyè, got: « Xwişka min, ha ji te ra kurê te wî han e. »
Xelkè Cizîrè li ber vè yekè ecèb mane
Bi hev ra didane tekbîr û selewetane.
Di cî da vemirt arè darane.
Lè ji xaniyê Hesen kevirek li ser kevirekî ne mane.
Her kes vegeriyan li malane.
Mem û her sè bira li wè mane.

*
* *

Memî got: «Birao Hesen, ez dikim ji te ra bikim şorekè didiyane. »
Hesen got: « Bèje, birao, li ser serè min û çavane. »
Memî got: « Bira, dilè min î li yan e !
Ez dizanim ko ez bûme sebebê wan tiştan hemiyane.
Di rûyê min da te mal û qonaxè xwe da ber arè darane.
Bi irf û adeta welatê me Mixribiyane,

Lazim e ko ez vegerînim vê zirara mêl û qonaxane. »

Hesen got : « Bira tu careke din meke van şorane.

Heçî ko mêvanekî me hat, em lê wa bikin, êdî em her sê bira nikanin herin gûçê civatane.

Te li serê me rakir eyba girane. »

Memî got : « Birao, meqseda min ne ew e ko bi der kevim di bin çeyî û camerdiya we her sê birane.

Ji bo vê yekê, ko ez bi we dim mal û xizneyên bajarê Mixribiyane,

Dîsa nakeve ber cameriya we ya du saetane.

Gava li welêt hatim, min heqiba xwe dagirti bû ji cewherdaşê giranbehane.

Ma qey dîsa ez wan venagerînin li xizna mîrê Mixribiyane,

Min ew anîn ko rojekê ji derd û meraqa min ra bibin dermane.

Ji vê bi şûn da, te ji min ra goti bû ko ez jî birayê we yê çara me.

Îro, mala me şewitî, em man li erdê û giharane.

Ma ne lazim e ko em pê çêkin çend qesr û qonaxane ? »

Serê Hesen hişk e, nabihîse şorane.

Got : « Eger tu destê xwe bavêjî tiştekî, ezê rakim qiyameta girane. »

Mem çiqasî li ber gerî, lê ne dît çare û dermane.

*
* *

Di wê demê da xeber hat ko leşkerê Ecem ketiye sînorê Kurdane.

Eger hon xwe negihînînê, najo sê çar rojane,

Wê werin irz û eyêl bidine ber lingên hespane.

Mîr Ezîn xeber şand ji bona Hesen, Çeko û Qeretacîn, her siyane,

Ko dijmin hi leşkerekî mezin kete hidûdê me Kurdane,

Barê giran her gav para milê we her sê biran e,

Min xeber da siwaran ko belav nebin, neçin malane,

Bila zû siwar bin, werin, siwar mane li hêviya we her sê birane. »

Hesen zûka emir da her du birane

Ko : « Li xwe kin zirxê dawûdî û li ber pisîrê xwe bi hev xin çapane,

Bişidînin qeytanê şûrane,

Herin tewla Mîr Ezîn, ji me ra binin sê hespê kihêl yê bezane,

Zînan bi ser din, bişidînin tengane,

Ko em xwe bigihînin pêşiya siwarane. »

Vegerî ser Memî, got : « Bira, ferzan li sinetan sto badane.

Êdî ha tu, û ha mal, min carê gotiye em bi hev re bira ne. »

Memî got : « Birano, hewşekê xwe li min ragirin, du deqîqane,

Heya siwar bim li Bozê Rewane, »

Hesen got : « Bira, hatina te ji me ra gelekî eyb e û pir giran e.

Cara berê, em di odê da hatine girtin weke bodelane,

Lê vê carê, emê berê te nadin tu şerane. »

Her siyan dane rê, çûn û Mem ma li şûna wane.

*
* *

Sibehî, mirê min rabû, berê xwe da derîzanê,
Di ber xulaman re derbas bû, hate dîwanê ;
Rûnişte ser textê mîrên Cizîra Botanê
Ser textê gewherkirî, zîvîn, zêrhelî
Lêva xwe hema şil kir bi çaya fîncana ferfûrî. »
Go : « Sifrê rakin, dilê min naçe tu xwarin û tu xwirînî. »
Mîr ne kir banî xulaman, li hisabdaran jî ne pirsî
Lê kesî ne wêrî bû here balê,
Dizanîn Mîr bêmad e, mirûzdayî.
Xwe dan alî û tev de rabûn ji heywanê.
Taliyê berdevkekî kal û bi xatir
Ji hindav de rabû, bi hafê ket axir.
Qelûna mir dagirt, pereng berda ser, agir veda ;
Li dorê fedkirî, dest da balgîha, kuxî, kir ne kir,
Mîr xwe tev ne da, û poz pê ne kir.
Kalo li xwe ma heyirî, pêlepaş çûye der ;
Nik xulaman hate ve, bê deng û lal, xwe kir ker.
Xulaman jê pirsî, gote wî : « Mamo !
Ma Mîr tiştek gote te ? »
Mifirdî dey ne kir, serî hêjand, bi lalî gote no.

*
* *

Mîr texmîn dikir, texmîneke giran, gelek damayî ;

Derdan serî da bû, ew û xemên xwe şevê pê de nerazayî
Dihatin bîra Mîr tiştên dihi û pêr û ên mayî.
Ma Mem çire bi Mîr re ne çû bû şer û seferê?
Li bajêr ma û denıa Mîr hat, bi zilaman ve, ji derî da,
Memê Alan ji cih ranebû, xwe qet tev ne da.
Li erdê ma perîşan, hewranî li xwe badayî.

*
* *

Beko, Bekoyê Awan, seypesanê mirekên Botane,
Ji derve, li pişt derî, sekinî
Wî jî texmîn dikir, awa awa.
Heçko dilê Mîr xwendi bû, go : « Firsend e, aniha ! »
Bi pabûsî kete hundir, gote Mîr : « Mîrê min, ezbenî
Ma meqsûd ne ew bû, em vekin qûtiya dilane ?
Bila herin ba kin, ji bilî hevala, Mêmê Alane,
Ji min zêde be jî, ez bibêjim, ez bendeyê Mîr im.
Tecrîbe ke, pê re bide bistîne,
Kirasê wî şil ke, rake, bide ber tavê.
Qet bermede, hilîne, deyne, biwestine heta dawî
Tiwê her tişti bibînî bi vî çavî. »
Bi awanî digo Beko : Hema tu zora wî bibe, işê te pê nîne. »
Beko danî, hilanî, devê xwe bir û anî, şiret li Mîr kirin.
Mîr ew şîret dîtine rast, gote xulam û pîşekaran :

« Herin tenha ji min re gazî kin Memê Alane
Min îro navê bêne hafa min çi kurmam û çi pismamane.
Cila bibin hewşê, raxin, lêhîstika şetrencê bidin navê.
Vexwînin herçi begler û axa û giregir û torinên Botane. »

*
* *

Roj dihate taştiya, tavê dida bedena Birca Belek.
Mêvanên Mîr dihatin tof bi tof û yek bi yek.
Memê Alan bi dilxweşî hat û kete civatê.
Memî digo : « Mîr di min borî,
Herçi qisûrên min hene dane ber lingane.
Ji xwe, adet ji ev e cem mîr û hakimane. »

*
* *

Mêvan rabûn ji ber sifra parêv û medfûnî û arok.
Hin qelîn dikişand, hina jî guh dida çirok.
Mîr gote Memî : « Mêvanê min î giran û hêja,
Min dil heye îro ez bilehîzim bi şerta.
Eve şetrenc, kerem ke rûne pêşmiqabil.
Şertê min ev e, yek e, sivik e :
Heçî şikest xwe bispêre lèvok û belengazê min.
Ewê pê re, bi kêfa xwe, henek û yarîkê bike. »
Memî go : « Li ser sera, ezbenî, herçî emr û fermana Mîrê Botan e. »
Rabû, hat, rûnişte ber şetrencê, rêz kirin şah û fîl û ferzîn.
Mem lehîzvanekî zor bû, lê Mîr pê ne dizanî.

Mem û Mîr, herwekî biçûna navê, hevdû gerandin.
Temaşageran zanî xurt e Memê Alan,
Mîr Ezîn nikare hilîne bar û berbarî.
Bi rimh û gurz û şeşperî, Mem kete nav eskerên Mîr.
Sefa pêşin xera kir, di baskan ve kete hundir.
Siwar ji hespa de xistin, peyar dan ber lingên fîla.
Bera birc û barû da pêşî, ji dijmin stand ;
Li şah hate wer, rex û ferzîn kirin hêsîr.
Beko madê xwe kir, di fena wî derkete pûç.
Mem tu firsend ne da, pey hev ji Mîr birin sê dest.
Beko dî îş xerab e, Mîr dişkê, bi Mem re maye serdestî.
Ewî soz da bû Mîr, Mem bigre, lê bi bindestî.
Çavê Beko bi Zînê ket, Zîn li ber pencerê rûnîştî.
Di paş Mem re, ji jor de, berê wê li Mîr, li hewşê difedkirî.
Beko kenî, pê şa bû, gote Mîr : « Mîrê min, ezbenî,
Di lehîstikê de siûda mirov carina bi cih têt ;
Ji lewre divêtin Mîr û Mem cihên xwe bi hev din.
Bila Mem here şûna Mîr, Mîr li şûna wî rûnit. »
Lehîzvanan cihên xwe pev guhart.
Mem hat pêşberê dildara dilovan, lê çav pê ne kir.
Beko dîsan rabû devê xwe vekir, gote civatê :
« Divêt birca me birceke kevnare be, neqşine ecêb lê ne. »

Memê Alan, bê hemdê xwe serê xwe, rakir, li dîwêr fedkirî

Çavê dildayî kete çavên dildarê

Eqil terka serî da, hiş ji dil rabû, can ji ten bû, çû, firî.

Destên Memî di ser textê şetrencê re diçûn dihatin,

Lê Mem êdî nezanî lehistik çi ye, Mir çî dike nake.

Fîl û hespên xwe didan bê hay, şûna segman û peyan.

Bi derbine nelê diket heynelê ; ferza wî dibû hêsir

Peyarên Mîr hespên wi digirtin wek hêstir û bergîr.

Beko digo : « Mîrê min, ezbenî, min ne go lehîstik siûd û cih e. »

Mîr Ezîn bawer dikir, kêfa xwe tanî, dida kîş û berkîşa.

Pir ne ajot zora Memî çû, Mîr şeş dest jê birin

Xulam û pîşekaran şetrenc û texte ji navê rakirin.

Mîr destûr da, herkesî berê xwe da derîzanê ;

Mîr ji çû banî, aliyê malê.

*
* *

Civat belav bû, hewşa qesrê li wan ma xir û xalî.

Zîn jî li banî, ji pencerê xwe da alî,

Beko rabû, nizingî li Mem kir, gotê : « Şahzade

Li gora şertê te û Mîr, kerem ke dest û lingên xwe berde. »

Memî go : « Bila be ; ez bibînim çi ye yariya te. »

Beko çû werisek anî, dest û lingên Mem pê girêdan.

Mem rabû, xwe ji cih hinek tev da

Werîs bû piç û parî, ji hev de ket, qetî.

Vêga Beko kete binaniya bircê, zencîrek anî.

Memê Alan dîsa dey ne kir; dest û pê sist kirin, berdan.

Beko mêvanê xwe pihêt girêda, xelek û girêk li hev badan

Mem bihnekê damayî ma, qey pêtek ji devî derket, pê pif kire zencîr.

Hesin sor bû, helî, herikî, ket erdê. Bû mareki fêris.

Beko ji ber mêr revî, xwe da alî, xwe kire pîs;

Mem kenî, fikand, nehwirî, mar tevizî, berê xwe da banî.

Mar kete quleke bircê, Beko bihna xwe da, li ber Mem gerî.

Beko dikir lavelav, digote Mem: « Ezbenî,

Ma kengê ez bi te karim, divê tu rê bidî min

Mem di eqlê xwe de digot: « Qey tev henek û yarî ye. »

Memî gote Awan: « Kuro here stewlê, çend mû ji dêl û bîjiya Boz bîne;

Çend mûyên serê min ji min pê girêde, ezê ji bir ve biçim, saetkê ez dimînim bêhiş. »

Beko nemerdî ne kir, mûyên Boz anîn, çendek jî ji serê Mem rakirin.

Mû li hev ba dan, kirin benekî zirav û tenik.

Tilî û pêçiyên Mem pê girêdan

Mem xwe tev ne da, cemidî, bêhiş, bû barekî sivik.

Beko bi tirs lê fedkirî, li vî hali ma ecêb-mayî.

Xeyala mêr hate bîrê, cendekê Mem rakir, revî,

Berê xwe da binaniya bircê, dakir zindaneke kûr û tarî.

*
* *

Mem wê şevê di zindanê da raneket, heta sibê ro hate taştiyane.

Tim difikirî li bêbextiya Mîr Ezîn û Bekoyê Şeytane.

Di dilê xwe da digot : « Tiştek nabe bê teqdîra Xudane.

Ez bilind firiyam û nizim ketim nava lepên wane.

Wextekê, ko ez jî ji yekî diqehirîm, min davêt binê zindanane.

Ez ne difekirîm ko di ser min ra heye Rebê Alemê, padişahê padişane.

Kî zane va ko ez ketime ah û kederê feqîr û fiqarane. »

Cardin, hişyarî xwe bû, got : « Mala min bişewite, ma qet di min da tune reh û demarên mêrane ?

Merî ko îşa bide ber çavê xwe wê elbet bibîne tengiyane.

Min bav û dê û text û tacê xwe berdan di riya çavên reş û belek û xelkê daylane.

Îro tenê ez ketime tengiyê, têne min fikrê nemerdane.

Eger ez hepis bûm, û ketime zindanê, her hal di riya Zîna Zêdan e.

Ma gava ez li welatê xwe bi der ketim, min vana gî da bûn ber çavane.

Merî niza Xwedê çawan li meriyan vedike deriyane. »

Bila Mem di van fikran da bimîne, li binê zindanê. Em herin diyarê Sitiyê, li şûna her sê birane.

*
* *

Gava Mem çû cem Mîr Ezîn, xeber neda Sitiyê, wane.
Êvar bû, bû wexta şîvane.
Nihêrîn ko Mem tune. Gotin belkî çû be dawet û ezîmetane.
Bi vê hêviyê man heya saet gîha çar û nîvan û pêncane.
Mem ne hat, Sitî rabû ser lingane,
Ban kire ezep û xulaman giyane,
Got: « Law, şev çû, hîn ne hatiye mêvanê me Memê Alane.
Herin bigerin li hemî cihê bi gumane.
Ko li kû maye, bêjinê: « Xweyînga te Sitî ji bo te ketiye meraqane. »
Bigirin, bînin qesrê, hinga ko ez kari bim rakevim ji tirsa Hesen wane. »
Xulam ketine nav zikak û ewcane,
Ne hiştin cihên bi gumane.
Çûne ber derê kê, ditin raketine, ne hewceyî gotin û pirsan e.
Bi şûn da li Sitiyê vegerîn, bi destê vala, kor û poşmane.
Gotin : « Xatûn, me ne hişt derê mîran û beg û axane.
Bi ser da, em çûn derê ticarane,
Her kes di kêfa xwe da ye, giştikan serî avêtine xewa şevane.
Merî fedî dike piştî nivê şevê here ber derê camêrane. »
Sitî heya sibê rûnişt ; xew ne kete çavan, mîna bodelane.

Sibê, li hêlekê bi xulaman, û ji hêla din bi destê delalane,

Cihek ber ne da di nava bajarê Cizîra Botane.

Gava teseliya Sitiyê ji dîtina Memî ket, di nav malê da danî şîneke erebî û pir girane.

Dizanî bû ko Hesen û her dû bira vegerin, wê rakin qiyametane.

*
* *

Em herine dora Zînê, xwediya hesreta dilane.

Piştî ko bihîst Mem tune, winda bûye di bajarê Cizîra Botane,

Zanî bû ko lê kirine bêbextiyeke pir e mezin û girane.

Dîsa weke berê kete paş deriyane,

Bi şev û bi roj ji çavan dibarîne hêstirane ;

Di nava saetekê da, dişîne cem Sitiyê du sê cariyane.

Tim jî bi hêvî ye ko were dîtin Memê Alan, Mîrê Mixribiyane

Herçî ko cariyek lê vedigere, dipirse, dibê : « Ma hat dîtin Memê Alan, Padişahê Kurdane ? »

Gava dibêjin na, dîsa Zîn dibarîne hêstirane.

Destê xwe vedigire, berê xwe dide Xwedê, Padişahê padişane,

Dibêje : « Ya rebî, tu nehêlî ji bona sebebane,

Ko bi min û bi Memî ra hiştin hesreta dilane. »

Zîn di vî halî da ma heya roja sisiyane,

Ne nan dixwar, û ne jî serê xwe danî ser nivîn û balgihane.

Pê da berê xwe da bû derî, pişta xwe da bû hesinê pencerane.

*
* *

Mem di zindanê da ma sê rojane.

Ne kesî jê ra av dibir, û ne jî parik nane.

Ne nivîn hebû, ne jî parçeyekî textane.

Nika bû serê xwe deyne, hebekî bişkêne mêrata xewane.

Her pênc wextê nimêjê, nimêj dikir. Berê xwe dida Xudane,

Digot: « Ya Rebî, halê min di te va eyan e,

Fersenda min ketiye destê bêbext û bêwijdanane.

Ex avêtim binê vê zindanê, qene nadine min hebek av û pariyek nane. »

Nimêja xwe xelas dikir, dîsa radibû pê û ser lingane.

Roja sisiyan, ji canê xwe bêzar bû; bi dilekî bi şewat, berê xwe da Xudane.

Digot: « Ya Rebî, tu xwedeyekî mezin î, şalê min xelas kî ji destê vane.

Na ko mikûna xelas bûnê tune, şalê tu canê min bigirî, xelas kî ji van ezebane.

Emir pir û hindek yek e, ji vî halî çêtir e axa gorinane.

Xwedê qûlê xwe dixe tengiyane,

Lê gava ko berê xwe didinê, qebûl dike diane. »

Bi vê gotinê ra, xewek kete çavê Memî, nika bû bisekine li ser piyane.

Di gûçekê zindanê da serê xwe danî, avête ser serê xwe hewrane.

Mîna ko li ser nivîneke pak razê, avête xewane.

Bila Mem di xew da be, em herine ser qîza Bekoyê Şeytane.

*
* *

Dema rojên Memî di zindanê da bûne sisiyane,

Qîza Beko hinarek peyda kir û bi serê sûjinê qul kir ; di şûnê ra berda nav hewên hinarê axuya marên Kaşane.

Di wê gavê da, hinar peyda nabin di nav Bajarê Cizîra Botane.

Hinar kire paşila xwe, hate cem Zînê ji bona teseliyane

Cariyan ne hiştin ko derbas be. Qîza Beko got : « Ez hatime bi mizgînekê ji bona derdê dilane. »

Gava ji Zînê ra gotin, got : « Bila were, hele eva çi xeberan dizane. »

Qîza Beko bi sergiranî hate hundir, mîna merî ko di paşila xwe da di be fermane.

Hate cem Zînê, hînga xwar bû, her dû dawên Zînê ramîsane,

Devê xwe vekir bi şor û gotinan, weke bavê xwe yê Şeytane.

Got : « Xatûn, serê min û Bekoyê Şeytan tev bi qurban e.

Min bihîst ko dîsa tu ketiye yas û şînane.

Min derdê te fehm kir, ez rabûm û geriyam ji dermane.

Min dermanê derdê te çar kir di navbera qoçên dû ejdiyane.

Xwedê şalê bişewitîne mala Mîr Ezîn û bavê min, Bekoyê Şeytane !

Rabûne, gerandine rê û tevdireke girane.

Mem xapandine, anîne, kirine torane.

Belkî di bîra te da be, berî sê rojane,

Mîr Ezîn emir da bû xulamane,
Got bû : « Şerjê bikin çend dewarane,
Peyak şandine mala Hesen, pê Memê Alane,
Gotin jê ra : « Ezîmet e, bila kerem ke, were mala Mîr, bixwe pariyek nane. »
Tu zanî ko Mem ji bona eşqa te bûye mîna bodelane,
Radibe, tê, bê ko xeberê bide xwîşka te, Sitiyê, mala Celaliyane.
Piştî ko nan xwarin, bi şetrenc lîstin heyanî saet çarane.
Bi hezar dek û debare, şertê xwe xistine ser Memî û girtin, pê girêdane.
Piştî ko dest pihêt girêdan, bi şûn da avêtine erdê, li pê xwe kêşane,
Di bin daîra Mîr Ezîn da davêjin binê zindane,
Îro sê roj û sê şev in, ne danê firek av û pariyek nane.
Îro ji min ra va çîroka han got bavê min Bekoyê Seytane.
Min zanî bû ko ji meraqan nakeve çavên te xewa şevane,
Hema ez rabûm, min ji te ra anî ev xebera hane. »

*
* *

Qîza Beko hinekî sekinî, pistî van gotinane.
Paşê, got : « Xatûn, me bihîstiye Mem, Padişahê Kurdane,
Di emrê xwe da ne ketiye tengiyane,
Canê wî nazik e, mîna perê gulane.
Di nava van sê rojan da, gelikî nexweş bûye ji qehrane.»
Di paşila xwe da hinar bi der xist, û got : « Min jê ra anî va hediya hane. »
Zîn rabû, her dû çavên qîza Beko ramîsane,
Got : « Eger Xwedê destê min bigihîne ber devê min, ez qet ji bîr nakim çêyî û qenciyê tu kesane. »

Hinar di dest da girt, çav berdane êvarê, heya ko here cem Memê Alane.

Pişti ko qîza Beko ew tevdîra danî, vegerî çû mala bavê xwe yê şeytane.

*
* *

Em herin diyarê xewna Memê Alane.

Dema ji qehr û meraqa di gûçkê zindanê da kete xewa şevane,

Di xewna xwe da dît ko disa rûniştiye li ser textê xwe yê çarling, li bajarê Mixribiyane.

Li dorhêlê rûniştî ne birayê wî Beglî, tevî kurên giregir û begane,

Diya pîr û kalê bavan, tevî her dû kokimên apane.

Hate vê miclisê Emer beg, kalê Memî, şêxê Qureyşiyane.

Got : « Memê min, bila xobarî nekeve dilê te, dinê nabe milkê tu kesane.

Eger merî bimîne deh salane, na merî bimîne hezar salane,

Ji merî baqil ra mîna hev e, qet tê da nabîne tu ferqane.

Dinya bi xwe mîna xewan e.

Ji mirina te ra maye îşê dû saet an sê saetane.

Tuê li vê dinê bar kî, herî axiretê, hizûra Padişahê padişane.

Em vana jî wê rojekê werin û li te bibin mêvane.

Niha, pişti demekê, wê were cem te Zîna Zêdane,

Bi dest xwe tîniye hediyekê, daye wê qîza Bekoyê Şeytane.

Hediye hinarek e, hundirê wê tijî kirine axuya marê Kaşane,

Ilm û xebera Zînê tune di van fend û tiştane.
Zîn bi xwe bi te ra rast e ji dil û cane.
Gava ji te ra hinar anî, bigire û bixwe çend hewane.
Eger tu nexwi, tuê bimirî û qet lê nabe çare û dermane.
Gotineke pir mesbût heye, dibêjin li cem me Kurdane,
Ko serê hate birîn, nayê kirîn bi perane.
Qedera Xwedê hatiye, sekiniye ko tu bimirî bi destê zalimane,
Bigihê merteba şehîd û ewliyane.
Zîn jî wê di pê te ra bimire bi heft rojane.
Xwedê wê li wê dinê mirazê we bike di nav govendê horiyane.
Di nêv cenetê da wê bibe dawetê we her diyane. »
Bi van gotinan ra Memî çavên xwe rakirin ji xewane.
Nihêrî ko ne Emer beg, ne jî Beglî û ne jî diya pîr û kalê bavan e.
Dîsa sekiniye di zindanê, li Cizîra Botane,
Di bin daîra Mîr Ezîn, Mîrê Botane.
Heçiya diye xewneke şevan e.
Mala bavê zindanê bişewite, merî nizane ji hev roj û şevane.
Tenê kevirekî çewherdaş i mezin bi zincîra saeta Memî da ne,
Şewla wî dide binê zindanê, weke çirane.

*
* *

Hema ko bû êvar, Zînê cilên xwe danîn û li xwe kir kirasê cariyane.
Kire paşila xwe hinara ko da bûyê qîza Bekoyê Awane ;
Hêdî hêdî digiriya, ne wêrî bû dengê xwe rake ji tirsane,

Berê xwe da hêla zindanê, dimeşiyane.

Kesî bi rê va Zîn ne dît ji xulamên Mîr û bekçiyane.

Hate devê zindanê, berê xwe dayê, ko di binê wê da rûniştiye Memê Alane.

Kevirê gewher yê ko bi zincîra saetê da, ronî dide mîna çirane.

Mem rûniştiye û ketiye fikrane.

Zînê ban kir, got: « Memo, dilê min liyan e !

Xwedê bişewitîne mala Mîr Ezîn û Bekoyê Şeytane !

Ko tu girtî, avêtine zindanê bi dilreşî û bêbextiyane.

Di pê te ra ji min ra dinê reş bûye, mîna rûçikê nerindane.

Min niza bû ko evqasî bêbext û telaqreş in xelkê Cizîra Botane.

Ko wê mêraniya xwe bi bêbextî bikin li serê xerîbane.

Bavêjine binê zindanê Memê Alan, Padişahê Kurdane,

Ne bidinê nivînan û ne jî bidinê firek av û pariyek nane ! »

*
* *

Memî got : « Zînê, dilê min dêre !

Her çiya ko di riya te da bibînim her hal xêr e.

Kesê ko di ber meraqa dilê xwe da nekeve tengiyan qet ne mêr e.

Xwedê mêr dane ji bo mirinê û para berxê nêr her gav kêr e.

Ji bona min mexwe tu xemane. Erê, ji sê roj ne dane min nan û av pê re.

Lê ji kerema Xwedê, zikê min hergav têr e

Min û te me ji hev hez dikir bi dilekî pak, Xwedê di ser me ra li me dinihêre. »

*
* *

Zînê got : « Memo, serê min bi qurbano, ev çi bela bû, ji me ra hat.

Roj şewqê we dide dinyaê, li me her diyan tenha hilnehat

Qet meraqê mexwe, gava ko xeber bigihê Celaliyan, tu bizane ro li serê me jî helat.

Ha ji te ra vê hinarê bigire, bixwe heta ji te ra çêkim xwarineke giran dû qat. »

*
* *

Memî li jêr hewraniyê xwe vegirt, Zînê avêt hinarane,

Memî hinar girte dest xwe, got : « Zînê, dîlê min î bi ar e, î li yan e !

Berî ko tu werî vir, ez raketim, ketim xewa şevane.

Min dît ko ez li ser textê çarling rûniştî me, li bajarê Mixribiyane,

Li dorhêla min rûniştî ne Begli, tevî kurên giregirane.

Li hêlekê rûniştî ne bavê kal ; pîra diyan, tevî her du kokimên apane.

Em bi hev ra dikine şor û sihbetane.

Min dît bi der da hat Emer beg, kalê min, Şexê Qureyşiyane.

Got min : « Memo, ji bo vê dinê, meke meraqan û mexwe xemane.

Ev dinya fanî ye, namîne ji bona pêxember û ewliyane.

Deh sal û hezar sal yek in ji bona merî biaqil û xwedî îmane.

Ser û berê dinê derew in, mîna xewneke derewîn e şevane.

Serê ko were birîn tu caran nayê kirîn bi perane.

Niha Zînê were cem te piştî du saetane.

Hinarek tijî axû kiriye qîza Bekoyê Şeytane,

Daye Zînê, ji te ra şandiye, lê Zîn vê yekê nizane.

Zîn bi te ra rast e, canecan e.

Law, ecelê te timam bûye, êdî tu dikî herî axa gorinane.

Ko tu hinarê nexwî, tuê bimirî, eve teqdîra Xudane.

Lê, tu bixwe çend hewane,

Ji mirinê metirse, mîna mêrane.

Ji mirinê tirsîn karê teresan e.

Xwedê wê mirazê te û Zînê bike li cenetê, di nav govenda horiyane.

Zînê bimire piştî te bi heft rojane. »

Zînê êdî mineta me tune ji ebdane.

Mirazê me wê bibe li wê dinê, bi emrê Rebê Alemê, padişahê padişane. »

*
* *

Zînê got: « Memo, ez bi qurbana serê te, tu nexwî vê mîrata hinarane.

Min niza bû ko bi hîle kirinê axuya marên Kaşane.

Ko eger mirineke te hebe jî, bila ne bi vê hinarê be ! Min ew ji te ra anî bi navê hediyane.

Paşê wê di ser dilê min da bibe kuleke pir e girane.

Memo hawara min li te, tu neynî serê min vê yeka hane.

Ko tu bi destê min bimirî, dinê wê li serê min bibe dojeh û zindane.

Malneketo, ma tu bi mirinê razî bûye, sewa dîtina xewneke şevane.

Bi min ko vaya ne karê mêrane.

Bi gorê min ke, mexwe vê mîrata bi axuya hinarane.

Ezê bişev ji te ra bînim av û nane.

Xeberê bidime Sitiyê, bila mektûbekê binivîse ji bona Celaliyane.

Gava bibihîsin bêbextiya Mîr Ezîn û Bekoyê Awane,

Nasekinin, wê werin mîna gurane,

Te bi der xin di binê zindanane.

Belkî Xwedê mirazê me her diyan bike, em tev herin bajarê Mixribiyane. »

Memî got: « Zînê, êdî nema ez li vê dinê dikişînim mineta tu kesane,

Ne jî dixwazim vegera celaliyane

Ko ji bona min bikujin mêrane.

Ez dixwazim bimirim, bigihême axa gorane.

Ji bona min va hinara xweş derman e. »

Hema Memî hinar şikand, çenga xwe tijî kir ji hewane.

Zînê got: « Memo, tu bi hesreta dilan dikî, tu nexwî wê mîrata hinarane.

Bila ez bi destê xwe nebim sebebê van tiştane.

Madam ko yê mirin be, himbêza xwe vegire, ezê xwe çek kime cem te, li zindanê, qene serê te di gava mirinê da bidime ser çongane.

Bila em her du bi hev ra bimirin, di heps û zindane.

Ez naxwazim di pê te ra li hewa dinê bimînîm û bibînim tu kesane. »

*
* *

Memî got: « Zînê, tu xweş Zîn î,

Dermanê dilê min ê kul û bibirîn î,

Xwedê mirina her kesî qeder kiriye, tu bi tu awayî nikanî vegerînî.

Ji bona çi xwe bavêjî binê zindanê, ma tu halê min dibînî.

Ne min bi te ra got : « Tu ji heft rojan bi şûn da bimirî, xwe bi min bigihînî. »

Ko tu vê yekê bikî, tuê navekî xerab bi pê xwe xînî.

Şor û gotinê xelkê bi me gihînî.

Eve, saet gihêşte dido û nîvane.

Damarê canê min sist dibine mîna li ber candane.

Eve, ezê davême devê xwe çendek ji hewên hinarane,

Bila dinya teres bimîne ji bo bêbextane. »

Memî destê xwe rakir, bire ber devê xwe, hewên hinarê derbas kirin ji nava lêvan û diranane.

Çavên xwe girtin, bi carê daxwarin ; axû gihêşt zik û roviyane.

Çav xirab bûn, çû bû rehmetane.

*
* *

Dema Zînê dît ko Mem mir, li xwe xist, dikire qirîn û emane.

Revî, cawbir anî, gulîyê mor tevda dane ber meqesane.

Bi ser laşê Memî da avêtine, binê heps û zindane.

Vegerî koşk, kire qirîn li cariyane,

Got : « Zûka birevin, herin mala Celaliyane,

Bêjin xwîşka min Sitiyê : «Pergala mala bavê te bimîne li dijminane !

Mêvanê we girtine, avêtine binê zindane,

Di zindanê da miriye merî mîna Memê Alan, Padişahê Kurdane.

Hîn tu digerînî şînan û dipirsiye ji delalê Cizîra Botane.

Bila zû xeberê bişîne ji bona Hesen, Çeko û Qeretacîn, her sê birane.

Şalê werin meyîtê mêvanê xwe bi der xînin di binê heps û zindanane.

Ez jî wê bimirim piştî Memî bi heft rojane. »

*
* *

Cariye reviya, berê xwe da mala her sê birane.

Gote Sitiyê gotinên Zînê, çendek jî zêde bi ser vane.

Di mala Hesen da bû şîneke girane.

Tirsa Sitiyê tune ji tu mexlûkane.

Yê ko miriye mêvanê xwe yê cemalgiran, Memê Alan e.

Sitî çû, vekir heqîba Memî, tê da bi der xist kiswetê padişane.

Di wê şevê da darê şînê xemiland, şande pê xulamane.

Got : « Herin ji min ra bi der xin Bozê Rewan, di tewla hespane. »

Xulam çûne tewlê, ko heywan nexwariye êmê sê rojane.

Gava çav bi xulaman ket, hema di cih da rabû ser lingane.

Kurîna wî dare ber taqê ezmanê heftane.

Merî dibê belkî mirina xwediyan teva bû eyane.

Xulaman Boz bi der xist di tewla hespane.

Li hêla din, Sitiyê li dorhêla xwe civandine qîzên Cizîra Botane.

Sitiyê bi destê xwe rakir darê şînê, da ser pişta heywane.

Bû haho, û girîdeng gihêşte ezmanane.

Her kes ji kesera dilê xwe ra ji bona Memî digiriyane.

Heya ko bû sibe, Sitî di pêşiya şînê da li dora qonaxê digeriyane.

*
* *

Sibê, Sitî rabû, çû mala pismanê xwe, mîr Şem, gotê : « Pismamo, serê min bi qurbano, dilê min liyan e !

Mîr Ezîn mêvanê me avêtiye zindanê, bi gotina Bekoyê Awane.

Îşev tê da miriye, serê xwe daniye ser axa gorinane.

Hesen çûye sefera Ecem, haya wî tune li wan tiştane.

Salê tuê herî cem Mîr Ezîn, lê bistînî meyîtê Memê Alane.

Eve di tewlê da ye hespê wî Bozê Rewane.

Heywanekî xurt e, û rêbir e, dare riya rojan bi saetane.

Yekî jî li pişta heywên siwar ke, bişîne ser hidûdê Ecemane.

Ezê kaxetekê binivîsim, bila Hesen were, li ser xwe rake vê eyb û reziliya girane. »

Mîr Şem gotê : « Dotmam, serê mîn bi qurban e !

Heçîya Mîr Ezîn kirî ji bo mêvanê we Memê Alane,

Hîn me ne diye û ne jî bihîstiye ji devê tu kesane.

Xwedê xirab ke mala Mîr Ezîn ko ji xwe ra kiriye wezîr Bekoyê Şeytane !

Ma tu zanî ko îro şeş sal in min lingê xwe ne daye derê mala wane.

Ez tu caran naçim mala bêbextane.

Lê ji bona ko tu nebê Mîr Şem nakişîne ûda me jinane,

Ezê kaxeta te bigirim, berime ser sînorê Ecem ji bo Celalïyane. »

Sitiyê kaxezek ji Hesen ra nivîsî û mirina Memî tê da kir beyane.

Pozê kaxezê şewitand, îşareta miriyane.

Mîr Şem kaxeza Sitiyê kire bêrika xwe, û berê xwe da çiyayê Ecem, çû hinda her sê birane.

Bira Mîr Şem li ser rê be, em herin cem her sê Celaliyane.

*
* *

Êvarê, runiştî bûn, divêsihiyane ; nihêrîn ko ji dûr va radibe toz û dûmane.

Di nav tozê da siwarekî hespê Boz bû xewane.

Nihêrîn ko ev hespa Bozê Rewan e.

Hesen kire qirîn ji xortên Botane.

Got : « Rabin, bi der kevin silavê, pêşiya birayê min Memê Alane ! »

Hesen dît ko hat Mîr Şem, siwar bûye li Bozê Rewane.

Reng lê qulibtiye mîna rengê kuştiyane.

Hesen got : « Va çi ecêba giran e ? »

Nihêrî ko Mîr Şem digiriye, û bi destekî desmal daye ber çavane.

Bi destê din, di bêrika xwe da kaxeza Sitiyê bi der xist, da dest wane.

Gava Hesen kaxez vekir, gûçê şewitî dît, hêstir bariyan ji çavane.

Sibetirê, izna xwe girtin ji bo sê mehane.

Mîr Şem siwar bû, û da pêşiya wane.

Her sê bira dane pê, tevî pênc sed xortên Cizîra Botane.

Hesen ne dihişt ko bîna xwe bigirin, heya hatin bajarê Cizîra Botane.

Dema hatin, peya bûn, Hesen bala xwe dayê ko darê şîna Memê Alan e.

Hema xwe tê werda, bi ser da giriyane.

Sitî hate pêş, got : « Xwelî li serê we be ko hon jî dibêjin, em peya ne.

Ma hon jî hatine û digirîne mîna jinan ? Girî para me jinan e.

Îro çend roj in meyîtê Memî maye di binê zindanane. »

*
* *

Hesen got : « Birano, bikin bilezînin !

Zûka zilxan li xwe kin, û çaprazan li ber pisîran bi hev xînin,

Destên xwe bavêjin şûr, û silehên xwe hilînin.

Berê xwe bidine mala Mîr Ezîn, emê îro yan bidin, yan bistînin !

Ez li we dixwazim hon mêran weke perên darên payîzê di erdê da raweşînin. »

*
* *

Xelkê Cizîrê giştikan li pêş mala Mîr Ezîn silahê xwe girtî, sekiniyane.

Her sê Celaliyan dest avêtin qevdê şûrane,

Zînê dît ko îş i xerab e, rabû pêşî wane.

Got : « Hesen ez ketime bextê we mêrane,

Mem çû ji kîsê min, carê jî dilê min meşewitînin bi xwîna birane.

Hon dizanin ko Mîr Ezîn li şûna heft ocaxan e.

Dîsa sûcê wî tune di van tiştane.

Ev bela han gişkî anî serê me Bekoyê Awane.

Mem şehîd hû û mir bi aẍuya ko qîza Beko kiri bû hinarane.

Ez jî wê bimrim piştî Memî bi heft rojane. »

Tacîn û Çeko rahiştine milê Hesen ji bo reca Zînê, ber ve zindanê birin û gotin : « Hesen, Mem i li vir e, va zindan e. »

Gihêştine zindanê, meyitê Memî anîn, merî ji xwe ra dibêje belkî ketiye xewa şevane.

Anîne mal, şuştin, li erdê Cizîrê veşartin Memê Alan, Padişahê Kurdane.

*
* *

Di pê Memî ra, Zîn kete pişt deriyane,

Bi roj û bi şev tim digiriyane.

Ji sondê ra ne dikete gewriya wê parîk nane.

Nema lê bi dûr diketin qîzên giregirane.

Dixwestin şalê bîna Zînê bi der keve bi hevaliya wane.

Lê serê Zînê bi der ne diket ji nav destane.

Çavên wê hêstir dibarandin mîna tavên baranane.

Ne dixwest bi kesî ra bike şorane.

Wer derbas kirin heya bû roja heftane.

Roja heftan, Zîn mir di nava koma qîzane.

Di nih va bû qirîn û bavobavoya wane.

Xelkê Cizîrê, mezin û biçûk li ser meyîtê Zînê diciviyane.

Bi hev ra digotin : « Mir xelkê xatûn, xwîşka Mîr Ezîn, Zîna Zêdane. »

Meyîtê Zînê bi der xistin bi helahelake pir e girane.

Pê ra meşîn mezin û giregirên Cizîra Botane,

Birin, di kêleka Memî da tirb kolane,

Meyîtê Zînê kirin nav axa sar û gora tarî mîna şevane.

*
* *

Şeva, din Zîn hate xewna Mîr Ezîn du sê carane.

Digot: « Bira te ez nas ne kirim, tevî Memê Alan, Padişahê Kurdane.

Te bawer dikir ko em jî mîna xelkê, nêzikî Şeytên û dûr bûn ji Xudane.

Dinihêrim tu di rûyê min da şermisar bûyî, nikarî binihêrî ji kesane.

Ji bo ko tu her tiştî bibînî bi çavane,

Roja înîyê, ko siwar bi der ketin cirîdê, tu jî were nav goristanane,

Bisekine di nav bera tirba me her diyane.

Hinga, tu nema ji min dikî gazindane. »

*
* *

Mîr Ezîn du caran hişiyar bû li ser vê xewna hane ;

Heya ko dît dîsa cara sisiyane,

Rabû ser xwe, got : « Sibe înî ye, ezê her hal herim ser tirba wane,

Hele binihêrim çi di min va dibe xewane. »

Sibetirê, li hespê xwe siwar bû, bi der kete temaşa cirîdê tevî siwarane.

Hat, sekinî di nava tirba Zînê û Memê Alane.

Nihêrî ko di tirba Zînê da kunek xewan e.

Xwar bû, bala xwe dayê, dît ko destê wana di nav hev da ne.

Dengek ji Zînê hat, û got : « Te dî, Mîro, ya di dilê me her diyane. »

Di cî da, Mîr Ezîn, ji îşê ko bi Memî kirî, bû poşmane.

Vegerî mal, delal hemî berdan nav Cizîra Botane,

Got : « Va îşê Memî min ne dikir, ez xapandim Bekoyê Awane.

Yê ko Beko bikuje, ezê çavên wî têr bikim ji zêr û perane. »

Hinekan xeber dane Beko ko Mîr Ezîn bi der xist ji bo te fermane.

Beko revî, derkete çolane.

*
* *

Rojekê, yekî baxçevan baxçe av didane,

Nihêrî ko li bin darekê raketiye sebê Memî û Zînê, Bekoyê Awane.

Baxçevan got : « Ma ne Mîr bi der xisti bû di heqê wî da fermane,

Ko kî wî bikuje, wê cavê wî têr bike ji zêr û perane ? »

Micirfa xwe girt, çû yek dawişande serê Bekoyê Awane ;

Serê Beko qelişî, xwîn pêda rêz bû, û rabû revî, berê xwe da malane.

Baxçevan da pê, heya gihan tirbane.

Beko derbas bû di nav tirba Zînê û Memê Alane.

Çilkek ji xwîna Beko dilopiya, kete navbera tirba her diyane.

Dibên ji wê çilka xwînê stiriyekî mezin hişîn bû, ji hev kirin destê wane.

Çawa li dinê nehişt bigihêne hev, di tirbê da jî, wan ji hev veqetane.

Baxçevan gihêşte Bekoyê Şeytane,

Serê wî da ber devê micirfane,

Li wir kuşt, cendekê wî bir, avête newalane.

Hate cem Mîr Ezîn, gotê : « Mîro li ser fermana te min kuşt Bekoyê Şeytane. »

Mîr Ezîn ban kire xulam û wekîlane.

Got : « Law, wî berin, qasî ko dixwaze, bidinê zêr û perane. »

*
* *

Piştî mirina Beko, Hesen gazî kir her du birane.

Got : « Mem bû mêvanê me û di pêşa me da hate kuştin, em ji derdê wî ra ne bûn dermane.

Werin, em siwarekî bişînin bajarê Miẍribiyan, cem kalê bavane.

Qene, wê bigê destê wan şûr û cilên Memî, tevî Bozê Rewane. »

Çeko got : « Bira, welatê Memî riya şeş mehan e.

Ji welatê Botan, kes vê rê nizane.

Pismamê me Mîr Şem siwarekî bi nav û deng e, bila siwar be li Bozê Rewane.

Heywan î li xeybê ye, wê bigihîne xwediyane. »

Hesen şande pê Mîr Şem û jê ra got ; Mîr Şem got : « Li ser çavane ! »

Jê ra anîn Bozê Rewane.

Cil û şûrê Memî şidandi bûn li terkiyane.

Mîr Şem berê xwe da Bajarê Miẍribiyane.

Riya şeş mehan birî bi panzde rojane.

Gava nezîkî bajêr bû, heywan dihiriyane,

Mihela Emer begî bi der ketin, gotin « Qey teye Memê Alane. »

Dema hat, niherîn ko hesp Bozê Rewan e, lê siwar ne Memê Alan e.

Girtin, birine cem Emer begî, Şêxê Qureyşiyane.

Mîr Şem kaẍeta Hesen bi der xist ji paşilane.

Emer begî kaẍet xwend ko tê da nivîsiye mirina Memê Alane.

Hema ko xelkê bihîst, cilê Memî bi der xistin, dane ser pişta Bozê Rewane,

Bû qîreqîra girî û şîna wane.

Di bajêr da ne ma kesek, tev da hatin mala Emer begî, mihela şêxane.

Berê hat Beglî, serdarê hezar û pênc sed xortên Kurdane.

Paşê, hatin bavê kal, pîra diyan û her dû kokimên apane.

Di nih va danîn şîneke mezin û erebî pir e girane.

Qîz û bûkan guliyên xwe birîn, avêtine ser cilê Memê Alane.

Şînê ajot sê rojan û sê şevane.

*
* *

Piştî sê rojan şîn sar bû, Beglî emir da xortên Kurdane,

Anîn di nêva bajêr da ar dadane,

Li kêleka bajêr singê çadiran kutane,

Herçî destê wî digire şûr û silehane,

Ne man, gişkî hatine cem Beglî, gotin: «Bêje, te çi emr e, çi ferman e ?»

Hema Beglî berê wan dide çadirane,

Roja sisiyan, Beglî emir da, singê cadiran hilkêşane,

Topê havan bar kirin li ser pişta bargîran, tevî sendûqê cebelxanane.

Mîr Şem li Bozê Rewan siwar bû, û bû rêber, kete pêşiya wane.

Heya hatin, gihêştin welatê Botane.

Li şet derbas bûn, çûne hêla Qestelê, singê çadiran dikutane.

Mîr Şem raberî wan dikir, digot: « Ha binihêrin, tirba Memî û Zînê wê han e. »

Xelkê Cizîrê dihate diyarê leşkerê Beglî, dikin sêr û temeşane.

*
* *

Berê Beglî tevî leşkerê xwe rabû û çûn ser tirba Memê Alane,

Di dora tirbê sekinîn û helqe girêdane.

Serekî şîna xwe girtin, bi şûn da vegerîn, hatine çadirane.

Beglî emir da, got: « Li dora bajêr belav bin, û qenc bikolin çeperane.

Emê heyfa Memî bistînin ji van bêbext û telaqreşane. »

Li pêş vê yekê pişta xelkê Cizîrê qurifî ji tirsane.

Di wî deravî da, Hesen, Çeko û Qeretacîn hatine nav Mixribiyane.

Nihêrîn ko xortekî sivik di nav da ye, tev da î mîna Memê Alan e.

Pirsîn ko va kurê xaltîka Memî ye, xwarzîyê Emer begî, Şêxê Qureyşiyane.

Hatine cem, hev nas kirin, her sê biran yek bi yek xwe tê wer dane.

Digotin: « Li te teye bîna Memê Alane. »

Tu nema, Mîr Ezîn jî hate nav çadirê leşkerê Mixribiyane.

Beglî bi der kete pêşiyê, anî çadirane.

Emir da eskerên xwe, got: « Herin, bi ẍar kin qesr û qonaẍane. »

Sê roj û sê şevan di nav bajarê Cizîrê da bû axir dewrane.

Ko kî di ber diketin dikuştin, di ber heyfa Memê Alan, Padişahê Kurdane.

Van her sê rojan, Mîr Ezîn, Mîr Şem tevî her sê Celaliyane,

Di çadiran da li cem Beglî girtî mane.

Roja sisiyan, di nav Bajarê Cizîrê da xaniyê bilind qet ne mane.

Gistik bi erdê ra dûz bûn bi destê xortên Kurdane.

Beglî emir da leşkerane,

Tev da bi der ketin ji bajarê Cizîra Botane

Hinga, Beglî da izna Mîr Ezîn, Mîr Şem û her sê Celaliyane.

Bajarê xan û xerabe teslîmê wan kir, hate ser tirba Memê Alane,

Got: « Memo, bila di dilê te va eyan be, min heyfa te hilanî ji bêbextane. »

Hinga, bi xwe siwar bû li Bozê Rewane,

Leşkerê wî çadir bar kirin, meşiyane.

Berê xwe dane welatê Miẍribiyane.

*
* *

Çiroka me çûye çeket û berestanane.

Rehmet li ser dê û bavê guhdarane.

PAYAN